



KT

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî**

Teza Lîsansa Bilind

**NÊRÎNEK GELEMPERÎ LI MÎREKTIYA HÎZANÊ:
ÎLM Ê EDEBIYAT**

Nevzat EMİNOĞLU

10711013

Şêwirmend

Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

Mêrdîn-2016

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Hızan Beyliğine Genel Bir Bakış: İlim ve Edebiyat” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

.../.../2016

Nevzat EMİNOĞLU

JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de weku teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmza)

Serok :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Endam :

(Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav)

(îmza)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzayên jorîn ên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Îmza

.....
Unvanê Akademîk, Nav- Paşnav

Birêvebirê Enstîtûyê (Mor)

KURTE

NÊRÎNEK GELEMPERÎ LI MÎREKTIYA HÎZANÊ:

ÎLM Û EDEBIYAT

NEVZAT EMİNOĞLU

Ev xebat ji destpêkekê û çar beşan pêk tê û lêkolîna rewşa zanyarî û edebiyata Kurdî ya serdema Mîrekiya Hîzanê dike. Her wisa li ser wan şert û mercên sosyokultûrî hûr dibê ku bandor li van cewheran kirine. Di serdema klasîk de rola parastina edebiyatnasan a ji aliyê rêvebiran ve, diyarde ye ji bo çêbûn û geşedana edebiyatê. Digel vê yekê îstiqrara sîyasî, rewşa avadanî, dezgehên çandî jî hêmanên bi bandor in di peydabûn û belavbûna çand û edebiyata Kurdî ya di serdema mîrekiyan de.

Kurd piştî ku bûn musulman, xasma di dawîya serdema xelîfetiya Ebbasiyan de, hin xanedanên desthilatdar ji nav wan derketin. Van xanedanên Kurd li erdnîgariya xwe û li dervayê erdnîgariya xwe îqtidareke girîng bi dest xistin. Van rêvebiran gelek medrese saz kirin ku ev medrese saziyên perwerdehiyê yên sereke ne ji bo vê serdemê. Wihareng bingeha hêşînbûn û geşedana çand û edebiyata Kurdî ya klasîk çêbûye. Lê di pêvajoya çêbûna vê çand û edebiyata Kurdî de xanedan û bajarên Kurdan ketin bin pêlên êrîş û îstîlaya Moxolan. Vê rewşê heta sedsalên çardeh û panzdehan berdewam kir. Piştî vê dîrokê li hin herêmên erdnîgariya Kurdan mîrekiyên Kurd ava bûn. Gund, navçe û bajarên di hakimiyeta van mîrekiyan de, bûn warê geşedana çand û edebiyata Kurdî ya nivîskî.

Emîr Suleyman di sedsala panzdehan de bi rêya sîyaseteke dîplomatîk nehîşt ku mîrekiya Hîzanê wek wan mîrekiyên Kurdan ên din bikeve destê Emîr Tîmûr Gurgan û Qara Yûsufê Turkmen û hilweşe. Ji vê dîrokê pê de li mîrekiya Hîzanê îstîqrar û aramî destpê dike. Bi îtifaqa dewleta Osmanî û Kurdan ya di serê sedsala XVIan de ev rewşa aram bêhtir bi pêş ket. Bi vî awayî li vê mîrekiyê dezgehên çanda nivîskî hatin avakirin. Xwendin û perwedehî zêde bû.

Bi xwedîderketina mîrên Hîzanê ya li edîb û zanayan, sistema patronajê jî li vir saz bû. Wihareng zanyar, edîb û helbestvanên edebiyata Kurdî yên vê sedemê yên

wek Şêx Hesenê Hîzanî, Selîmiyê Hîzanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Axaokê Bêdarî û Mela Emerê Gulpîkî û hwd. gihîştin. Asteke edebî û çandî ya ku karibe bi çanda Mîrekiyên Kurd ên din û bi yê gelên cînar re reqabeteke serkeftî bike, pêk hat. Ev asta çandî ya dewlemend a di serdema mîrekiyan de a li Hîzanê çawa ku mîraseke dîrokî ye, her wisa jî bûye binaxe ji bo vê serdema dawîn, ji peydabûn û gihîştina zana, edebiyatnas û alimên ji Hîzanê yê di dereceya alema Îslamê û dinyayê de.

Peyvên Sereke:

Îlm, Edebiyat, Mîrekiya Hîzanê, Dîrok, Edebiyata Kurdî, Çanda Kurdî,



ÖZET

HÎZAN BEYLİĞİNE GENEL BİR BAKIŞ: İLİM VE EDEBİYAT

NEVZAT EMİNOĞLU

Bu çalışma bir giriş ve dört bölümden oluşmakta, Hizan Beyliği döneminde ortaya çıkan ilmi çalışmaları, Kürt edebiyatını ve buna etki eden sosyo-kültürel koşulları incelemektedir. Edebiyatın ortaya çıkışında ve gelişmesinde edebiyatçıları himaye eden yönetim erkinin rolü belirgindir. Beylikler dönemi Kürt kültür ve edebiyatının ortaya çıkışında ve serpilmesinde söz konusu himayenin açık etkisini görmek mümkündür.

Kürtlerin Müslüman oluşundan sonra özellikle Abbasi Halifeliğinin son dönemlerinde kendi coğrafyalarında ve bu coğrafya dışında etkili olan önemli Kürt hanedanlıkları ortaya çıktı. Bu hanedanlıkların o dönemin başat eğitim kurumları olan medreseler inşa etmeleri ile klasik dönem Kürt kültür ve edebiyatının temeli atıldı. Ancak bu kültür ve edebiyatın oluşması sürecinde Kürt hanedanlıkları ve şehirleri Moğol saldırılarına ve akabinde de istilasına uğradı ve bu on dördüncü ve on beşinci yüzyıla kadar devam etti. Bu tarihten sonra Kürt coğrafyasının bazı bölgelerinde Kürt beylikleri kuruldu ve bu beyliklerin hakim olduğu şehir, köy ve kasabalar klasik Kürt kültür ve yazılı edebiyatının ortaya çıkış zemini haline geldi.

Emir Suleyman XIV. yüzyılda siyaset ve diplomasi yoluyla Hizan beyliğinin diğer Kürt beylikleri gibi Emir Timur ve Türkmen Kara Yusuf'un eline geçmesine ve ortadan kaldırılmasına engel oldu. Bu tarihten itibaren Hizan Beyliğinde istikrar ve huzur iklimi hakim olmaya başladı. XVI. Yüzyılın başında Osmanlı devleti ile Kürtler arasında gerçekleşen ittifak antlaşması ile bu olumlu durum daha da ilerledi. Böylece Hizan Beyliğinde kültürel kurumlar oluşmaya başladı. Okuma ve eğitim faaliyeti arttı.

Hizan beylerinin edip ve bilginlere sahip çıkıp onları himaye etmeleri ile patronaj kurumunun da bu bölgede oluşmasını sağladı. Bunun sonunda Şeyh Hasan-i

Hîzanî, Selim-i Hîzanî, Molla Halil-i Siirdi, Axaok-i Bîdarî, Molla Ömer-i Gülpikî gibi bu dönem Kürt alim, edip ve yazarları yetişti. Diğer Kürt beyliklerinde ve diğer komşu milletlerde ortaya çıkmış olan kültür ve edebiyatla başarılı bir şekilde yarışabilecek bir kültür ve edebi düzey ortaya çıktı. Hîzan beyliğindeki bu zengin kültürel seviye tarihten gelen bir miras olduğu gibi beylik sonrası dönemden ta günümüze kadar bu bölgeden yetişen İslam alemi ve dünya çapındaki edip, düşünür ve alimlerin de yetişmesinin altyapısını oluşturmuştur.

Anahtar Kelimeler:

İlim, Edebiyat, Hîzan Beyliği, Tarih, Kürt Edebiyatı, Kürt Kültürü



SUMMARY

A GENERAL OVERVIEW OF THE HÎZAN PRINCIPALITY: SCIENCE AND LITERATURE

NEVZAT EMİNOĞLU

This study consists of an introduction and four chapters, and examines the emergence of the Kurdish literature and socio-cultural conditions that effected that literature during Hizan Principality. It is obvious that the governing power which sponsors man of letters has a great role in the emergence and development of literature. It is possible to see the obvious effect of the aforementioned patronage in the emergence and flourishing of Kurdish culture and literature during the period of principalities.

After Kurds converted to Islam, especially in the late period of the Abbasid Caliphate, both in their own regions and outside their regions some effective Kurdish dynasties emerged. By building madrasahs, principal educational institutions of that period, these dynasties founded Kurdish culture and literature of the classical period. However, in the process of the formation of this culture and literature Kurdish dynasties and cities were attacked and then were invaded by the Mongols, and it continued during the fourteenth and fifteenth centuries. After this period, Kurdish principalities were established in some areas of the Kurdish regions, and the cities, the towns and the villages dominated by the principalities became ground of classical Kurdish culture and literature.

In the 14th century, Monarch Suleyman, by politics and diplomacy, prevented Monarch Timur and Turkmen Kara Yusuf from invading and destroying Hizan Principality like other Kurdish principalities. From this date on, an atmosphere of peace and stability began prevailing in Hizan Principality. At the beginning of the 16th Century, the alliance agreement held between the Kurds and the Ottoman Empire further reinforced this positive situation. Thus, cultural institutions began to emerge in Hizan Principality. Education and training activities increased.

The governors of Hizan who supported writers and scholars provided the conditions for establishing the institution of patronage in this region. As a result of this patronage, a lot of kurdish scholars, man of letters and writers such as Sheik Hasan-i Hîzanî, Selim-i Hizanî, Mollah Halil-i Siirdi, Axaok-i Bîdarî, Mollah Ömer-i Gülpikî began to appear in this period. The cultural and literary level which came about in Hizan Principality reached to such a level that could successfully compete with the cultural and literary level of other Kurdish principalities and neighboring nations. In addition to being a historical heritage, this rich cultural accumulation in Hizan Principality established a foundation on which a lot of top class scholars, man of letters and writers have grown up up to now.

Key Words:

Science, Literature, Kurdish literature, Hizan Principality, History, Kurdish culture

NAVEROK

| | |
|-----------------|------|
| KURTE | III |
| ÖZET | V |
| SUMMARY | VII |
| PÊŞGOTIN | XII |
| KURTEBÊJE | XIII |

DESTPÊK

| | |
|--------------------------|---|
| I. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ | 1 |
| II. RÊBAZ | 6 |
| III. ÇAVKANÎ | 9 |

BEŞA YEKEM

NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI DÎROK, ÇAND, EDEBIYAT Û MEDRESEYÊN KURDAN

| | |
|----------------------------------------------------|----|
| 1. NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI DÎROKA KURDAN..... | 11 |
| 1.1. Dîroka Kurdan Heta Bi Serdema Mîrektiyan..... | 11 |
| 1.2. Dîroka Kurdan Di Serdema Mîrektiyan De..... | 14 |
| 2. NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI ÇANDA KURDAN..... | 19 |
| 2.1. Çanda Kurdî ya Beriya Îslamê..... | 19 |
| 2.2. Çanda Kurdî ya Piştî Îslamê..... | 21 |
| 2.3. Çanda Kurdî ya Serdema Mîrektiyan..... | 23 |
| 3. MEDRESEYÊN KURDAN..... | 24 |
| 3.1. Medreseyên Kurdan û Serdemên Wan..... | 26 |
| 3.2. Destpêka Medreseyên Kurdan..... | 26 |
| 3.3. Medreseyên Sultanên..... | 28 |
| 3.4. Dawiya Medreseyên Sultanên..... | 30 |
| 3.5. Medreseyên Mîran..... | 32 |
| 3.6. Dawiya Medreseyên Mîran..... | 33 |
| 3.7. Pêvajoya Piştî Medreseyên Mîran..... | 33 |
| 4. EDEBIYATA KURDAN..... | 35 |
| 4.1. Nêrînek Giştî Li Edebiyata Kurdî..... | 35 |
| 4.2. Edebiyata Kurdî Di Serdema Mîrektiyan De..... | 36 |

BEŞA DUYEM

DÎROK Û ERDNIGARIYA HÎZANÊ

| | |
|-------------------------------------------------|----|
| 1. HÎZAN JI DESTPÊKÊ HETA HATINA ÎSLAMÊ..... | 40 |
| 2. HÎZAN JI DESTPÊKA ÎSLAMÊ HETA MÎREKTIYÊ..... | 43 |
| 3. HÎZAN DI SERDEMA MÎREKTIYÊ DE..... | 46 |
| 3.1. Rewşa Siyasî..... | 47 |
| 3.2. Rewşa Civakî..... | 52 |
| 3.3. Dawîlêhatina Mîrektiya Hîzanê..... | 54 |
| 4. HÎZAN DI SERDEMA PIŞTÎ MÎREKTIYÊ DE..... | 55 |

BEŞA SÊYEM

PAŞXANEYA ZANIST Û EDEBIYATA LI HÎZANÊ

| | |
|--------------------------------------|----|
| 1. RÊVEBIRÎ Û ÎSTIQRARA SIYASÎ..... | 57 |
| 2. BINGEHA ABORÎ Û BAZIRGANIYÊ..... | 61 |
| 3. AVADANÎ..... | 63 |
| 4. ÇAND..... | 65 |
| 5. DEZGEHÊN PERWERDEYÊ: MEDRESE..... | 66 |
| 5.1. Medreseya Mîr Dawud..... | 67 |
| 5.2. Medreseya Eîfîq..... | 68 |
| 5.3. Medreseya Şahzade..... | 69 |
| 5.4. Medreseya Ûsivê Welî..... | 69 |
| 5.5. Medreseya Meydanê..... | 70 |
| 5.6. Medreseya Sîxalê..... | 71 |
| 5.7. Medreseya Taxê..... | 71 |
| 5.8. Medreseya Gulpîkê..... | 72 |

BEŞA ÇAREM

REWŞA ÎLM Û EDEBIYATÊ LI MÎREKTIYA HÎZANÊ

| | |
|-------------------------------------------------|-----|
| 1. REWŞA ÎLMÎ | 73 |
| 2. ALIMÊN HÎZANÊ..... | 75 |
| 2.1. Şêxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq | 75 |
| 2.2. Şêx Hesênê Hîzanî | 75 |
| 2.3. Mewlana Xizir Bîbî | 76 |
| 2.4. Mela Emerê Gulpîkî | 76 |
| 2.5. Mela Mûradê Xorosî | 77 |
| 3. ALIMÊN BI HÎZANÊ RE PEYWENDÎDAR | 77 |
| 3.1. Seyda Şêx Ebdurrehmanê Taxî..... | 77 |
| 3.2.Şêx Sibxetullahê Arwasî | 78 |
| 3.3.Abdulhadî El Arwasî..... | 78 |
| 4. REWŞA EDEBIYATA KURDÎ LI HÎZANÊ | 79 |
| 4.1.Edebiyatnasên Hîzanîyên Kurdînivîs..... | 79 |
| 4.1.1. Selîmiyê Hîzanî | 79 |
| 4.1.2.Mela Xelîlê Gulpîkî (Sêrtî)..... | 86 |
| 4.1.3. Axaokê Bêdarî..... | 91 |
| 5. EDEBIYATNASÊN BI HÎZANÊ RE PEYWENDÎDAR | 97 |
| 5.1. Feqiyê Teyran..... | 97 |
| NIRXANDIN | 103 |
| ENCAM | 107 |
| ÇAVKANÎ | 110 |

PÊŞGOTIN

Edebiyat nirxekî xasê bi însan e û di neynika dil û hişê mirov de diîse û diçûrise. Her wisa bi rêya xebirdanê, xame û xet, bi gotineke din, bi saya destedewra bi vegotin û nivîsê mayinde dimîne; wek cewherekî dibe mîras û dikeve destê nîşên nû. Bêguman edebiyat bi xweberê dernakeve holê. Jê re zemînekî munbît û binaxeyeke xurt divê. Cih û warên ku şaristanî û edebiyat derxistin holê di encama hin qonaxên girîng de gihîştin vê astê. Ev war û herêm xwedî paşxaneyên dîrokê yên taybet in ku di encama van paşxaneyan de ev cewherên însanî peydabûn û şax vedan.

Gava em li edebiyata Kurdî ya li mîrekiya Hîzanê peyda bûye û belav bûye, dinêrin, paşxaneyeke dîrokî ya bi vî rengî, taviî xwe dide dest. Ev hêmanên ku wek mak û hêlîn ji vê edebiyarê re xizmet kirine, hebûna otorîteya siyasî, çêbûn û berdewamiya îstiqrar û ewlehiyê, peydabûna pergaleke aboriyê û dezgehên perwerdehiyê û hwd. Lêbelê ev paşdîroka Hîzanê ya bi vî rengî ku fêkiyên geş û xweş ê edebiyatê dane, di nav tarîtiyeke şereş de mane. Em lêkolînerên dîrok û edebiyata Kurdî daynin alîkî, haya piraniya lêkolînerên Hîzanî bi xwe jî ji vê gencîneya tarîxî nîne. Gava me dest bi xebatên li ser zanyarî û edebiyata Kurdî ya mîrekiya Hîzanê kir, divê ez îtiraf bikim ku cewherne ji texmîna me gelek zêdetir derketin holê. Bi qenaeta me, digel sedemne dî, sedemekî meçûlmayîna nîrx û paşdîroka vê mîrekiyê ev e ku ev herêm li ser rêyên navendî nîne û wek xezîne yan jî buhuşteke veşartî maye. Hêvîdar im ku ev xebat bibe gavekê ji bo hayîdarbûna ji vê gencê û ji bo nasîna wê.

Xebateke li ser vê mijarê bêguman hêsan nebû. Lewra di vê mijarê de xebateke bi vî rengî nehatibû kirin. Lêbelê pêşniyaz û rexneyên şewirmendê min Doç Dr. Abdurrahman ADAK rê li pêşiya min vekir. Lewma ez ji ber van alikariyên wî û her wisa ji bo serfêşandina wî ya ji bo sererastkirina metnê tezê, jê re spasîyên xwe yên ji dil pêşkêş dikim. Her wiha ji bo xwendin û pêşniyazên di cih de yên Yard. Doç. Dr. Hayrullah ACAR, Yard. Doç. Dr. Ayhan TEK û Semih GEZER jî spasîyên xwe pêşkêş dikim.

Nevzat EMİNOĞLU

Mûş – 2016

KURTEBÊJE

b.d.: bê dîrok

bnr.: binêr

b.n.: berhema navborî

BOA: Başbakanlık Osmanlı Arşivi (Arşîva Osmanî ya Serokwezîrtiyê)

b.z.: berî zayînê

c.: cild

g.ç.: gotara çapnebûyî

g.n.: gotara navborî

h.b.: heman berhem

h.g.: heman gotar

j.: jimare

K.T.: Komara Tirkiyeyê

m.: mirin

p.z.: piştî zayînê

r.: rûpel

t.ç.: teza çapnebûyî

vgz.: veguhêzer

DESTPÊK

I. ÇARÇOVEYA GIŞTÎ

Hêsan nîne ku mirov pênaseyeke edebiyatê ya standart bike. Lewra ev pênasê dê li gor tengbûn û firehbûna naverokê, li gor nêrîn û nêzîktayiyê, li gor şaxên zanistên edebî û hwd. biguhere.¹ Lê li gor pejirandineke gelemperî edebiyat jî wek çandê devkî û nivîskî, hunerê vegotina bi awayekî xweşik ê hizr, hest û xeyalan e.² Her wisa huner û zanyariyek e ku ji bo gihîştina çandê bilind a ji aliyê pejn, raman û xeyalê ve, merivan perwerde dike. Ji bo bigihîje armancê, navgînên vegotinê yên devkî û nivîskî bikartîne. Edebiyat lê dixebite ku ev navgîn di maneya estetîk de, bedew, pêbawer, pejinşiyarker bin û merivan sewqî fikirîn û xeyalkirinê bikin.³ Ev nirx xasê bi însan e û di neynika dil û hişê însan de diçûrise û diçilwile. Her wisa bi rêya xame û xet, bi gotineke din, bi saya nivîsê mayinde dimîne, wek cewherekî dibe mîras û dikeve destê nifşên nû. Bêguman edebiyat bi xweberê dernakeve holê. Jê re zemînekî munbît û binaxeyeke xurt divê. Cih û warên ku şaristanî û edebiyat derxistin holê di encama hin qonaxên girîng de gihîştin vê astê. Ev war û herêm bi peydabûna otorîteya siyasî, çêbûn û berdeewamiya îstiqrar û ewlehiyê, bidestxistina malên pir û dezgehên perwerdehiyê û hwd. êkolên xweser ên çandî û ber û berhemên edebî derxistin holê.⁴

Têgeha çandê, xasma çanda nivîskî bi mijara me ya edebiyatê re têkildar e. Çand bi pênasêya wê ya herî berfireh û bi wateya wê ya antropolojîk ve çand, yekûna nirxên maddî û manewî yê însan e ku bi tevgerêdana wî ya bi civakê ve û wek mîrateyekê bi dest xistiye.⁵ Mirov bi awayekî gelemperî dikare bibêje ku çand şeweyê hevpar ê jiyîna civakê ye ku civakê ji yên din vediqetîne. Çand bi nêrînek berfireh, wek a maddî û manewî, vediqete du beşan. Çanda maddî ji awayê mal û

¹ Terry Eagleton, *Edebîyat Kuramı*, Ayrıntı, İstanbul 2011, r. 16.

² Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014, r. 28; Mehmet Doğan, *Büyük Türkçe Sözlük*, Pınar Yayınları, İstanbul 2008, r. 443.

³ L. Sami Akalın, *Edebîyat Terimleri Sözlüğü*, Varlık Yayınları, İstanbul 1984, r. 168. (Yê ku neqil dike: Rojen Barnas, *Bi Kurmanciya Gewr*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014, r. 73)

⁴ Sinan Hakan, *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2002, r. 8

⁵ John Lyons, *Sprache, Übersetz von Christoph Gutknecht*: Münche: Beck 1983, r. 268. (Yê ku neqil dike: Emine Yılmaz, *Türk Dili Yazılı ve Sözlü Anlatım*, Nobel Yayın Dağıtım, Ankara 2009, r. 9.)

avahiyên însanan, amûr û lebatên ku bikartînin, şeweyê cil û bergê wan, tehrê xwarin û vexwarina wan pêk tê. Tiştên wek ziman, dîrok, urf û edet, huqûq, exlaq ku têkildarê bi hêla manewî yê civakê nin, ew jî cureyên çanda mavewî ne.⁶ Bêguman gelek hêlên têkiliya çand û ziman hene. Berî her tiştî ziman cihok û pire ye ji bo çandê û her wisa hevalbend in ji hev re. Hemû cureyên nirx û cewherê gel ê maddî û manewî yê têkildarê bi jiyana wî, bi rêya ziman tê îfadekirin. Her wiha destedewr û veguhestina wê ya ji dîrokê heta îro û ji îro ber bi nîfşên nû, bi ziman pêk tê.⁷ Agahdarbûna me ya ji awayê jiyîna civakên berê, ji fêhm û feraseta wan a hunerî û estetîk, ji şeweyê hizirîn û hestpêkirina wan, bi rêya daneyên ziman çêdibe. Hêleke din a têkiliya çand û ziman jî ev e ku ziman afirînerê çandê ye. Beşeke girîng ên hêmanên çandî yên têkildarê bi edebiyatê re yên wek helbest, çîrok, klam, stran, mamik, lorîk, heyranok, bi ziman derdikeve holê. Her wisa her şaxeke edebiyatê yên wek van, wek hêmanekî çandî, di nav ziman de tê jiyandin û berdewamkirin.⁸ Têkilî û hevalbendiya çand û edebiyatê jî ji vir derdikeve holê.

War û erdnîgariya Kurdistan ku ji şaristaniya Mezopotamyayê vir de bûye cihê nivîs û edebiyatê, bi hatina Îslamê re, bû jîngeha pêngaveke nû ya çandî û edebî. Di desthilatdariya Kurdistan a di van sedsalên destpêkê yên dewra Îslamê de, binaxeya sazî û dezgehên çandî, perwedehî, bawerî û edebî pêk hat. Di vê serdema aktîf a tarîxa Kurd de, piştî dewra hilweşînê ya sê sed salî ya ku di bin rêvebiriyên merkezi yên Sasaniyên Îranî û Împaratoriya Bîzansê de derbasbûyî, Kurdistan rewşeke nû ya rewneqdar bi dest xistin. Hakimiya Kurdistan a siyasî bi saya koçberîya zêde û fethên eskerî, ji Asya Navîn heta Lîbya û Yemenê dirêj dibû. Kurdistan herêman ku wek dil û qelbê Rojhilata Navîn in, ji îşxalkeran- mesela ji yên wek Xaçparêzan- diparastin û her wisa çanda Kurd jî demên xwe yên zêrîn jiya. Kurd di seranserê vê serdemê de û di warê felsefe, mûzîk, mûzikolojî, matamatîk, muhendîsî, mîmarî û astronomiyê de bûbûne pispor.⁹

Piştî vê serdema ku bi hukumet û dewletên Kurd ên wek Hesenweyhî, Şeddadî, Merwanî û Eyyûbî, heyama mîrektiyan destpê dibe. Mîrektî dewleta piçûk a

⁶ Zeynep Korkmaz, "Dil Kültür İlişkisi", *Türk Dili Üzerine Araştırmalar*, c. 1, Ankara: TDK, 667-678.

⁷ Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009, r. 84.

⁸ Demir- Yılmaz, b.n., r. 10.

⁹ Merhadd Izady, *Kürtler*, Doz Yayıncılık, İstanbul 2009, r. 97.

ku kargêriya wê di destê mîrekî de ye û ji aliyê mîrekî ve tê rêvebirin.¹⁰ Mîr jî wek têgeheke sîyasî û rêvebirî peyveke hevpar e di zimanên Kurdî û Farisî de û tete maneya reîs, serok, amîr.¹¹ Di hin ferhengên de wek maneya mîr peyva “beg / bey” tete nivîsandin.¹² Lê bi qenaeta me ev ne rast e. Têgeha “mîr” maneyeke berfirehtir û bilintir a ji “beg”tiyê, tîne ziman. Her wisa jî Kurd tetegeha “mîr”tiyê di maneya hukumdar de bi kar tînin. Çawa ku wek teamuleke dîrokî Faris ji hukumdarên xwe re dibêjin “şah”, Ereb dibêjin “melîk”, Tirk dibêjin “hakan” yan jî “xaqan”, her wisa Kurd jî dibêjin “mîr”. Tetegeha “mîr” a ku Kurd bikartînin di berfirehî û asta van tetegehên gelên cînar de ye. Ne di maneya “beg / bey” de ye ku maneyeke tengtir û nizimtir tîne hişê mirov. Gava mirov bikaranîna tetegeha “mîr” a nav gel¹³ û emilandina wê ya di klasîkên edebiyata Kurdî de dinihêre, vê yekê dibîne.¹⁴ Delîlekî vê yekê ev e ku Şerefxanê Bidlîsî di pirtûka xwe de ku tete de behsa dîroka gelê Kurd dike, mijara mîr û mîrektiyên Kurd di bin sernavên “Hukumdarên Kurdistanê û dewlet û hukümetên Kurd” de dinivîse.¹⁵ Her wisa tetegeha ku “mîr” “malê mîr” ya ku maneya “malê kamûyê”, “malê dewletê”, “xezîneya dewletê” îfade dike û derketiyê holê jî vê qenaeta me xurt dike.¹⁶ Nimûneyên nivîskî yên çand û edebiyata Kurdî yên piştî Îslamê ku di dest me de ne, yên vê serdemê ne. Di serê vê serdemê de gelek mîr û melîkên Kurd li herêmên xwe, bûn desthilatdar. Li van herêman îstiqrareke sîyasî, pêşketineke civakî û aborî pêk hat. Ev mîrên han her wisa xwedî li edîb û zanyaran derketin. Van edîb û zanyaran jî nimûneyên nivîskî yên pêşîn ên

¹⁰ M. Emin Bozarşan, *Mem û Zîn Ehmedê Xanî*, Weşanên Deng, Stenbol 2005, r. 7.

¹¹ Doğan, b.n., r. 1147.

¹² Zana Farqînî, *Ferheng Sözlük*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 422.

¹³ Stranekegelêrî ya herêma serhedê ya bi nivî Kurdî-Tirkî ku peyva “mîr” tete de derbas dibe, eynî vê maneya “mîr”tiyê ya ku em angaşî dikin, tîne bîra meriv:

“Gîlîdax mîrê çîyan e/ Gulî gulî baxlarim
Gîlîdax mîrê çîyan e/ Deste gulî baxlarim.
Hatime te bibînim/ Gulî gulî baxlarim.
Dê û bavê te li min kîn e / Deste gulî baxlarim.....”

Di vê strana gelêrî de jî çîyayê Agirî ku di nav Kurdan de wek Gîlîdax yan jî Ararat jî tete zanîn û çîyayê herî mezin ê erdnîgariya Kurdan, Tirkiyeyê û herêma Rojhilata navîn e, wek “mîrê çîyan”, yanî wek “şahê” çîyan, wek “padîşahê” çîyan, hatiye tewsfîkirin. (“Gîlîdax” jî “Agirî Dağı” ya Tirkî muxerref e) Di Tirkîti de jî gava tişteki mezintirîn tete îfadekirin, bi wesfê “şah” û “padîşah”tiyê ve tete ziman. Wek mînak “ilimlerin şahı ve padişahı, iman ilmidir. Yani şah ü padişahê ilman, ilmê îmanê ye.” Li vir jî tete xuyan ku tetegeha “mîr”tiyê jî tetegeha “beg/bey”tiyê firehtir e li gor qenaeta me.

(Çavkanî: Min ev strana gelêrî ji dayika xwe guhdarî kiribû û wê jî ji pîrika xwe. Nevzat Eminoglu)

¹⁴ Bozarşan, b.n., r. 166.

¹⁵ Şerefhan Bitlîsî, *Kürt Tarihi*, Cild: 1, Çapa 2., (Wergêrê Ji Farisî: Abdullah Yeğîn), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014, r. 54.

¹⁶ Doğan, b.n., r. 1148.

çand û edebiyata Kurdî nîşan dan. Wuhareng herêm û navendên Kurd ên wek Bidlîs, Cizîr, Hekkarî, Mukus, Amediye, Erdelan, bûn navendên edebiyata Kurdî. Hîzan jî navendeke ji van navendan e.

Hemû binaxeyên çanda maddî û manewî ku ew navendên din gerandine navenda edebiyata Kurdî, li Hîzanê hene. Çi medreseyên mezin û navdar û çî jî edîb û zanyarên Kurdînivîs. Lê heta niha qe tu dîrokzan, edebiyatnas û lêkolînerêkî, qasî ku Hîzan heq dike, li ser van nîrx û cewherên Hîzanê nesekiniye û neaniye ziman. Wek mînak: dîrokzan û lêkolîner Abdullah Varlı pirtûkeke bi navê *Dîroka Dugelên Kurdan*¹⁷ nivîsiye û ji Mîrekiyên Candarî, Germaniy, Dulqadiriyên li Kutahyayê, Çankiriyê, Meraşê bigre heta mîrekiyên Bidlîs û Cizîrê, tê de qala gelek mîrekiyan dike.¹⁸ Lê gelek balkêş e ku tê de qala mîrekiya Hîzanê nake. Dîsa dîrokzan û lêkolînerê Bidlîsî, Şakir Epözdemir ku pirtûkeke bi navê *Medreseyên Kurdistanê*¹⁹ nivîsiye û tê de di bin sernavê *Medreseyên Mîran* de behsa gelek medreseyên mîrekiyên Kurd kiriye. Li Hîzanê digel ku herî kêr heşt medreseyên mezin ên mîran hene. Lê tenê qala medreseyeke Hîzanê kiriye. Bi qenaeta me, ev xebat dê nîşan bide ku Hîzan herêm û navendeke çand û edebiyata Kurdî ya girîng e. Her wisa ne kêmtirê ji wan herêm û navendên edebiyata Kurdî ên din e.

Herêm û navendên edebiyata Kurdî ya klasîk bi gelemperî li erdnîgariya mîrekiyên Kurdan ên serdema navîn in. Xebat û lêkolînen dîroka edebiyatê ya li ser vê serdem û van herêman pir girîng in. Lewra haveyn û kakilê edebiyata Kurdî û xasma edebiyata klasîk di vir de veşartîye.

Xebatên ku heta niha li ser tarîxa edebiyata Kurdî ya klasîk hatine kirin, ji hêla metodolojiyê ve, exleb di tixûbên diyardeya zeman û perspektîfa kronolojîk de mane. Hale hale di destnîşankirina dîroka edebiyata klasîk de diyardeya mekan û perspektîfa herêmî jî rêbazên girîng in. Di vê hêlê herêma Hîzanê ji bo perspektîfa herêmî nimûneyeke girîng e. Lewra ev herêm di serdema mîrekiyan de û piştî vê serdemê jî wek navend û herêmeke edebiyata Kurdî ya klasîk derdikeve pêş.²⁰

¹⁷Ebdullahê Memê Mehmed Hoko Xanî Varlı, *Dîroka Dugelên Kurdan 600-1500*, Derpêç 1, Weşanên Sîpan, Stenbol 1997, r. 261, 274.

¹⁸Varlı, h.b., r. 271.

¹⁹Şakir Epözdemir, *Medreseyên Kurdistanê*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015, r. 52.

²⁰Adak, Abdurrahman, "Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmî: Nimûneya Herêma Bedlîsê", *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 1/1, Havîn 2016, r. 33-56.

Heta niha di derbarê van navend û herêman de ji ber qedexe û bêfmkaniyan lêkolînên bi rêk û pêk çênebûne. Ev herêm digel ku ji hêla zanyar û edîban ve û ji hêla saziyên perwedehiyê ve xayet dewlemend e, pir hindik xebat û lêkolîn li ser hatine kirin. Lewma me xwest ku em li ser zanyarî û edebiyata herêma Hîzanê ya sedema mîrekiya Hîzanê hûr bibin û van zanyar û edîban û berhemên wan binirxînin û bidin nasîn.

Tixûbê xebata me, ji hêla dem ve, serdema mîrekiyan e û ji hêla naverokê ve jî, zanyarî û edebiyata Kurdî ya mîrekiya Hîzanê ye. Sedsalên di navbera XII. û nîveka sedsala XIX. digre nav xwe. Her wisa ji hêla erdnîgariyê ve jî, li ser herêma bajarê Hîzana Kevn û Hîzana nû disekine.



II. RÊBAZ

Mijara xebata me ji ber ku zanyarî û edebiyata Kurdî ya serdema mîrektiya Hîzanê ye, em di serê xebata xwe de li ser dîroka Kurd û bi taybetî jî li ser serdema mîrektiyan sekinîn. Lewra destnîşankirina heyam û qonaxên dîroka Kurd ji bo lêkolîna li ser çand û edebiyata Kurdî daneyên girîng û bingehîn in. Her wisa di çêbûn û geşbûna van nirxan de xanedan û dewlet xwedî roleke sereke ne. Lewra dezgehên xwendin û nivîsandinê saz kirine û her wiha ew parastine û piştewaniya wan kirine.

Binyad û paşxaneya çand û edebiyata Kurdî digihêje heta heyama dîroka Kurdan a beriya Îslamê.²¹ Lewma em pêşî li ser nirxên vê serdemê hûrbûn. Heçî çand û edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê ye, zêdetirîn daneyên wê di dest me de hene ku em di wan de dikarin rê û rêça nimûneyên lîteratura devkî û nivîskî yên serdema mîrektiyan bişopînin. Çand ji ber ku babetê berfireh e, em ji çanda maddî bêhtir li ser çanda manewî sekinîn. Her wisa di nav vê babetê de jî me giranî da ser wan dezgehên ku ji çanda nivîskî û edebiyatê re bûne bingeh. Ji van saziyan ên sereke û diyarker bêguman medrese ne. Lewma heta ji destê me hat, me xwest ku em bi awayekî berfireh li ser medreseyan bisekinin. Lewra çand û edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê û her wisa ya serdema mîrektiyan reng û dirûvê xwe, ray û ramanê xwe û bîr û baweriya xwe bi giranî ji çavkaniya medreseyan werdigre. Ji ber vê yekê di vê mijarê de em pêşî li ser destpêka medreseyan û li ser belavbûna wan a li erdnîgariya Îslamê sekinîn. Paşê me medreseyan ku li erdnîgariya Kurdistanê çêbûne, anî ziman û em li ser serdem, qonax û herêmên van medreseyan ku wek Medreseyan Kurdan²² ketine lîteraturê, hûr bûn. Wuhareng me di beşa pêşîn de çarçoveya teorîk a xebata xwe danî. Her wisa me xwest ku em bikaribin li ser vê binaxeyê û di nimûneya çand û edebiyata Hîzanê de van nirxên serdema mîrektiyan bînin ziman.

Di beşa duduyan de em li ser dîroka Hîzanê sekinîn. Gava meriv qala zanyarî, çand û edebiyatê dike, bivê nevwê rêya mirov bi dîrokê jî dikeve. Di vê babetê de herçend tixûbê lêkolîna me serdema mîrektiya Hîzanê be jî divê dîroka Hîzanê ya beriya Îslamê û piştî Îslamê jî bê zanîn. Da ku bi agahdarbûna ji paşxaneya dîroka

²¹J. Kurdo, *Kürt Kültürünün Kaynakları ve Uygarlıklar Beşiği Kürdistan*, Weşanên Özgür Gelecek, Ankara 1992, r. 10

²²Şakir Gözütok, "Medreselerin Ortaya Çıkışı ve İlk Medreseler", *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler*, Cild:1, Zanîngeha Mûş Alparslanê, Mûş 2013, r. 56.

Hîzanê ya beriya mîrekiyê ve, rewş û rastiya cewherên çanda nivîskî û edebî ya li vê navend û herêmê derkeve holê. Di vê çarçoveyê de em li ser dîroka Hîzanê ya ji destpêkê heta hatina Îslamê, ji hatina Îslamê heta serdema mîrekiyan û her wisa jî li ser dîroka Hîzanê ya serdema mîrekiya Hîzanê sekinîn.

Beşa sisêyan, behsa taybetmendiyan rêvebirî û îstiqrara siyasî ya li mîrekiya Hîzanê dike. Da ku pileya bandora van taybendmendiyan a di peydabûna zanyarî, çand û edebiyata Kurdî de ya li vê mîrekiyê eşkere bibe. Di vê çarçoveyê de li ser rewşa avadanî, çavkaniyan aborî û dezgehên xwendin û perwerdehiyê yên li vê mîrekiyê sekinîn. Ev dezgehên ku bingeha çanda nivîskî ne li Hîzanê, medresen e. Lewra me di lêkolîna xwe ya derbarê çandê de, giranî daye ser çanda nivîskî. Ji ber ku mijara çandê pir fireh e, me xwest ku em vê mijarê bi sînor bikin û tenê li ser hêla wê ya nivîskî ya ku têkildarê bi edebiyatê ye, bisekinin. Ev medrese her wisa çavkaniya perwerdehî û edebiyata Kurdî ne di serdema mîrekiya Hîzanê de. Me di vê babetê de di derheq heşt medreseyan Hîzanê de agahî bi dest xistin.

Beşa çaran esl û esasê mijara me pêk tîne. Di vê beşê de em li ser ilm û edebiyata li mîrekiya Hîzanê ya sedema mîrekiyê, hûr bûn. Di bin vê sernavê de me pêşî di derbarê zanyarên Hîzanî de agahî dan û paşê jî em li ser edebiyatnasên Hîzanî sekinîn. Di medreseyan Hîzanê de gelek alim, edîb, zanyar û helbestvan derketine. Qismekî wan bîzzat li vê mîrekiyê hatine dunyayê û ji mîrekiya Hîzanê ne. Di vê babetê de yên herî navdar ku berhemên Kurdî jî nivîsîne Selimiyê Hîzanî û Axaokê Bêdarî ne. Gelek navên din jî hene ku berhemên wan neketine destê me. Wekî din hin edebiyatnas û zanyar jî hene ku her çend ne ji Hîzanê ne lê têkiliya wan bi Hîzanê re hene. Ji vana yekî wî helbestvanê bi nav û deng ê serdema klasîk Feqiyê Teyran e ku du sal berê bi saya sê akademisyen û lêkolînerên edebiyat û dîroka Kurd, qebra wî li gundê Şandis a Hîzanê hate dîtin.²³ Wekî din Mela Xelîlê Sêrtî jî her çiqas bi eslê xwe ji Hîzanê be jî, ji ber ku piraniya jiyana xwe li Siêrtê derbas kiriye, li wir behrem daye û li wir wefat kiriye, me ew jî daxîlî mijara edîbên bi Hîzanê re peywendîdar. Di vê babetê de em li ser jiyana û berhemên wan hûr bûn.

Wuhareng me di van beşên xebata xwe de xwest ku faktorên sereke yên pêkvehatin û xasma pêşketina zanyarî, çand û edebiyata Kurdî ya serdema mîrekiya Hîzanê, bînin ziman. Çanda nivîskî, edebiyat, helbestvan û nivîskar ne bi tena serê

²³ Hayrullah Acar, Abdurrahman Adak, Yusuf Baluken, "Gora Feqiyê Teyran /Faqah Tayran's Tomb", *Nûbihar Akademî*, I/I, s. 2014, r. 109-118.

xwe, bîlakîs bi saya dorhêleke kompleks derdikevin holê. Ev binaxe û derdorên dîyarde jî hêmanên wek desthilatdarî, îstiqrar, têkûzî û aramiya civakî, asta aborî, saziyên çandî û perwerdehî ne ku em van hemû hokeran di peydabûn û pêşketina zanyarî, çand û edebiyata Kurdî ya serdema mîrekiya Hîzanê de dibînin. Her wisa jî di çêbûna herêma Hîzanê ya wek navendeke ilm û edebiyata Kurdî de jî ev hoker diyarde ne.



III. ÇAVKANÎ

Mijara xebata me dikeve nav tixûbê edebiyata Kurdî ya klasîk. Di aliyekî de jî bi dîroka edebiyatê re têkildar e. Lewra em li ser çand û edebiyata serdemeke berî 300-800 salî disekinîn. Her wisa ji bo fêmkirina rewş û rastiya wê serdemê pêwistî bi çavkaniyên dîrokê jî hene. Lewma ev xebat têkildarê bi çendîn zanist û dîsîplînên civakî ne.

Beşa pêşîn a xebata me ji ber ku derbarê dîroka Kurd û serdema mîrektiyan de ye, me bêhtir ji çavkaniyên dîrok, antropolojî û sosyolojiyê îstifade kir. Dixwazim derheqê hin çavkaniyan de agahiyên kurte bidim.

Çavkaniyeke me ya girîng a ji bo dîroka Kurd û her wisa jî bo dîroka Hîzanê *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* (m. 1603) ye. Ev pirtûk ji bo mijara me çavkaniyeke di rêza çavkaniyên yekemîn de ye. Mîr Şeref di vê pirtûkê de qala dîroka siyasî ya hemû xanedanên Kurdan dike û her wisa derbarê Mîrektiya Hîzanê de jî melûmatên têr û tijî dide.

Pirtûka bi navê *Kurd* a Mehrdad R. Izady jî ji bo dîroka Kurd a qedîm, serdemên destpêka Îslamê û serdema mîrektiyan agahiyên girîng dide û analîzên hêja dike. Ev dîrokzan û lêkolînerê han Kurdistanê wek yek ji navend û herêma pêşîn a şaristanî, çanda nivîskî û edebiyatê nîşan dide. Her wisa di destpêka nivîs û şaristaniya mirovahiyê de rol û tevîneka sereke ya vê herêmê destnîşan dike.

Pirtûka J. Kurdo ya bi navê *Kürt Kültürünün Kaynakları ve Uygarlıklar Beşiği Kürdistan* di derbarê dîrok û çanda Kurdî ya beriya Îslamê de gelek agahiyan dide. Me di vê derbarê de ji vê çavkaniyê sûd wergirt. Her wisa di vê derbarê de xebata bi navê *Kürt Kimliği ve Kültürü* ya Philip Kreyenbroek- Christine Allison jî gelekî kêrî me hat. Pirtûka *Dîroka Dugelên Kurdan-I* a AbdullahVarlı jî di vê babetê de girîng e. Herçend derbarê mîrektiya Hîzanê de agahî di vê pirtûkê de tunebin jî di derbarê ziman, çand û dîroka Kurd a qedîm û serdema mîrektiyan de tê de daneyên girîng hene.

Beşa duduyan û sisêyan a xebata me ji ber ku derbarê dîroka Hîzanê û rewşa civakî, aborî û siyasî ya Hîzanê ya serdema mîrektiyan de ye, çavkaniyên me yên van beşan bêhtir ên dîroknasî-sosyolojiyê ne. Çavkaniyeke me ya bi vî rengî, pirtûka bi navê *19. Yüzyılda Kürdistan'ın Sosyo-Kültürel Yapısı ve Kürt –Ermeni İlişkileri*, ya Mayevsriy V. T. ye. Çavkaniyeke din jî pirtûka *Mesail-i Mühimme-i Kürdistan* e ku

ji wesîqe û belgeyên ji arşîva Osmanî yên di derbarê erdnîgariya Kurdistanê ya serdema mîrektiyan pêk tê. Ev lêkolîn û xebat ji hêla Kerem Soylu ve hatiye berhevkirin û deşîfrekirin. Di derbarê serdema mîrektiyan, mîrektiya Hîzanê û xasma mîrên Hîzanê yên wê heyamê de agahiyan îhtiwa dike. Her wisa me di vê derbarê de ji pirtûka *Kürtler ve Kürdistan Tarihi* ya Muhammed Emîn Zekî Beg (m. 1948) jî sûd wergirt. Pirtûka *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud* a Sinan Hakan jî di derbarê serdema mîrektiyan û rewş û taybendmendiyan sîyasî, çandî û civakî yên wê heyamê de agahiyan dide. Wekî din pirtûka bi navê *Medreseyên Kurdistanê* ku ji hêla Şakir Epözdemir ve hatiye nivîsîn, di derheq sazî û dezgehên çanda nivîskî û herêmên perwerdehiyê de yên di serdema mîrektiyan de ahahiyên hêja dide. Herçend di derheq medreseyên Hîzanê bi xwe de agahî di vê pirtûkê de tunebin jî agahiyên gelemperî yên di derbarê heyamê û di derdora Hîzanê de îhtiwa dike.

Beşa çaran a xebata me ji ber ku çand û edebiyata Hîzanê ya serdema mîrektiya Hîzanê ye, me bêhtir serî li çavkaniyên edebiyatê- dîroka edebiyatê xist. Di vê derbarê de çavkaniyên sereke ku me jê îstifade kirin ev in: Pirtûka *Mêjûy Edebî Kurdî* ya Eladîn Secadî (m. 1984), pirtûka *Tarîxa Edebiyata Kurdî* ya Qanatê Kurdo (m. 1985), pirtûka *Mêjûy Edebî Kurdî* ya Merûf Xeznedar (m. 2010), pirtûka *Hozanvanêt Kurd* a Sadiq Behaedîn Amêdî, pirtûka *Destpêka Edebiyata Kurdîya Klasîk* ya Abdurrahman Adak, *Dîroka Wêjeya Kurdî* ya Feqî Huseyn Sağnîç (2002).

Me di vê beşê de ji pirtûkên helbestvanên Hîzanê jî sûd wergirt. Her wisa xebatên li ser van helbestvanan jî, bûne çavkaniyên xebata me. Wek mînak; *Yûsuf û Zuleyxa* ya Selîmiyê Hîzanî ku Ayhan Gevêrî edîsyon-krîtîk û amadekariya wê kiriye. Pirtûka Mela Xelîlê Sêrtî ya bi navê *Nehcul Enam* û xebata bi navê *Nehcul Enama Mele Xelîlê Sêrtî* ya mastirê ku Îbrahim Gözetin amade kiriye. Pirtûka *Feqiyê Teyran* ku Xalid Sadinî amade kiriye. Her wisa pirtûka *Bajar-Edebiyat û Cizîra Botan* a Zülküf Ergün û hwd. em dikarin bijmêrin.

BEŞA YEKEM
NÊRÎNEKE GIŞTÎLIDÎROK, ÇAND, EDEBIYAT Û
MEDRESEYÊN KURDAN

1. NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI DÎROKA KURD

1.1.Dîroka Kurdan Hetabi Serdema Mîrektiyan

Gelek dîrokzan dîroka Kurdan bi awayekî gelemperî wek “serdema hukumetên Kurdan û serdema mîrektiyên Kurdan” vediqetînin bi du beşan. Bi gotineke din wek “beriya Mîrektiyan û wexta mîrektiyan” tesnîf dikin.²⁴ Em ê jî li gor vê tesnîfê pêşî bi awayekî gelemperî li ser dîroka Kurd bisekinin û paşê jî bi taybetî li ser serdema mîrektiyan hûr bin.

Pêşiyên Kurdan ji berê de li herêmên erdnîgariya navendî ya Rojhilata navîn bi cîh bûne, desthilatdariya çavkaniyên berfireh ên xwezayî û însanî kirine û bi awayekî jênegar di ceribînên pêşîn ên nivîsînê de hatine tomarkirin. Kurd di vê gerstêrkê de digel wan gelên herî kevn ên ku xwendin û nivîsînê dizanin ên Rojhilatanavîn, xwedî dîrokeke hevpar in. Her wisa çêbûn û veguhastina van şaristaniyan de tevînek û tevkariya wan eşkere ye.²⁵ Kurd ji yekûna piraniya gelên Zagrosê pêk tên. Her wisa li gor piraniya dîroknasên Kurd peyva “Kurd” jî di maneya “jêhatîbûn” û “egîfî”yê de ye û ji ber cesareta vî gelî ev nav li wan hatiye danîn.²⁶

Kurd ji destpêka dîrokê vir de li ser vê axa xwe dijîn. Her wisa netewekî Hînd û Îranî ne. Zimanê wan jî zimanekî serbixwe ye û dikeve nav malbata zimanên Hînd û Ewrûpî.²⁷ Gelê Kurd ji hêla ziman, edet û rewşa civakî ve, vediqetin çar beşan: Kurmanc, Lor, Kelhor, Goran/Zaza. Tixûbê welatê Kurdan li ser xeteke rast ji peravê behra Hurmizê ku ji Ûmmanê vediqete, destpê dike; ji wir heta dawîya wilayetên Mereş û Meletiyeyê diçe. Wihareng li aliyê bakûrê vê xetê Fars, Eraqa Ecem, Azerbeyan, Ermenistana Piçûk û Ermenistana Mezin cih digrin. Heçî li hêla wê ya başûr e, wilayetên Eraqa Ereb, Musûl û Diyarbekir hene. Her wisa jî ji nîjada vî

²⁴ Şerefname Bidlîsî, *Şerefname Dîroka Kurd*, Wergêr: M. Emin Bozarslan, Weşanên Deng, Stenbol 2011, r. 53; Muhammed Emin Zeki Beg, *Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012, r. 58-110; 695.

²⁵ Mehrdad Izady, b.n., r. 55

²⁶ Bidlîsî, b.n., r. 19; Zeki Beg, b.n., r. 60.

²⁷ Zeki Beg, h.b., r. 58-110; Varlî, r. 14.

netewî gelek gel û qebîle ji rojhilatê heta rojava belav bûne.²⁸ Hêleke wê ji Erzurumê bigre heta Wan, Hekkarî, Cizîr, Amêdiye, Musûl, Şehrezor, Herîr, Erdelan, Bexdad, Derne, Derteng yan jî Besrayê heftê qonax erd wek Kurdistan tête hesabandin. Li çiya û warên di navbera Îraqa Ereb û Diyarê Germiyanî de qasî şeş hezar eşîr û qebîleyên Kurd dijîn. Kurd hemû ji mezhebê Şafiî ne. Di welatê wan de 776 heb kela hene û hemû mamûr in.²⁹

Li gorî hin dîroknasan Ariyayî di hezareya sêyem a berî zayînê de li başûrê Rûsyayê bi ser bakûrê Qefqas û Derya Reş re koçberî rojavayê Asyayê bûne. Li wir jî ew bûne du beş. Beşek ji wan çûne Ewrûpayê. Neteweyên Ewrûpayî yên niha paşmaya wê beşê ne. Beşa din jî çûne Rojavayê Navîn. Bi maweyeke hezar salî li wir mane. Paşê jî berê xwe dane bakûrê Îranê. Piştî demekê ew beş jî bi xwe bû du destê. Desteyek çû Hîndê û li Pencabê bi cîh bû. Gelê Hîndistanê paşmaya wê desteyê ye. Desteya din jî li Îranê belav bû. Wan bi navê “Îranî” deng veda. Ew desteya kul i Îranê belav bibû, hêdî hêdî zêde bûn û paşê jî bûn du ref. Refek li deştên Îranê niştecih bûn û wekî “Pars” deng dan. Yên din jî li ser çiyayên Ararat û Zagrosê belav bûn jî, dewleteke bi navê “Med” damezrandin. Faris jî pêş ketin û wan jî dewleteke bi navê “Hexamenişîn” ava kirin. Wan dewleta Medya di sala 550yê berî zayînê de têk birin. Vêca koka Farisan diçe ser Hexamenişiyan û ya Kurdan jî diçe ser Medan.³⁰

Piştî hatina Îslamê ya di sedsala 7an de, koçberên Kurdistanê li dervayî welatê xwe wek qral û prens hatin îqtidarê. Wuhareng Kurdan bi pejirandina dînê Îslamê ve rewşeke nû bidest xistin. Bi vê rewşa nû ve, bûne hevparê desthilatdariyên siyasî jî di rojhilata navîn de. Kurdan bi saya xanedanên hukumdar roleke girîng hildan ser milê xwe. Ji vana ya berbiçav di serî de malbata Buweyhiyan e (p. z. 932-1062) ku bi xeletî wek Bûyîdî tînan zanîn û her wisa Deylemî yan jî Dilamî yên di serê serdema navîn in ku çend heb dewlet ava kirine. Yek ji xanedanên girîng ê din jî Şeddadî (951-1174) yên li Şêrwan, Eran û Ermenistanê ne. Yeke din Rewadî ne ku wek Mamlanî jî tînan zanîn, ên li Azerbeycan û Başûrê Qafqasyayê ne. Her wisa di vê

²⁸ Bitlisi, b.n., 63.

²⁹ Evliya Çelebi, *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*, Wergêr: Zuhuri Danışman, C. 6, Zuhuri Danışman Yayınevi, İstanbul 1997., r.

³⁰ Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*, Stenbol 2002, r. 17.

serdemê de Hesenweyhiyên Başûr û Navîna Kurdistanê jî xanedanên Kurd ên girîng in. Ji van xanedanên Kurd - piştî Buweyhiyan- a herî sereke xanedana Eyyûbî ye di serdema navîn de. Eslê Eyyûbiyan digihêje malbata hukumdar a Hadhabanî ku heft sed sal berê wek qralên dewleta Hadîhabanî ya bi eynî navî wek endamekî federasyona Partiya (Berî Mîladê 227- Piştî Mîladê 224) hukum kirine. Avakarê împaratoriya Eyyûbî Sultan Selahedîn bi qesta rizgargirina Axa Pîroz (Qudûs) a ji destê Xaçparêzan, ji Kurdistanê bi rê ket (hukumdariya wî 1169-1193), qralê Îngîltereyê Richardê Dilşêr têk bir û digel Kurdistanê, Rojavayê Ermenistanê, Suriye, Axa Pîroz, Erebistan, Misir, Lîbya, Rojhilatê Tûnûsê, Bakûrê Rojavayê Sûdanê, Hîcaz û Yemenê hilda bin hukmê xwe û desthilatdariya xwe berfireh kir. Şaxên Eyyûbiyan yê curbecur, van erdnîgariyên han ji salên 1169an heta 1260an rêve birin. Hin herêmên Sûriyeyê heta salên 1342an û Kurdistan bi xwe jî heta sedsala 15an îdare kirin. Diyarbekira ku kela dawî ya Eyyûbiyan bû, di vê tarîxê de mexlûbê Aqqoyûniyên Turkmen bûn.³¹

Van xanedanên Kurd ên hukumdar li hemberî Xiristiyan û Yahûdiyên ehlê herêmên xwe, bi camêrî tevgeriyan û mînakeke însaniyetê nîşan dan. Wihareng asteke azadiya dînî ya fewqelade bi dest xistin. Helwesta bi vî rengî ya Şedadiyên Kurd a li hemberî Xiristiyanên Gurcî û Ermenî jî di çavkaniyên modern ên Xiristiyanan de cih digrin. Her wisa gelek dîroknaş, dîroka Kurd bi awayekî gelemperî vediqeteînin bi sê serdeman: Ji destpêkê heta serê serdema hatina Îslamê, dewra hukumdar û hukumetên Kurd ên sedsalên pêşîn ên serdema Îslamê û serdema mîrekiyên Kurd û dûmahîka wê.³²

³¹ Izady, b.n., r. 111.

³² Izady, h.b., r. 55

1.2. Dîroka Kurdan di Serdema Mîrektiyan de

Mîrektî rêxistin û teşkîlateke civakî û polîtîk a bilind e di nav Kurdan de. Eslê vê saziya otorîteya sîyasî û dewletbûnê ya di nav Kurdan de, diçe heta serdema dêrîn.³³ Mîrektî yan mîrnîşîn ew dewlet in ku ji aliyê mezinbûna hukum û firehbûna erdnîgariyê ve nagihêjin dereceya dewletên mezin. Lêbelê ev dewletên piçûk hemû taybendmendiyan dewletên serbixwe bi awayekî gelemperî nîşan didan. Mîrektî ji wê koma civatê ya hevgirtî re tê gotin ku digel mîr yan hukumdarê xwe yê serbixwe û wezîr û kizîran xwedî armanceke kifşe ne. Ji bo hebûn û nasîna vê otorîteya sîyasî hin şert û merc hene ku divê ev civata yekgirtî wan pêk bîne. Wekî çêkirina qanûn û rêzikan, parastina mafan û pêkanîna dadê, parêzvaniya tixûb û dergehên hukumeta xwe ji êrîşên neyaran, çapkirina diravan, xwendina xutbeyê li ser navê mîr, stendina bacê û hwd. Ev desthilatdarî bi rêya werasetê destedewrê nîşên din ên xanedanê dibû. Ji wî kesê desthilat re ku bi navê xanedanê serokatî dikir re Kurdan digot Mîr, Ereban digot melîk, Farisan digot Şah, Tirkan digot Xaqan, Ewrûpiyan digot Prens.³⁴ Civatên Kurd ên muxtelîf jî di dawîya serdema Emewî û Ebasiyan de otoriteyên xwe yê siyasaî bi rengekî nû saz kirin û wek desthilatdariyên herêmî dane meşandin. Van mîrektiyan di serdema Osmanîyan de jî bi Osmanîyan re îttifaq pêk anîne.³⁵ Osmanîyan jî wan wek muttefîq dîtine û ew wek “Ekrad Hükümetleri” yanî wek “Hukumetên Kurd” bi nav kirine.³⁶ Hewcedariya Osmanîyan bi van mîrektiyên Kurdan hebû. Lewra Osmanîyan gava bixwastana êrîş bibine ser Îraniyan, heya îttifaq bi Kurdên sunî re çênekirina, nikaribûn tiştê bikirana.³⁷

Xanedanên Kurd yê wek Eyyûbî piraniya Kurd di bin banekî de kom kirin û her wisa jî di navbera musulmanan de yektiyek xurt pêk anîn. Di vê serdemê de bandora xanedanên Kurd û gelheya wan hem zêde bû û hem jî li erdnîgariya cîhana Îslamî belav bû. Wuhareng êrîşên xaçparêzên Ewrûpî dan sekinandin û def kirin. Her wisa jî desthilatdariyeke berfireh bidest xistin. Çaryek sedsal piştî wefata Sultan

³³Cemal Ülke, “Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürdistan Eyaleti ve Kürdistan Eyaletinin Kuruluşu”, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013, r. 159.

³⁴Varlı, b.n., r. 99.

³⁵Şakir Epözdemir, *1514 Amasya Antlaşması Osmanlı - Kürt İttifakı ve Mevlana İdris-i Bitlisi*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2005, r. 95.

³⁶Epözdemir, b.n., r. 60.

³⁷Ebdullah Memê Mehmed Hoko Xanî Varlı, *Dîroka Dugelên Kurdan 600-1500*, Derpêç 1, Weşanên Sîpan, Stenbol 1997, r. 99.

Selahaddînê Eyyûbî, fethên Cengiz Xanê serokê dewleta Moxolan gihîşt tixûbê cîhana Îslamî.³⁸ Di encama êrîşên Moxolan de dawî li hukûmetên mezin ên rojhilata navîn hatin.

Piştî ku êrîşên Cengiz Xan sekinîn demek şûn de li hêla Xorasan / Xuristan û Sîstanê hukûmeteke Kurd ava bû. Ev hukûmeta han zahiren di bin hîmayeya Cengiz Xan de bû; lê di rastiyê de serwxê bû û 130 sal berdewam kir. Paşê di heyama Tîmûrleng de hilşiya. Di dewra vê dewletê de hîndekarî û perwerdehiyê gelek hîmaye dît. Zanyarê navdar Melîk Mazîddîn Muhammed jî xwedî nav û dengekî heqdar û qedrekî bilind bû di vê desthilatdariyê de.³⁹ Di serê sedsala sêzdehan de êdî serdema Îslamê ya Kurd qediyabû, bandora xanedanên Kurd ên mezin û împaratoryal nemabû; lê prens û mîrên piçûktir ên Kurd derketin pêş û berdewam kirin. Dagirkeriya Moxolan ya li ser rojhilata navîn jî xweseriya van mîrekiyan kêmkir. Bandora êrîşên Moxolan ên li ser Kurdistanê zêf bû. Li herêmên Kurd ên wek Erdelan, Bidlîs, Hekkarî, Erdelan, Cizîr, Mukus, Hîzan, Îmadiye, Hesenkêf, Bazîd, edebiyata Kurd û xasma jî ya bi zaravayê Kurmancî pêş ket.⁴⁰

Eba Muslimê Xorasanî yê Kurd û mensûbên wî p.z. di salên 750an de Xelîfetiya Emewî hilweşandin û di dewsa wê de Xelîfetiya Ebbasî ava kirin û wihareng Kurd ji helak û îmhayê rizgar kirin. Piştî vê destguherîna desthilatdariyê ya balkêş li gelek deverên Kurdistanê yê cuda cuda gelek mîrekiyên ava bûn. Her çiqas van mîrekiyên Kurd yektiyek xurt pêk neanîn û nebûne dewleteke mezin; lê di hebûn û berdewamiya nasname, çand û zimanê Kurdî de bûne xwedî roleke girîng û mezin. Mîrekiyên ku me navên wan tespît kirine ev in: Erdelan, Sîyah Mensûr, Çeknî, Zengene, Pazûkî, Somayî, Soran, Mahmûdî, Mukrî, Baban, Biradost, Behdînan, Hekkarî, Muks, Bedlîs, Hîzan, Mûş, Spayerd, Sason, Cizîra Botan, Heskêf, Şêrwan, Garzan, Farqîn, Zirkî, Gurdikan, Batman, Qulp, Çapaxçûr, Gêncê, Mirdasî, Êgil, Palo, Çemîşgezêk, Menckurd, Qoçhîsar, Divrig, Rişwan, Kilîs, Mendelan, Sorikan.⁴¹

³⁸ Parlar,

³⁹ İbrahim Hakkı *İbrahim Hakkı Tarihi*, İstanbul 1990, Cild:7, r. 98.

⁴⁰ İzady, b.n., r. 55

⁴¹ Ahmet Özer, *Beş Büyük Tarihi Kavşakta Kürtler ve Türkler*, 2. Baskı, Hemen Kitap Yayınları, İstanbul 2010, r. 81

Şoreşa Eba Muslimê Xorasanî li Endulus, Rojavayê Efrîqayê, Misir, Yêmen, Hîcaz, Filistîn û Sûriyeyê, bû sedemê guherînên mezin ên sîyasî û civakî. Her wisa jî Kurdistan ji nû ve vejand. Li dû vê guherînê li seranserê welatê Kurdan zêdetirî sed mîrektî ava bûn. Li her derê vê erdnîgariyê qela, birc, pire, qesr, qonax, hisn, hîsar, îstihkam, sûr, medrese, mizgeft, xan, hemam û hwd. hatin ava kirin. Evana li erdnîgariya fireh a ku ji Baltiqê heta Behra Reş û ji Araratê bigre heta Sûriye û Filistînê dirêj dibe, roja îro jî mewcûd in. Gelê Kurd li buhur û gêdûkên asê û çiyayên bala û berz, bûne parêzvanê vê erdnîgariyê, bi saya birc û qelayên bêhed û hesab ku li dîharê zinarên bilind çêkirine, ji êrîşên Moxol, Tatar, Tirk û Turkmenan ên di sedsala 13an de ji Moxolîstanê destpê kirye, xwe parastine û vê lehî û îstîlayê bi bihayekî herî erzan ji ser xwe def kirin.⁴²

Di serê destpêka musulmaniyê pê de netewê Kurd bi piranî di welatê xwe de desthilatdarî û serektiya xwe kirine. Heya dema şahê Îranê ne nû hatine, evan jî bi hinek mercan ve di cara yekem de tifaq çêkirine û paşê Kurdan dîsa war û welatê xwe bi tevahî hildane binê hêza xwe. Eva dilxwastina van şahan jî ji bo wan pêk nehatiye. Lewma suûd û keysa wan şahan ji bo wan nebûye yar û bûye neyar.⁴³

Hukumdar û desthilatdarên Kurdistanê yê ku eşîr û qebailêd di wan hêzdar in, bi navên eşîrên xwe ve têne naskirin. Wek mînak: Hekkarî, Sohran, Baban, Erdelan û hwd. Heçî hukumdarên xwedî qela û bajarên navdar in, bi navên wan qela û bajarên ve têne zikirkin. Wek Hîzan, Cizîr, Bidlîs û hwd. Sultan û hukumdarên mezin çav bernedane welatê Kurdan. Her çend hin hukumdaran çav berdabine Kurdistanê û qesta îstila û îşxala Kurdistanê kiribin jî rastî gelek zor û zehmetiyên giran hatine û dawîya dawîn bi poşmanî paşve vegeyriyane û vê axê dîsa radestî xwediyên wan kirine. Wek mînak: Gurgîstan, Şekî, Taliş, Şêrwan, Gêlan, Rustemdar, Mazenderan, Esterabad û herêmên li bakûrê Îranê û rexê Kurdistanê.⁴⁴

Desthilatdariya sîyasî ya Kurd-Musulmaniyê ya li herêmê di sedsalên 12-13an de qewîntir û berfirehtir bû. Di vê serdemê de mîrekiyên Kurd ên wek Mukus, Hekkarî, Bidlîs, Hîzan, Cizîr, Heskêf, Îmadiye, Bazîd derdiketin pêş. Van

⁴²Özer, h.b., r. 80.

⁴³Varlı, b.n, r. 99.

⁴⁴Şerfhan Bitlisi, *ŞerefnameKürt Tarihi*, Cild: 1, Wergera Ji Farisî: Abdullah Yegin, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014, Çapa Duyem, r. 67-68.

desthilatdariyên Kurd pêşî li bajarên xwe yê paytext pergala xwe ya sîyasî û rêvebirî bi cîh kirin. Bi dirêjahiya demê re van bajar û paytextan di çanda Kurdî de ekola xwe afirandin û bûn bajarên xwedî tore û tradîsyon ên dîrokî.⁴⁵ Her wisa bûn xwedî tecrubeyeke desthilatdariyê ya bi îstiqrar û dewamdar. Wek mînak “Şerefxanan” di Bedlîs û herama wê de di navbera salên 1203-1856an ê mîladî de nêzikî heft esran hakîmiyeta xwe berdewam kirine.⁴⁶

Li ser zemanê Ebbasiyan û ji ber zalbûna hindê kes û malbatên ne Erebi, sîstema hukmê merkezî yan merkezîyet di hukmî de sist bû. Di encam de hindê mîrnişîn di dewletê de, belkî hindê caran bi destê dewletê bi xwe, çêbûn. Mezinên van mîrnişînan pirtir caran ji xelkên wan deveran bûn yê ew mîrnişîn lê hatîne damezrandin; ji malbatên maqûlên wan bûn. Ev malbatên xanedan dibûne mîr û hakim û nedihatine guhartin. Hukm û hukumraniya van nîvdewletan ji hêla xelîfeyên dewleta Ebbasî ve jî dihate naskirin. Li welatê Kurdan jî hindê ji van mîrnişîn hebûn. Xanedanên Kurd ên hukumdar pêşî dewletên mezin ên wek Hesnewî, Merwanî Dostikî, împaratoriya Eyyûbî ava kirin. Tiştê berçav di van dewletan hemiyan de, li vê qonaxa dîrokî, ew bû ku zimanê Kurdî her çende zimanê malbatên hakimî bû û zimanê wan ê axiftinê bû jî, belê ew nebûbû zimanê dewletê yê resmî. Zimanê resmî Erebi bû. Piştî peydabûna van dewlet û mîrnişînan li deverên cuda cuda yê Kurdistanê bizava ilmî û rewşenbîrî û edebî zêde xurt bû û hijmareka mezin a navên zana û edîban li Kurdistanê peyda bûn. Vana berhemên xwe yê ilmî û edebî danabû. Piştî nemana dewleta Ebbasiyan, serdema dewlet û mîrnişînan destpê diket. Di vê serdemê de tu dewletên merkezî nemabûn. Li her cihekî dewletek yan mîrnişînek hebû û hukmê dikir. Li Kurdistanê jî berî hatina Osmaniyan belkî nêzikî pêncî mîrnişînan hebûne. Her yek li cihê xwe serxwe bû.⁴⁷ Piştî êrişên Safewiyên Îranî yê li Kurdistanê, bi rêberiya zanayê navdar Mewlana Îdrîsê Bidlîsî di navbera

⁴⁵Sinan Hakan, *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2002, r. 8

⁴⁶ Abdullah Demir, “16. Yüzyılda Sâfevî ve Osmanlı Hâkimiyetinde Arşiv Belgeleri Işığında Bitlis Beyleri”, *I. Uluslararası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, Beyan Yayınları, Ankara, 2008., r. 253,285; Veysel Gürhan, “İdris-i Bitlisi ve Bölgenin Osmanlılar Tarafından Fethi”, *I. Uluslararası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, Beyan Yayınları, Ankara, 2008., r. 285,297.

⁴⁷ Tehsîn İbrahîm Doskî, “Mîrên Kurd yê Şair û Rolê Wan Di Pêşvebirina Edebiyata Kurdî de”, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013, r. 670

dewlet û mîrnişînên Kurd de îttifaq pêk hat.⁴⁸ Wihareng nexşeya sîyasî ya Kurdistanê li ser erdî gelek nehate guhertin. Ew mîr û hukumdarên Kurd li ser textê hukumdariyê ya berî hingê dîsa hukumferma bûn. Rolê van mîr û hukumdarên Kurd di pêşvebirina edebiyat û rewşenbîriya Kurdî de pir zêde bû. Van rêvebiran him dezgehên xwendin û perwerdehiyê çêkirin û him jî xwedî l izana û edîban derketin. Bi rêka van saziyan rêjeya nexwendevaniyê kêmtir lê hat. Hijmara zanayan ber bi zêdebûnê ve çû. Zimanê Kurdî jî digel Erebi û Farisî di van saziyên perwerdehiyê de dihate xwendin. Jixwe şerha dersan her ji serî de Kurdî bû.⁴⁹

Piştî îttifaqa di navbera dewleta Osmanî û Mîrên Kurdan de rewşeke aram çêbû li welatê Kurdan. Lê ev rewş carcaran xerab dibû. Lewra sîyaseta dewleta Osmanî zêde sadiqê wê îttifaqê nebû. Bi rêya waliyên xwe yên li herêmê êrîş birine ser Mîrekiyên Kurd ên wek Bidlîs, Amêdiye, Baban, Soran, Sîncar û hwd. Wihareng hêz û tifaqa mîrekiyên Kurd zeîf dikir û erd û erdnîgariya wan berê ve teng dikir. Digel van yekan mîrekiyên Kurd ên wek Hekkarî, Cizîr, Mukus, Hîzan, Behdînan û hwd. berxwe dan û hebûna xwe parastin û berdewam kirin.⁵⁰ Piştî sîyaseta hukmê merkezîyet a Sultan Mehmûdê II. a di sala 1808-1846an de dewleta Osmanî êrîş bir ser mîrekiyên Kurd. Di encama şer û pevçûnên dûr û dirêj mîrekiyên Kurd ji holê hatin rakirin.⁵¹

Rewa xirabe ya welatê Kurdan a piştî mîrekiyan di gelek belge û pirtûkên de hatiye nivîsîn. Di vê derbarê de çavdêrî û teswîreke rind a herêmê ya piştî hilweşîna mîrekiyan, Albay Chermiside kosolosê Îngilîzê ê Wanê yê salên dawiya sedsala 19an, dike û dibêje ku di hengama gera min a li Kurdistanê ez tenê rastî du Kurdan hatim ku di karê îdareya hukumeta Osmanî de dixebitîn. Cihê heyf û xebînetê ye ku Tirk ji hêla sîyasî de îhtimameke baş nîşanî Kurdan nadin. Hale hale ev însanên hêzdar û şervan in. Di serdema mîrekiyên xwe de li gelek herêmên xwe medreseyên

⁴⁸ Şakir Epözdemir, *1514 Amasya Antlaşması Osmanlı - Kürt İttifakı ve Mevlana İdris-i Bitlisi*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2005, r. 95.

⁴⁹ Doskî, b.n., r. 672.

⁵⁰ Beg, b.n., r. 193-200.

⁵¹ Cemal Ülke, "Osmanlı Ariv Belgelerinde Kürdistan Eyaleti ve Kürdistan Eyaletinin Kuruluşu", *Kimlik, Kültür ve Deîim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyum*, Bingöl Üniversitesi Yayınlar, Bingöl 2013, r. 152.

wan, mizgeftên wan, mektebên wan, pireyên wan û hwd. hebûn. Ev nîşaneyên medeniyeta wan, îro bes di rewşeke hilweiyayî û xerabe de dixuyên.⁵²

2. NÊRÎNEKE GIŞTÎ LI ÇANDA KURDAN

2.1. Çanda Kurdan ya Beriya Îslamê

Destnîşankirina destpêka çand û edebiyata Kurdî pir zor e. Di derbarê van nirxên Kurdî yên beriya Îslamê de agahî pir û pir kêr in. Vê gavê nayê zanîn ku şer û pevçûnên dûr û dirêj ên li herêma Kurdan qewimîne, ka bûne sedemê windabûna çiqas metnên edebî û hebûnên çandî. Ev herêm dergûşa gelek şaristanî û çandên nivîskî yên dêrîn e.⁵³

Lê rêça çanda Kurdan a beriya Îslamê em bêhtir li ser şopên kevir, kelha, dêrhe, stel û şeftan dibînin.⁵⁴ Li Kurdistanê gelek kefe, nîşan û nimûne hene ku bermayiyên vê çanda qedîm in. Lê ji ber ku dem û dewraneke gelek dûr û dirêj ji ser re derbas bûye, ne kifşe ye ka çiqasê wê yên Kurdan e û çiqasê wê yên gelên cînar in. Lêbelê Kurd û erdnîgariya wan- ha pir, ha hindik- xwedî û hevpar in ji vê çanda qedîm re ku li ser niştimanê wan derketiye holê.⁵⁵

Erdnîgariya ku Kurd lê dijîn erdnîgariyeke wisa ne ku bi ihtimaleke mezin şoreşa axê cara pêşîn li vê erdnîgariyê çêbûye. Ev şoreş ji bûye binaxe ji çêbûna gel, bajar, dewlet, zenaet, bazirganî, edebiyat, huner û çandê re. Li gor arkeologan herêma Kurd ji dewrana Paleolîtîk a Navîn vir ve bûye war û wargeh ji mirovahiyê re. Ev dewran rastî serdema pêşîn a dewrana dawîn a cemedê ya li Ewrûpa tê. Wek mînak; nimûneyên çanda qedîm ên ku li şikeftên Kujûndjî, Şanîdar, Hezarmerd, yên bi hezaran sal berê yên serdema Paleolîtîk a dawîn in. Abîdeya dîrokî ya herî girîng a vê serdemê Şikefta Bîsitûn e. Civatên mirovan ê vê serdemê li gelek navendên

⁵²Büyük Britanya Devlet Belgeleri, Türkiye, 42, 1890, s. 20. (Yê ku neqil dika: Şerif Mardin, *Bediüzzaman Said Nursi Olayı, Modern Türkiye’de Din ve Toplumsal Değişim*, İletişim Yayınları, İstanbul 1995, r. 85)

⁵³ Philip Kreyenbroek- Christine Allison *Kürt Kimliği ve Kültürü*, Avesta Yayınları, İstanbul 2003, r. 40.

⁵⁴ Nevzat Eminoglu, “Çand û Edebiyata Kurdî Di Serdema Mîrekiya Hekariyê de”, *Uluslararası Tarihte Hakkari Sempozyumu*, 2. Cilt, Hakkari Üniversitesi Yayınları, Ankara 2016, r. 345.

⁵⁵ Zeki Beg, b.n., r. 73.

Zagrosê jiyana xwe berdewam kirine. Wihareng çanda Bradost, nimûneyên li zinarên nêzî Kermaşan, çanda Zarzî ya li Zagrosan berdewamiya çanda vê serdemê ne.⁵⁶

Di sala hezar a yekem a berî zayînê de li Medyayê bêguman nivîs hebû. Herf ji awayekî cuda yê nivîsa mixî pêk dihatin. Li dorhêla Gola Urmiyeyê jî nivîsa hîyeroglîf dihat bikaranîn. Edebiyata Kurdî ya berî Îslamê şumûlê lîteratûra nivîskî û ya devkî ye. Ji destpêkê heta hatina Îslamê çî belge, tekst û nivîstekên Kurdî hebin, dê bikevin vê çarçoveyê. Bêguman bidestxistina nimûne, belge û metnên Kurdî ji serdema berî Îslamê gelek girîng e. Lewra ev wesîqe ji hêla ziman, şêwe û anîna ziman ve, dê bikevin nav mijarên lêkolînên edebî jî. Bêguman tişteki pir normal e ku ji serdema beriya Îslamê pir hindik qeyd û nivîs bigihêjin roja me ya îroyîn. Ev ji bo hemû zimanan jî wisa ne.⁵⁷

Alfabeya ku cara pêşîn wek a Kurdan qala wê hatiye kirin, alfabeya Masîsoratî ye. Ev alfabe wek alfabeya Kurdan ketiye lîteraturê û ji bo nivîs û edebiyatê bûye bingeh.⁵⁸ Her çiqas qala berhemên ku bi vê alfabeyê hatine nivîsîn hene; lêbelê ev behrem heta niha derneketine holê û nehatine dîtinê.⁵⁹ Em van melûmatên han ji berhema bi navê “Şewqul Musteham Fî marîfetî Rumûzul-Eqlam” hîn dibin. Ev behem jî di sala 856ên Mîladî de ji aliyê alimekî Keldanî yê bi navê Îbnî Wahşiyya ve û di dewra Emewiyên Endulusî de hatiye nivîsîn û hatiye pêşkêşkirin ji sultanê wê demê re. Ev zimanzanê han behsa sih pirtûkên Kurdî dike û dibêje ku Kurdan bi alfabeyeke xweser ev behrem nivîsîne.⁶⁰ Lê ev pirtûkên han heta niha hê nehatine dîtinê.⁶¹

Heçî çand û edebiyata Kurdî ya devkî ye, em tê de bêhtir û bi hêsantir nimûyên çand û edebiyata beriya Îslamê dibînin. Lewra çand û edebiyata Kurdiya bi vî rengî li ser zimanên nifşan û bi veguhestina devkî gihîstiye heta roja me ya îroyîn. Wek mînak; destana Rustemê Zal a navdar ku nimûneyeke edebiyata Kurdî ya devkî

⁵⁶ J. Kurdo, *Kürt Kültürünün Kaynakları ve Uygarlıklar Beşiği Kürdistan*, Weşanên Özgür Gelecek, Ankara 1992, r. 10

⁵⁷ Adak, b.n., r. 109.

⁵⁸ Ebdullah Memê Memed Hoko Varlî, *Dîroka Dugelên Kurdan*, Derpêç 1, Weşanên Sîpan, Stenbol 1997, r. 7- 59.

⁵⁹ Kadri Yıldırım, “Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni”, *Kürt Tarihi Dergisi*, Hejmar: 5, r. 24-29.

⁶⁰ Muhammed Ronî El Meranî, “Bilinen En Eskî Küret Alfabeti”, *Kürt Tarihi Dergisi*, Hejmar: 5. r. 57.

⁶¹ Nevzat Eminoglu, “Pirsgirêkên Zimanî Di Nûçegîhaniya Kurdî de”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Sal: 1, Cild: 1, Hejmar: 1, r.166.

ye, ji hêla dîrokê de jî bûyereke beriya Îslamê ye. Wekî din Destana Mem û Zînê ku ji Memê Alan hatiye wergirtin, Destana Zembilfiroş û hwd. her çiqas di serdema piştî Îslamê de hatibin nivîsîn jî destpêka versiyonên van destanan ên devkî, digihêjin beriya Îslamê. Lewra naveroka versiyonên van destanan ên devkî gelek nimûneyên ji çand û edebiyata Kurdî ya beriya Îslamê nîşan didin.⁶²

2.2. Çanda Kurdan ya Piştî Îslamê

Nimûneyên çand û edebiyata Kurdiya nivîskî yên ku di destê me de ne, yên piştî serdema Îslamê ne. Bi gotineke din, çand û edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê bi awayêkî nivîskî jî hatiye ber destê me. Çanda Kurdî ji sedsalên 7. û 8. bigre heta sedsalên 10. û 12. dewra xwe ya zêrîn jiya.⁶³

Kurd di serdema xelifetiya Hz. Umer de Îslamiyetê dipejirînin. Di salên 1637-50yê mîladî de bi musulmanbûna bajarê Dîyarbekrê re piraniya Kurdan êdî dibin peyrewê vî dînê nû. Kurdan piştî ku dînê Îslam pejirandin, di jiyana wan a civakî û sîyasî de guherîn çêdibe.⁶⁴ Her wisa di çand û edebiyata wan de jî pêşketineke nû pêk tê. Sedemekî vê pêşketinê ev bû ku dînê Îslamê bi referansê xwe yê bingehîn, yanî bi zarê Quranê digot “Bixwîne”. Ev emir û teşwîq, bûn sebeb ku saziyên xwendin, zanîn û perwerdehiyê çê bibin di nav civatên musulman de. Wihareng dezgehên ilm û xwendinê yên wek “suffa”, “kuttabi”, “darul hîkmet”, “kitabxane”, “rasatxane”, “zanîngeh” û “medrese” li dû hev saz bûn û zêde bûn. Kurd jî wek qewmekî mensûbê vî dînî ji vê geşedanê behremend bûn⁶⁵

Desthilatdariya Kurdan a di van sedsalên destpêkê yên dewra Îslamê de, binaxeya sazî û dezgehên çandî, perwedehî, bawerî û edebî pêk hat. Di vê serdema aktîf a tarîxa Kurd de, piştî dewra hilweşînê ya sê sed salî ya ku di bin rêvebiriyên merkezî yên Sasaniyên Îranî û Împaratoriya Bîzansê de derbasbûyî, di sedsalên 7an û 9an de hêza wan (Kurd) a ku ji nû ve şînbûyî û hakimiyeta wan a di siyasetê de, mohra xwe lê dixê. Ev pêşketin di navberên sedsalên 10an û 12an de derdikeve asta

⁶²Mehmet Sait Çakar, Fehim Işık Sami Tan, Esra Sadikoğlu, Ronayi Önen, Mehmet Mehmetoğlu, *Ortaöretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Tarih Vakf r. 58.

⁶³Izady, b.n., r. 97

⁶⁴Beg, b.n., r. 125-130

⁶⁵Nevzat Eminoğlu, “Medreseyên Kurdan Ji Destpêkê Heta Îro”, *AnemonMuş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 3. Cilt, 2. Sayı, Aralık 2015, r. 147.

herî bilind û bi awayekî heqdar wek “Sedsalên Îslamê yên Kurd” dihate bi navkirin. Hakimiyeta Kurdan a siyasî bi saya koçberîya zêde û fethên eskerî, ji Asya Navîn heta Lîbya û Yemenê dirêj dibû. Kurdan herêmên ku wek dil û qelbê Rojhilata Navîn in, ji îşxalkeran- mesela ji yên wek Xaçparêzan- diparastin û her wisa çanda Kurd jî demên xwe yên zêrîn jiya. Kurd di seranserê vê serdemê de û di warê felsefe, mûzîk, mûzikolojî, matamatîk, muhendisî, mîmarî û astronomiyê de bibûne pispor. Di nav pêştatirên Kurd ên di vê serdemê de dîrokzanên wek Ebu’l Fîda, Îbnî Athîr, Îbnî Şedad û Îbnî Kutayba; filozofên wek Suhrewerdî û Aynel Qudat ul Hemedanî; seyyahên wek Îbnî Fadlan; mûzîkologên wek Seyfeddîn Êrmewî û Muhemed Îbnî Katîb; mûzisyenên wek Îbrahîm, Îshaq Mawsîlî û Zeriyab; mîmar û muhendisên wek Mûnîs; matematîkzan û astronotên wek Muhyeddîn Xelatî; bîyografîstên wek Îbnî Xelqan; ansîklopedîstên wek Îbnî Nedîm; şoreşgerên dînî û cdivakî yên wek Babek û Narseh⁶⁶

Nimûneyên nivîskî yên çand û edebiyata Kurdî yên piştî Îslamê ku dest me de ne, yên vê serdemê ne. Di serê vê serdemê de gelek sultan û melîkên Kurd li herêmên xwe dewlet ava kirin. Her wisa jî li xwedî edîb û zanyaran derketin. Van edîb û zanyaran jî nimûneyên nivîskî yên pêşîn ên çand û edebiyata Kurdî nîşan dan. Ev serdem di maweyeke dirêj a qasî 14 qernî de, li erdnîgariyeke fireh û li seranserê welatê Kurdan xwe nîşan dide. Xaleke dî ya girîng ew e ku di vê sedemê de edebiyata Kurdî ne bi diyalektekê tenê, bi çend dîyalektan hatiye nivîsîn.⁶⁷

Ev nimûneyên nivîskî yên pêşîn bi Kurdiya Goranî bûn. Lewra li van herêmên ku ev desthilatdariyên Kurd lê ava bibûn, Kurdên Goran dijiyan û bi zaravayê Kurdî yê Goranî qise dikirin û dinivîsîn. Di serê sedsalên 10. û 11. de edîb û zanyarên Kurdînivîs ên Goran ên wek Baba Tahirê Uryan, Mela Perîşan, Baba Sirincê Kelatî, Dayê Tewrêzê Hewramî û hwd. gihîştin.⁶⁸ Wihareng di serê serdema Îslamê ya dewra sultanên Kurd de çand û edebiyata Kurdî ya nivîskî bi Kurdî ya Goranî hate holê û geş bû. Lê di serê serdema mîrektiyan de zaravayê Goranî hêdî hêdî cihê xwe da zaravayê Kurmancî. Bi zaravayê Kurmancî edebiyata Kurdî ya klasîk a berî Îslamê numûneyên xwe yên bijarte nîşan da. Zaravayê Kurmanciya Jêr

⁶⁶Izady, b.n., r. 97-107

⁶⁷ Adak, b.n., r. 114.

⁶⁸ Sağniç, b.n., r. 68

ku wek Soranî jî tê zanîn, di serdema nûjen da pêş ket û kete pêşiya hemû zaravayên Kurdî. Di dawiya serdema klasîk û sedema modern de zaravayê Dimilî / Kurdkî ku wek Zazakî jî tê zanîn nimûneyên nivîskî dide.

Bêguman sazîyeke girîngtirîn ku bûye bingeh ji çand û edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê re, medrese ne. Medreseyên ku hatine çêkirin bi hêla avahî, mîmarî û hunerê ve, nimûneyên çanda maddî ya Kurdî nîşan didin. Lewra li gelek herêmên Kurd ku ekolên xwe yê çandî û edebî pêk anîne, hê jî ev medrese bi hemû ihtîşam û berxwedariya xwe li ser piyan e. Ji hêla din ve jî ev sazî, bûne çavkaniya çanda nivîskî di nav Kurdan de.

2.3.Çanda Kurdan di Serdema Mîrektiyan de

Ev serdem her çiqas serdemeke zêrîn e ji bo Kurdan, lê her wisa jî dewreke sergirtî û pînhan e ji hêla dîroka Kurd û xasma ji hêla dîroka edebiyata Kurdî ve. Ger lêkolîner, dîrokzan, xasma edebiyatnasên pispor û dilsoz li ser vê babeta girîng hûr û kûr bibin, dê binaxeya gelek nîrx û cewherên me derkevin holê û gelek şop û rêçên şêlû û muşewweş dê zelal bibin, eyan û beyan bin. Lewra ev serdem, xasma sedema mîrektiyan destpêkek e. Destpêk û bingeha çand, edebiyat û nasnameyekê ye.

Taybendmendiya pêşîn a çand û edebiyata Kurdî ya serdema mîrektiyan ew e ku berhemên çand û edebiyata Kurdî ya bi zaravayên Kurmancî cara pêşîn di vê serdemê de tînin nivîsandin û belav dibin. Her wisa tema, terz û cureyên di çand û edebiyata Kurdî ya di vê serdemê de bi tema, terz û cureyên çand û edebiyata gelên cînar ên musulman ên wek Tirk, Ereb û Faris re hevpar in. Hêla ruxsarî û naverokê de heman taybendmendiya nîşan didin. Jixwe form, term, awa û usûlên edebiyata klasîk a di nav gelên musulman de xwediyê taybendmendiya hevpar in. Pîrî caran tenê di hêla ziman de ji hevûdu vediqetin.

Çavkaniyeke herî girîng a çand û edebiyata Kurdî medreseyên mîran e di serdema mîrektiyan de. Ev medrese li bajar û serbajarên mîrektiyên Kurd ên wek Bidlîs, Hîzan, Cizîr, Hekkarî, Amediye, Mukus, Bazîd, Şêrwan, Heskêf û hwd. hatine avakirin. Her wisa wek taybendmendiyeke rewşa edebiyata vê serdemê, di navbera edebiyatnasên Kurd û mîr û hukumdarên Kurd de sîstema patronajê

derketiye holê. ⁶⁹ Em nimûneyen vê pergalê çawa li mîrektiya Cizîrê, Miksê, Bazîdê, Hekariyê û hwd. dibînin, li mîrehtiya Hîzanê jî nimûneyên vê sîstemê hene.⁷⁰

3.MEDRESEYÊN KURDAN

Medrese wek peyveke Erebi tê maneya “cih û warê dersê”, “cihê hînbûn û hînkirinê”. Di dîroka Îslamê de avahiyên ku cara pêşîn erka perwerdehiyê pêk anîne “suffe” yên dema Hz. Muhemmed û “darul ulûm /malên ilmê” yên serdema xelîfeyan e. Di vê serdemê de mescîd jî cihê ders û perwerdehiyê bûn. Mescîdê ku ji bo nimêj û îbadetê dihatin avakirin bo dersê jî dihatin bikaranîn. Di vê serdema pêşîn de digel mescîdan “xan” jî hebûn ku tê de perwerdehî dihat kirin. Van “xan” ên han pîrî caran li rex mecdîdan xizmet kirine. Ev pêvajoyê pêşî wek “mescîd” destpê dîke, paşê wek “mescîd-xan” berdewam dîke û paşê jî bi “medrese”yan digihêje encamê⁷¹. Medrese di serdema Emewî û Ebbasiyan de bi vî navê çêbûn û wek saziyên perwerdehiyê li piraniya erdnigariya ku musulman lê dijîn belav bûn. Ji wan kesên ku di van saziyan de ders didan re dihat gotin “muderris”. “Muderris” peyveke bi Erebi ye ku maneya wê “yê ku ders dide” ye.⁷² Kurdan jî bo mamosteyên medreseyan digotin “Seyda”. “Seyda” jî di Kurdî de tê maneya “dersdar”, “mamosteyê mezin”, “yê ku dersê dide”.⁷³

Sedemên ku medreseyan wek saziyeke perwerdehiyê derxistine holê gelek in. Bi gotineke din gelek armancên avabûna medreseyan hene. Ji van sedemanan ên ku derdikevin pêş, sê - çar heb in. Ji van sedeman jê yek ev e ku ders û perwerdehî êdî li mizgeftan hilnedihat. Lewma hewcedarî bi avahiyên serbixwe yên wek “medrese”yan çêbû. Sedemê din ew bû ku rewac û hîndekariya mezhebekî fiqhê pêk

⁶⁹ Adak, b.n., r. 230

⁷⁰ Ayhan Geverî, *Yûsuf û Zuleyxa Selîmiyê Hîzanî Edîsyon-Kîtîk û Amadekar*, Weşanxaneyê Nûbihar, Stenbol 2013, r. 48

⁷¹ George Makdîsi, *The Rise Colleges Institutions of Learning in Islam and The West*, Edinburgh University Press, Edinburgh 1981, r. 27; George Makdîsi, *Îslam'ın Klasik Çağında ve Hristiyan Batı'da Beşeri İlimler*, Werger: Hasan Tuncay Başoğlu, Weşanên Klasik, Stenbol 2009, r. 285.

⁷² İhsan Süreyya Sırma, *Müslümanlarda Eğitim Tarihi Süreci İçerisinde Medreseler*, Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler, Cild: 1, Zanîngeha Mûş Alparslanê, Mûş 2013, r. 56

⁷³ Zeynelabidîn Zinar, *Medresa Kurdî-Xwendina Medresê*, Weşanên Pencînar, Stocholm 1993, r. 38.

bînin.⁷⁴ Her wisa armaneke din a sazkirina medreseyan ew bû ku li hemberî bandora mezhebê Şîîtiyê wek navendên parastina mezhebên sunnî perwerdehiyê pêk bîne.⁷⁵

Di ramana dînî ya gelên musulman de rola medreseyan diyarde ye. Lewra her gelê ku bûne musulman mezhebê xwe yê fiqhî û eqîdewî û her wiha şîrove û awayê baweriya xwe ya dînî ji van saziyan hîn bûne. Her wisa ev saziyên perwerdehiyê bûne sedem ku di nav her netewekî musulman de çandêke taybet a hevpar û zimanekî perwerdehiyê yê standart jî pêk bê. Gelê Kurd jî piştî ku bûn musulman wek saziyeke sereke ya perwerdehiyê ji medreseyan sûd wergirtin. Van medreyên han bandora xwe li ser bawerî, çand û zimanê Kurdî nîşan da. Di nav Kurdan de çandêke hevpar a wek xîm û bingeha netewetiyê pêk hat. Wuhareng li seranserê erdnîgariya Kurdan yekawatiya baweriyê çêbû. “Mezhebê Eşarî” ku mezhebekî Îslamê yê eqîdewî ye û “mezhebê Şaffî” ku mezhebekî Îslamê yê fiqhî/emelî ye, wek mezhebên Kurdan ên sereke û fermî rengê xwe dan jiyana wan a kesayetî û civakî.⁷⁶ Her wisa berhemên edebiyata Kurdiya klasîk ji van saziyan derketin holê. Ast û qaliteya van berhemên Kurdî ne kêmtirê berhemên klasîk ên cînarên wan ên wek Tirk, Faris û Ereban in.⁷⁷ Zimanê Kurdî standardizasyona xwe û bikaranîna xwe ya yekawayî ya li seranserê Kurdistanê bi saya van saziyan bi dest xist. Her wiha bingeha zimanê nivîskî yê Kurdî û perwerdehiya zimanê zikmakî ya di Kurdî de jî ev medrese ne.⁷⁸

⁷⁴ Şakir Gözütok, “Medreselerin Ortaya Çıkışı ve İlk Medreseler”, *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler*, Cild: 1, Zanîngeha Mûş Alparslanê, Mûş 2013, r. 200

⁷⁵ Bernard Lewis, *The Arabs in History*, Oxford University Press, Oxford 1993, p.163; (YÊ ku neqil dike: Yahya Akyüz, *Türk Eğitim Tarihi*, Weşanên Ankara Üniversitesi Eğitim Fakültesi, Ankara 1989, r. 53.)

⁷⁶ Şerefhanê Bidlîsî, *Dîroka Kurd*, Weşanên Deng, Stenbol 2010, r. 20

⁷⁷ Melayê Cizîrî, *Dîwan*, (Wergera Ji Kurdî: Osman Tunç), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012, r. 10

⁷⁸ *Kürt Dilini Tanıyalım* Kürt Enstitüsü, r. 7. www.kurtenstitusu.com, (dîroka xwegihînê: 06.02. 2014)

3.1. Medreseyên Kurdan û Serdemên Wan

“Medreseyên Kurdan” ji hêla çand, mezheb, etnîsîte, ziman û erdnîgariyê ve standardekî nîşan didin û bi pêvajoya dîrokê re bi vî navî ketine lîteraturê. Medreseyên Kurdan, wek serdema sultanen, mîran û şêxan, bi sê qonaxên dirokî re derbas bûne û gihîştine heta roja me ya îroyîn. Di serdema pêşîn de bûne xwediyê erdnîgariya xwe ya herî fireh. Bêhtir li bajarên mezin ên alema Îslamê û li bajarên Kurdan ava bûne û ji aliyê hukumdar û sultanên Kurdan ve hatine çêkirin. Li navendên wek Dînewer, Hemedan, Şam, Heleb, Erbil, Qahîre, Cizîr, Meyafarqîn, Ruha, Mêrdîn û hwd. hatine sazîkirin. Di serdema mîrektîyan de erdnîgariya medreseyên Kurdan teng bûye û tenê xasê bi erdnîgariya Kurdan maye. Bi piranî li bajarên Kurdan ên wek Bidlîs, Hekkarî, Bazîd, Hîzan, Heskêf, Mukus, Amediye, Çemîşkezek, Şêrwan û hwd. ava bûne. Di vê serdema duduyan de medrese, bûne çavkaniya berhemên edebiyata Kurdiya klasîk. Pirtûkên Kurdî jî li medresan wek pirtûkên dersê/rêzê hatine xwendin. Her wisa bo Kurdan, bûne ceribîneke girîng ji perwerdehiya zimanê zikmakî re û xwedî roleke dîrokî ne bo pêkhatina çandê hevpar di nav Kurdan de. Her wisa hevpariyek çandî, edebî û dînî jî çêbûye bi alema Îslamê re. Di serdema sisêyan de medrese ji finansorî û patronaja hukumdar û mîran bêpar û mehrûm mane. Rengînî û zengîniya dersan kêmbûne û tenê dersên dînî û fiqhî mane di mufredata medreseyan de. Lê medreseyên vê serdemê li dervayê erdnîgariya Kurdan jî belav bûne bi saya xelîfeyên şêxên terîqetê. Li navendên wek Endonezya, Şam, Stenbol, Konya, Bexdad û hwd. jî ava bûne. Di vê pêvajoyê de medreseyan derfetên xwenûhkirinê nedîtine. Di vê serdemê de medrese ji bajarên zêdetir li gundan ava bûne.

3.2. Destpêka Medreseyên Kurdan

Di salên 18an ên Hîcrî / 637-645 ên Mîladî de tîkiliya musulmanên Ereb û Kurdan çêdibe. Her çiqas hin caran di navbera wan de şer û pevçûn çêdibin jî lê bi awayekî gelemperî û bi piranî gelê Kurd dîne Îslamê bi dilxwazî dipejirîne. Sedemê bingehîn ê pejirandina Kurdan a vî dîne nû ev bû ku prensîbên vî dînî li gor qereker

û kesayetiya Kurdan bû. Bi muslumanbûna wan re jî saziyên perwerdehiyê di nav wan de geş bûn.⁷⁹

Destpêka medreseyên Kurdan dighêje salên 979 ên Mîladî. Herêma Kurdên Hesenweyhiyan de gelek cîh û warên dersê tîr çêkirin ji aliyê desthilatdarên Kurdan ve. Nasirûdewle Ebû Necm Bedr B. Hesenweyh B. Huseyîn El Kurdî di sala 369 ê Hicrî de piştî wefata bavê xwe li Hemedan û wilayetên derdorên wê nêzî sê hezar “mescîd” û “xan” ên wek fêrgeh, daye çêkirinê.⁸⁰

Kurd, piştî sêsed salên xerabûn û pelçiqandinê yê di bin desthilatdariya Sasaniyên Îranî û Împaratoriya Bîzansî de derbasbûyî, di navbera sedsalên 7an û 9an (mîladî) de, hêza wan (Kurdan) a siyasî ya ji nû ve şînbûyî, mohra xwe li serdemê dixê. Ev heyama ku di sedsalên 10an û 12an de dertê asta herî bilind, bi awakî heqdar, wek “Sedsalên Îslamê yê Kurd” tîr binavkirin. Hakimiya Kurdan a siyasî, bi saya fethên leşkerî û koçberiyê, ji Asya Navîn bigre heta Libya û Yemenê dirêj dibû. Kurdan him dewlet û xanedan ava kirin û herêmên navendî yê Rojhilata Navîn parastin, him jî çanda Kurdî demên xwe yê zêrîn jiya. Kurd di pêvajoya van hemû deman de, di warê felsefe, muzîk, muzikolojî, mîmarî, muhendîsî, matematîk û astronomiyê de, bûne pispor. Di nav pêşatirên Kurd ên wê demê de, dirokzanên wek Ebul Fîda, Îbnî Esîr, Îbnî Şeddad û Îbnî Quteybe; filozofên wek Suhrewerdî, Ayn el-Qudat Hemedanî; muzîkologên wek Seyfeddîn Êrmewî û Muhammed Îbnî Katib Erbîlî; muzîsyenên wek Îbrahîm û Îshaq Mawsîlî û Zeryab; mîmar û muhendîsên wek Munîs; matematîkzan û astrologê wek Muhyeddîn Axlatî; biyografîstên wek Îbnî Xalîqan, ensîklopedîstên wek Îbnî Nedîm; şoreşgerên civakî û dînî yê wek Babek û Narseh, meriv dikare wek mînak bêje.⁸¹

Gava em qala “Medreseyên Kurdan” dikin, qesta me ew medrese ne ku li ciyên Kurd lê dijîn ava bûne û yan jî Kurd çûne li derekî dinê çêkirine. Ev erdnîgarî jî navenda Rojhilata navîn e ku ji Azerbeycanê heta Şamê û ji Anatolya Navîn bigre heta nivê Îran û Îraqê digre nav xwe. “Medreseyên Kurdan, wek saziyeke kar û xebatên zanyarî û exlaqî, tenê ne li herêma rojhilata Tirkiyeyê, bîlakîs li hemû

⁷⁹ Muhammed Emin Beg *Dîroka Kurd û Kurdistanê / Kürtler ve Kürdistan Tarihi*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012, r. 123

⁸⁰ Gözütok, b.n., r. 56

⁸¹ Izady, b.n., r. 97.

erdnîgariya ku Kurd bi piranî lê dijîn, perwerdehiyê didin. Ev erdnîgariya han, ji van beşan pêk tê: Rojhilat û rajhilata başûrê Tirkîyeyê, herêmên bakûrê Îraqê, herêmên li rojavayên Îranê, herêmên bakûrê Sûriyê digre nav xwe.”⁸² Ev medreseyên han xwediyê hin taybendmendiyan in ku bi navê “Medreseyên Kurdan”⁸³ hatin naskirin.⁸⁴

Zimanê perwerdehiyê yên Medreseyên Kurdan bi Kurdî ye. Ders bi zimanê Kurdî tê dayîn. Pirtûkên dersê/rêzê yên medreseyan her çendî di destpêkê de hemû bi Erebi bûn. Lê hey ku çû yanî ji serdema medreseyên sulatanan ber bi serdema medreseyên Mîran hat, zanayên Kurd pirtûkên dersê yên bi Kurdî jî nivîsîn. Pirtûkên Erebi jî bi şîroveya Kurdî dihatin dayîn. Wuhareng ev saziyên perwerdehiyê bûbûn devera bicihanîna tore, tevger û rêveçûna Kurdayetiyê jî. Lewra di wan de toreya kurdî, ji wergirtinê bigir û hemû edetên kurdî dihatin pêkanîn, kesayetîya nijadî derdixistin holê û mirovatîyê didane diyarkirin.⁸⁵ Her wiha ev sazî ji asta dibistana seretayî bigre heta asta zanîngehê mînak û model e ji bo ceribîna dîrokî ya perwerdehiya zimanê zikmakî bo Kurdan. Ne tenê Kurd, her wisa gelên cînar yên wek Tirk, Erebi, Çerkez, Laz û yên mayîn jî ji van saziyên perwerdehiyê ders digirtin. Serdema dawîn a van saziyên han, digel hin hewldanên reformê, bi rengê serdema dawîn gihîştine heta îro.

Medreseyên Kurdan, li gor serdema ku hatine sazîkirin û li gor avakarên wan, meriv dikare veqetîne bi sê beşan: Medreseyên sultanî, Medreseyên Mîran û Medreseyên şêxan.

3.3. Medreseyên Sultanî

Hukumdarên ku di sedsalên pêşîn ên Îslamê de rêvebirî dikirin pêşî li alim û zanayan vedikirin. Her wiha ew teşwîq dikirin û li wan xwedî derdiketin; cîh û mekan ji wan re çêdikirin. Medreseyên pêşîn awha çêbûn. “Herêma Kurdan, di

⁸² M. Halil Çiçek, *Serencama Medreseyên Rojhilatê / Şark Medreselerinin Serencamı*, Weşanên Beyan, Stenbol 2009, r. 27.

⁸³ İhsan Süreyya Sırma, “Müslümanlarda Eğitim Tarihi Süreci İçerisinde Medreseler”, *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler*, Cild: 1, Zanîngeha Mûş Alparslanê, Mûş 2013, r. 58.

⁸⁴ Mela Ebdullah Telli, *Nêrînek Li Ser Medresên Kurdan*, Hejmara Taybet a Li Ser *MedreseyênKurdan*, Nûbihar, Hejmar: 63/64, r. 5.

⁸⁵ Zeynelabidîn Zinar, *Medresa Kurdî - Xwendina Medresê*, Weşanên Pencînar, Stocholm 1993, r. 11.

serdema Hz. Umer de û teqrîben di navbera salên 14-30 ê Hîcrî de bûye musulman û wihareng bi raxbeta ilmê, tehsîla ilmê jî dest pêkiriye û cîh û warên dersê ku jê re medrese tê gotinê, vebûne. Lewma li gor tesbîta Mamosteyê Unîversîteya Bexdayê Dr. Nacî Marûf, hê beriya Medreseyên Nîzamiyeyê yên Selçûkiyan, sî û sê medrese hebûne ku tê de alim û muderrîsên mezin gihîştine.⁸⁶ Ji lêkolînan tê fêmkirin ku derdora salên 250 yê Hîcrî, medreseyên serbixwe ku li dervayê mizgeftan, hatine çêkirin.⁸⁷ Nacî Maruf her wiha dibêje ku van medreseyan sed û şêst û pênc sal beriya Medreseyên Nîzamiyeyê (459ê Hîcrî) dest bi xebatê kirine û li Xorasan û Maweraunnehîrê medrese hatine avakirinê.⁸⁸

Ev medreseyên han, bi hatina Îslamê re, li gelek herêmên Kurdistan hatine avakirin. Dîne nû yê ku Hz. Muhemmed teblîx dikir û li ser nas û esasên Quranê geş dibû, atmosfereke nû bi xwe re anîbû. Bi saya wê atmosferê, zanîn û zanyarî, mizgeft û medrese, îmar û îskan, bûbûn metaên herî merxûb. Armanc û xayeyên dewlet û hukumdarên pêşîn, ev cewher û nirxên han bûn. Zanayên wek Ebû Hanîfe Dînewerî, herî zêde deyndarê wan êkolên ilmî ne ku di wan şeş sedsalên zêrîn ên pêşîn ên şaristaniya Îslamê de pêk hatine. Di dem û dewraneke wiha de ku ji bo dewlet û rêvebirên dewletan, tiştên sedemê rûmet û pesnê, ne ku şer û polîtîka bûn; bîlakîs medrese, pirtûkxane, rasatxane, nexweşxane û laboratuwar bûn. Meriv bi hêsanî li her derê rastî mutefekkîr, zanyar, nivîskar, bestevan û mîmarên meqbûlên alemê û yên wek wan, dihat.⁸⁹

Ev medreseyên ku sultanên çêdikir, tê de tenê ne dersên dînî, bîlakîs dersên teknîkî û felsefî jî dihatin dayîn. Skala cihêrengiya dersan, pir fireh bû.⁹⁰ Lê hey ku çû, ev rengîni û zengîni kêmbû. Yanî gava ji sultanên berjêrî rêvebirîya mîran bû û ji

⁸⁶ Nacî Maruf, *Medarisu Qable Nizamiye*, Metbeet ul- Mecme il-Îlmî el Îraqî, 1393/1973, r.3; (Yê ku neqil dike: M. Halil Çiçek, *Şark Medreselerinin Serencamı*, Weşanên Beyan, Stenbol, r. 37.)

⁸⁷ M. Halil Çiçek, *Yakin Dönemde Cizre Yöresi Medreseleri*, Hz. Nuh'tan günümüze Cizre Sempozyomu, Stenbol 1999, r. 126.

⁸⁸ Maruf, b.n., r.8; (Yê ku neqil dike: Çiçek, b.n., r. 37.)

⁸⁹ Ebû Henîfe Dînewerî, *Dîroka Îslamê / İslam Tarihi*, (Pêşgotina Wergêr) Weşanxaneya Hivda, 2007 Stenbol, r.16.

⁹⁰ Şakir Epözdemir, *Medreseyên Kurdistanê*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015, r. 10.

mîran jî hate serdema medreseyên şêxan, ev çihêrengiya dersan teng bû. Heta vê sedsalaa dawî, tenê dersên dînî man.⁹¹

Di serê dîroka Îslamê de her gel û herêm bi zimanê gelê xwe dersên Medreseyan digirtin. Hin lêkolînerên wek Zeynelabidîn Zinar dibêjin ku Selaheddîn Eyyûbî emir kiriye ku li herêma Kurdistan, bila bi zimanê Kurdî ders bê dayîn.⁹² Dibe ku li pêşerojê belgeyên nû bi dest kevin û rastiya van jî derkevin holê. Lê ev mijar hewceyê lêkolînên berfireh e. Ji ber ku di maiyeta van sultanên Kurd de, tenê Kurd tunebûn û civata ku îdare dikirin kozmopolît bû û hetta hin ji van dewletanan împarator bûn, lewma dibe ku digel zimanê Kurdî, zimanê Erebi jî wek zimanê dewletê yê hevpar, di perwerdeyê de hatibe bikaranîn.

Medreseyên sultan bi giranî li herêmên wek Dînewer, Hemedan, Sirmac, Hulwan, Erbil, Salmas, Meraxe, Urmiye, Tebrîz, Şehrezor, Ruha, Şam, Heleb, Qahîre û hwd. hatine avakirin.⁹³

3.4.Dawiya Medreseyên Sultan

Meriv dikare dîroka dawî lêhatina Medreseyên Sultan, wek dîroka 1461ê ya hilweşîna Eyyûbiyên Hesenkêfê ku mumessîlên Eyyûbiyan ên herî dawî ne, destnîşan bike. Lewra di vê dîrokê de, nûnerên Eyyubîyan ên dawî jî ketin bin desthilatdariya Aqqoyûniyan. Her wiha Aqqoyûniyan di serê salên 1400 -1402 yan de jî Diyarbekir hildabûn bin destê xwe. Wihareng di Kurdistan de, dawî li silsileya hukumdar û sultanên mezin ên alemgiştî hat. Bi vî hawî ew xizmet û xebata mezin a bi saya medreseyan a ji bo zanîn û hikmetê, sist bû û paşket. M. R. Îzady ji bo vê serdema han dibêje ku: “Ev serdema dîrokê ya piştî sultan, serdemeke wisa ye ku Kurd, muhtemelen xêncî edebiyatê, bi hemû hêlên jiyana xwe ya netewî ve paş man û şûnve çûn. Her wiha piraniya vî milletî di pêvajoya 250 salê di navbera 1500 û 1750 î de marûzê koçberî û îskana li herêmên dûr a bi darê zorê, man. Civata Kurdistan a enerjîk û jêhatî ku di serê vê serdema ku me qal kir de, di ast û dereceke baş û

⁹¹ Müfit Yüksel, “Kürt Medreselerini Din Eğitimi Merkezli Olarak Islah ve Geliştirme imkanı ve Bunun Toplumsal Barışa Katkısı”, *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler*, Cild: 2, Zanîngeha Mûş Alparslanê, Mûş 2013, r. 195.

⁹² Zeynelabidîn Zinar, *Pêvajoya Medresa Kurdî*, Semînera Li Komeleya Nûbiharê ya Diyarbekir ê 30/03/2013. (Gotara Çapnebûyî)

⁹³ Epözdemir, b.n., r. 11.

maqûl de bûn, di dawiya vê serdemê de gerîn civateke ji civatên herî paşketî û hevdayetî yê rojhilata navîn.”⁹⁴ Alim û zanayê girîng ê ehlê van medreseyan Kurdan, Bediuzzaman Seîdê Kurdî yê Nûrsî jî di pirtûkeke xwe de ku di sala 1909 an de nivîsiye, derheq vê serdema dîroka Kurd de awaha dibêje: “Ey Gelî Kurdên şêremêr û leşkerên pêşdar û qehreman ên dema cîhangîriya Asûrî û Keyaniyan! Bes! Ev xewa we ya *pênc sed salî*. Êdî hişyar bin! Sibe ye. Eger na, weşet û xeflet, dê we di çola hovtî û weşetê de talan bike.”⁹⁵ Li gor tesbîta Nûrsî, destpêka xewa Kurdan a *pênc sed sale*, rastî salên 1400 î tê. Gelo li gor Nûrsî kîjan sedem, kîjan derb û derizîn û şikestek, bûye sedemê vê xewa Kurdan? Qasî ku tê xuyanê li gorî Bediuzzaman jî dawiya medreseyan Kurdan ên serdema sultanen, destpêka xew û paşveçûna Kurdan e.

Dîrokzanê navdar Mîhrdad Îzady van herdû xalan wek sedemê vê paşketinê nîşan dide: 1) Şer û tekoşîna herdû hêzên super ên wê demê yê Împaratoriya Pers û Osmanî ku welatê Kurdan nav dest û piyê wan de mabû. 2) Vasco da Gama 1497 an de ji ber ku rêvederyaya Efrîqaya Başûr (Pozê/Çimê Hêviyê) keşif kir, rêya hevirmûş (îpek yolu) ku nav welatê Kurdan re derbas dibû, betal bû û ekonomiya Kurdan xerab bû û paşket.”⁹⁶ Ev herdû xalên ku Îzady destnîşan dîke ji bo sedemên xew û nexweşiya Kurdan, dervayê/xarîc, îşaret dîkin. Lê Nûrsî, îşaretî hundir dîke û wek sedem, Kurdan bixwe rave dîke. Sedemê nexweşiyê çî hundurîn û çî jî derveyî be, her du rewşên jî îşaretî eynî serdema dîrokî dîkin ji bo destpêka xew û paşketina Kurdan. Ew serdem jî salên 1400-1500î ne ku rastî dawiya serdema medreseyan sultanen tê. Piştî serdema medreseyan sultanen, serdema medreseyan mîran û piştî serdema medreseyan mîran jî serdema medreseyan şêxan ku serdema herî dawî ye, destpê dîke. Piştî vê serdemê sisêyan, dawî li serdemên merdeseyên Kurdan tê.⁹⁷ Em ê di mijara “Rewşa çand û edebiyata Kurdî ya di serdema mîrekiya Hîzanê de” li ser “Medreseyan mîran û şêxan” bisekinin.

⁹⁴M. R. Îzady, *Kurd /Kürtler*, Weşanên Doz, Stenbol 2007, r. 111 .

⁹⁵ Bediuzzaman Said Nursi, *İçtimai Dersler, Divan-i Harb-i Örfi*, Hatime, Weşanên Zehra, Stenbol 2005, r. 188.

⁹⁶Îzady b.n., r. 112.

⁹⁷Nevzat Eminoğlu, “Medreseyan Kurdan Ji Destpêkê Heta Îro”, *AnemonMuş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 3. Cilt, 2. Sayı, Aralık 2015, r. 210.

3.5. Medreseyên Mîran

Ev medrese li mîrgehan û bi hêla mîran ve hatine avakirin. Her wiha ji ber ku dîroka wan bêtir nêzî dema îro ye, agahiyên me yê derheq wan de zêdetir in. Ji medreseyên ku mîran çêkirine jê hinek heta roja me ya îro jî li ser piya mane. Mesela Medreseya Sor a Cizîra Botan, Medreseya Mîr Hesênê Welî ya li Muksê, Medreseyên Mîrên Bidlîsê û hwd.

Medreseyên mîran medreseyên şaristaniyê bûn. Ew medrese kulliye bûn, zankoyên zemanê xwe bûn. Mîrekên Kurdistanê ji bona ku burokrat, teknokrat, serdar, dîplomat, dîroknas, stêrnas, bînasaz, muhendis, hekîm, qazî, muftî, hunermend, zana, alim, mela, xetîb, miezîn, wezîr, kizîr û ronakbîran bigihîniye navendên bajaran, bi rengêkî şaristanî û li gor demê bi hemî ilmên zanistî yê hemdem digel welatîyên xwe perwerde dikirin. Ji xwe hemî welatên Îslamê jî weha dikir û bi vî rengî perwerde dibûn.⁹⁸

Di sedsala XIIIan de piştî êrîşên Moxolan li ser cîhana Îslamê, bi taybetî jî li ser paytexta dewleta Ebbasiyan, dawî li dewleta Ebbasiyan hat û bi vî awayî di cîhana Îslamê de serdemeke nû destpê kir. Di vî navberê de hukumetên Kurd ên ku di nîvê serdema Ebbasiyan de ava bûbûn jî temenê xwe tijî kiribûn. Piştî dawîhatina van hukumetên Kurdan serdeme nû destpê kir. Ev serdema nû ji bo Kurdan serdema mîrekiyan e. Mîrekiyên herî girîng ên Kurdan û bi taybetî yê Kurmancan piştî êrîşên Moxolan hatin avakirin û heta bi nîvê sedsala XIXan li ser pîyan man. Ev serdem ji bo edebiyata Kurdiya Kurmancî serdemeke zêrîn e û her wisa jî bo medreseyên Kurdan jî girîng e. Lewra qasî ku em dizanin hemû berhemên klasîk ên Kurdiya Kurmancî yê di destê me de ne, di vî serdemê de hatine dayîn. Di destpêka vî serdemê de cara pêşî li cihên wekî Hekarî, Cizîr, Amêdiye û Erdelanê û piştî wan jî li cihên wekî Bidlîsê, Bazîdê, Hîzanê, Miksê, Şêrwanê û hin cihên din mîrekiyên Kurdan ava bûn.⁹⁹

⁹⁸ Şakir Epözdemir, *Medreseyên Kurdistanê*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015, r. 29.

⁹⁹ Adak, b.n., r. 162

3.6. Dawiya Medreseyan Mîran

Dewleta Osmanî dema Mehmûdê II. de terka îdareya “ademê merkezîyet”ê kir û dest bi sîstema navendîpariziyê/merkezî kir. Yavûz Sultan Selîm bi navê Peymana Amasyayê di sala 1514 han de bi Kurdan re îttifaqek çêkiribû.¹⁰⁰ Mehmûdê II. ew îttifaq xerab kir û heq û huqûqê Mîrnîşînên Kurd bi awayekî yekalî /keyfî binpê kir. Sedemê bingehîn ê bûyerên di navbera dewleta Osmanî û Mîrekiyên Kurd de ku di serê sedsala 19an de qewimî, ji ber sîstema navendîparêziya ku bi Mehmûdê II. destpê kiriye, derketiye holê.¹⁰¹ Guherîna denge/dewranê ya piştî desthilatdariyên dewletên Ewrûpî yê mêtînger ên li ser erdnîgarîya Osmanî û xasma li ser rojhilata navîn, polîtîkaya Dewleta Osmanî ya Kurd guherî. Her wiha ew îttifaqa dîrokî ji holê rabû.¹⁰²

Dewleta Osmanî wihareng di salên 1834î de êrîş bire ser hemû Mîrekên Kurdan û piştî şer û qîtalên dûr û dirêj 1846î de mîrekiyên Kurdan ji holê rabûn. Bi hilweşîna mîrekiyan re medreseyan mîran jî êdî bêxwedî man. Medreseyan mayî jî hêza wan kêm bû. Li gora *Şerefnameyê* û çavkaniyên kevn di zemanê mîran de perwerdehî fermî ye û terîqetên ku bi ilmê tesewwufê ve mijûl in, ne xwediyê medrese û mekteban in. Navbera salên 1811-27an de Terîqeta Neqşebendîtiya Xalidiye ji Şerezora başûrê Kurdistanê destpê dike û li seranserê welatê Kurdan pêş dikeve. Piştî ji holê rabûna Mîrekiyên Kurdan, mela û şêxên mensûbên vê terîqetê medreseyan Kurdan didomînin.¹⁰³

3.7. Pêvajoya Piştî Medreseyan Mîran

Medreseyan şêx û melayan Kurdan, esas serdema sultan û mîran de jî hene. Sultan û mîran bêtir li bajaran û li qezayên mezin medreseyan mazbût û mezin çêdikirin. Lê şêx û melayan jî digel wan, medrese bi piranî li gundan ava kirine. Medreseyan şêxan, pêşî medreseyan Qadiriyan bûn. Lewra Şêx Ebdulqadirê

¹⁰⁰ Şakir Epözdemir, *Osmanlı - Kürt İttifakı ve Mevlana İdris-i Bitlisi*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2005, r. 95.

¹⁰¹ Mesut Yeğen, *Devlet Söyleminde Kürt Sorunu*, Weşanên İletişim, Stenbol 1999, r.58-68.

¹⁰² Sinan Hakan, *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2002, r. 32.

¹⁰³ Şakir Epözdemir, *Medreseyan Kurdistanê*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015, r. 95

Gêylaniyê ku terîqa Qadirî dabû destpêkirin, ji herêma Gêylanê ye. Gêylan jî li bakûrê Îranê ye. Ji ber vê yekê, terîqa Qadirî çawa ku derket, yanî ji salên 1000 û 1100 î bigre heta salên 1850 iyan li hemû ciyên ku Kurd lê dijyan, hakim bû. Lê dîsa jî qasî medreseyên sultan û mîran, bandora wan tunebû. Lewra piraniya medreseyan bi finansoriya hukumdar û mîran û bi awayekî fermî çêdibûn û dihatin meşandin. Îcar piştî dawîlêhatina medreseyên sultan û mîran, tenê medreseyên şêx û meleyan man. Ji ber ku otorîteya mîrên Kurdan ji holê rabûbû, pirî caran van şêxan ji valahiya otorîteya sîyasî, dest davêtin îdareya herêmê jî. Her şêxekî Neqşebendî xwe daye dora bajarekî mîran. Van şêxên han bi taybetî gundan wek qerargeha xwe bikaranîne û li van deran bi cih bûne. Xasma li gund û navçeyên wek Nehr, Şemzînan, Barzan, Tax, Seydava, Palo, Qolhîsar, Norşîn, Oxîn, Zoqeyd, Xerzan, Xizna, Hawêl, Fêrsaf, Ristaq, Erbo, Girdikan. Erbinê, Dodan, Werqanis, Bişêrî, Farqîn, Misirc, Hezzo û hwd.¹⁰⁴

Mewlana Xalidê Bexdadî yê Şehrezorî ku ji Hîndîstanê terîqa Nexşebendî anî, rewaca Nexşebendetiye kete pêşiya Qadirîtiyê. Xelîfeyên şêxên Nexşebendîtiyê, him mela bûn û him jî alim bûn.¹⁰⁵ Lewma bêtir ketin rewacê. Piştî ku dewleta Osmanî di nivê sedsala 19an de otonomiya mîrên Kurdan rakir û ew ji holê rakirin, rêvebiriya siyasî û civakiya li herêmê, vala ma. Waliyên merkezî yên Osmanî jî nekarîbûn vê valahiyê tijî bikin. Şêx û xelîfeyên Neqşebendî, bi saya hêza dînî û ilmî, qismen vê valahiyê tijî kirin. Edetê medreseyên Kurdan e ku kîjan talibê ku tehsîla xwe biqedîne û bibe mela, îllam diçe gundekî û li wir medrese ava dike û wê xizmetê didomîne. Terîqa Neqşî, ji ber ku medreseya mela û seydayan û tekya şêx û xelîfeyan mezc kirin, li hemû welat hêz û belavbûneke mezin bidest xistin.¹⁰⁶

Her çiqas terîqa Neqşî jî alimekî Kurdê Suleymaniyeyî (Mewlana Xalid) ji Hîndîstanê anî nava Kurdan; lê xelîfeyên xwe şandin hemû alema Îslamê. Xasma li gelek navendên alema Îslamê dergah û tekya ava kirin. Li bajarên wek Stenbol,

¹⁰⁴Epözdemir, h.b., r. 98

¹⁰⁵Müfit Yüksel, *Kürdistan'da Değişim Süreci*, Weşanên Sor, Stenbol 1993, r. 83-92.

¹⁰⁶Yüksel, h.b., r. 54.

Bexdad, Şam, Qudûs, Mekke û Medîne û li welatên wek Pakîstan, Endonezya, Malezya, Hînd û hwd.¹⁰⁷

Li welatê Kurdan ji sala 1846an pê ve otorîteya herêmî winda bû. Osmanîyan mal û milkê mîran li eşîrên Koçer belav kir. Ew Kurdên mîr û mîrzade, arîstokrat û xanedan ku ji qonaxa eşîrtiyê derbas bibûn û ji destpêka Îslamê de hatibûn perwerdekirin, cihê xwe dan serdema medreseyan şêxan ku Kurdan navê vê serdemê danîne “zemanê eşîrtiyê”. Ew ilm û zanînen ku dema destpêka Îslamê, Hesenweyhî, Merwanî, Eyyûbî û Mirektiyan de li welatê musulman bilind bibû, Neqşîyan ew sazûman bi carekê rakirin û bi tenê ilmê fiqha Îslamê û çanda ehlê sunnet û cemaetê bi rengêkî sofîtiyê dane pêş. Ev serdema ku di navbera salên 1850-1925an de derkete holê, nekarîbû bersiv bide dem û dewrana xwe.¹⁰⁸

4. EDEBIYATA KURDAN

4.1. Nêrînek Giştî Li Edebiyata Kurdî

Ber û berhemên Edebiyata Kurdî ya devkî digihêjin serdema berî hatina Îslamê.¹⁰⁹ Lê heçî yê nivîskî ne, wek piraniya edebiyatên gelên rojhilata navîn, piştî serdema Îslamê hatine nivîsîn. Pêşî bi belavbûna bawerî û çanda Îslamê ya di nav Kurdan de, derdoreke zanyarî peyda bû û zanyar gihîştin. Paşê jî li ser vê bingehe edebiyateke Kurdî derkete holê.

Di vê serdema destpêka Îslamê de, xasma di dewra desthilatdariya Ebbasiyan de wek hukumatên Faris û Tirkî, hin hukumatên Kurdan jî çêbûn. Ev hukumatên Kurd ên wek Şeddadî, Merwanî, Hesenewî, Eyyûbî û hwd û herêmên wan, bûne warê çêbûna medreseyan û derketina alimên Kurd. Dû vê serdemê re di serdema mîrekiyên Kurd de jî nimûneyên edebiyata Kurdî, xasma edebiyata Kurdî ya Kurmancî çêbûn.¹¹⁰

¹⁰⁷ Martin Van Bruinessen, “Endonezya’da Kürt Uleması ve Endonezyalı Öğrenciler”, (Wergera Ji Îngîlîzî: Osman Tunç) *Bilgi ve Hikmet*, Payiz 1995, Hejmar: 12, r. 158.

¹⁰⁸ Epözdemir, b.n., r. 95

¹⁰⁹ Mehmet Öncü, *Çiroke Efsaneyî Yê Kurdan*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014, r. 15.

¹¹⁰ Abdurrahman Adak, “Tarîxa Perwerdeya Bi Kurdî Di Medreseyan Kurdan De” *Kovara DENG*, hejmar: 99, Ist. 2015, r. 53-60.

Di serê serdema Îslamî de pêşî bi zaravayên Kurdî yên Lorî û Goranî berhemên edebî hatine nivîsîn. Ev berhemên di sedsala XI. de hatine nivîsîn ên wek *Dubeytî* yên Baba Tahirê Uryan, destpêka edebiyata Kurdî yên nivîskî ne.¹¹¹

Piştî van nimûneyên pêşîn ên edebiyata Kurdî, berhemên bi zaravayê Kurmancî jî destpê dikin. Ev berhemên bi Kurdiya Kurmancî bêhtir li herêmên mîna Cizîr, Bidlîs, Hîzan, Hekkarî, Bazîd, Miks, Amediye û hwd. derketin holê.¹¹² Li van herêman bi saya sîstema patronajê ku hêmaneke sereke ye ji bo peydabûn û pêşketina şîr û edebiyata serdema klasîk, helbest û helbestvanan rewac dît. Her wiha li dor qesr û mîr û hukumdaran kojimeke alim û edîban peyda bû.¹¹³ Em vê rewşa hîmayeya şair û edîban ku pêşî di edebiyatên Ereb û Farisan de destpê kiriye û di sedsala XV. de di edebiyata Tirkan de jî dixuyê, di edebiyata Kurdî de jî di sedsala XVI. de derdikeve holê. Ev pergal jî wek hêmaneke geşedana edebiyata Kurdî ya serdema klasîk, bandoreke erênî anî pêk anî.¹¹⁴ Nimûneyên vê yekê li gelek herêm û navendên edebiyata Kurdî ya sedema klasîk li ber çavan dikeve. Ji xwe edebiyat Kurdî, xasma edebiyata Kurdî ya Kurmancî ya serdema mîrektiyan, li ser vê pergalê hêşîn bû û şax veda. Her wisa bi temirîna vê pergalê ya di dawiya serdema mîrektiyan de jî pêş ket û temirî.

4.2. Edebiyata Kurdî Di Serdema Mîrektiyan De

Piştî zeîfbûn û paşketina dewleta Ebbasiyan, hin xanedanên Kurd hukumetên serbixwe ava kirin. Wek mînak ên bi navê Hesenweyî, Merwanî, Eyyûbî û hwd. Çand û zimanê rêvebirên van dewletan her çiqas Kurdî bûn, lê zimanê van dewletan ên perwerde û fermî Erebî bûn. Zimanê nivîs û resmîyê yên dewletên ku Tirkan ava kiribûn jî yên di vê serdemê de Farişî yan jî Erebî bûn. Lêbelê bi hukumraniya van xanedanên Kurd ên dema van hukumetên Kurd de, çand û nasnameya Kurdî xurt bû û pêş ket. Her wisa, bû bingeh û zemînekî geşedanê ji bo peydabûna berhemên bi zimanê Kurdî. Ev zemîne munbît jî serdema Mîrektiyanê Kurd bû ku piştî van

¹¹¹Izady, b.n., r. 315.

¹¹²Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî-I*, Weşanên Roja Nû, Stockholm 1983, r. 39.

¹¹³Naim Atabağsoy, "Klasik Dönem Osmanlı Şiirinde Patronaj ve Şairin Üretim Süreci İlişkisine Bir Bakış", *Monograf Edebiyat Eleştiri Dergisi*, 2014, Hejmar: 1, r. 84.

¹¹⁴Ayhan Tek, "Li Dor Behsa Patronajê Mem û Zîna Ehmedê Xanî", *Mukaddime*, Hejmar: 3, r. 40.

hukumetan ava bûn. Yanî meriv dikare bêje ku ger ev pêşketin û belavbûna çand û nasnameya Kurd a di serdema van hukumetan de nebûya, belkî ew şaheserên edebiyata Kurdî ya di dema Mîrektiyên de peyda nedibûn.¹¹⁵

Di sedsala XIIIan de piştî êrişên Moxolan li ser cîhana Îslamê, bi taybetî jî li ser paytexta dewleta Ebbasiyan, dawî li dewleta Ebbasiyan hat û bi vî awayî di cîhana Îslamê de serdemeke nû destpê kir. Di vê navberê de hukumetên Kurd ên ku di nivê serdema Ebbasiyan de ava bûbûn jî temenê xwe tijî kiribûn. Ev serdema nû ji bo Kurdan serdema Mîrektiyên e. Mîrektiyên herî girîng ên Kurdan û bi taybetî yê Kurmancan piştî êrişên Moxolan hatin avakirin û heta bi nivê sedsala XIXan li ser pîyan man. Ev serdem ji bo edebiyata Kurdiya Kurmancî serdemeke zêrîn e. Lewra em dikarin bêjin hemû berhemên klasîk ên Kurdiya Kurmancî yê di destê me de ne, di vê serdemê de hatine dayîn. Di destpêka vê serdemê de cara pêşî li cihên wekî Hekarî, Cizîr, Amêdiye û Erdelanê û piştî wan jî li cihên wekî Bidlîsê, Bazîdê, Hîzanê, Miksê, Şêrwanê û hin cihên din mîrektiyên Kurdan ava bûn.¹¹⁶

Di sala 16. de dewleta Osmaniyan, bi alîkariya mîrên Kurd di şerê Çaldiranê de Sefewî tîk birin. Bi vê îtifaqa Kurd û Tirkan a piştî îtifaqa pêşîn ku Sultanê Selçûkî Alparslan di sedsala 11. de bi Kurdên Merwanî re kiribû, ji bo Kurdan serdemek nû destpê kir û mîrektiyên Kurdan desthilatdariya xwe bihêztir kirin.¹¹⁷ Her wiha saziyên wan ên sîyasî, dînî û perwerdehî ava bûn û geştir bûn. Di vê atmosfera rewşenbîrî de helbestvan perwerde bûn û di encamê de helbestên Kurdî derketin holê. Di vê serdemê de helbestvan li dora qesr û qonaxên mîran kom dibûn. Em dibînin gelek helbestvanên vê serdemê yê wekî Melayê Cizîrî, Elî Herîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Wedaî, Selîmiyê Hîzanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Harisê Bidlîsî û hwd. li dora mîran rabûne û bûne helbestvanên wan. Bi vî awayî sîstema patronajiyê / hîmayeyê jî derketiye meydanê di edebiyata Kurdî de. Di vê serdemê de ji bo geşbûna edebiyata Kurdî faktora herî girîng hebûna medreseyan bû. Em dikarin

¹¹⁵ Adak, Abdurrahman: *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013, r. 149.

¹¹⁶ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbihar, İstanbul 2013, r. 162

¹¹⁷ Ahmet Özer, *Beş Büyük Tarihi Kavşakta Kürtler ve Türkler*, Hemen Kitap Yayınları, İstanbul 2010, r. 132.

bêjin ku di her bajarekî mîrgeheke mîrekî Kurdan de gelek medrese jî hebûn. Piraniya van medreseyan di sedsalên XV û XVIan de hatine avakirin. Ev medrese bi mîmariya xwe û bi sîstema xwe, ne medreseyên kêr bûn. Hinek ji van medreseyan wekî Medreseya Qubehanê ya mîrektiya Amediyeyê û Medreseya Sor li mîrektiya Cizîra Botan, di asta medreseyên paytextên cîhana Îslamê yê wan deman bûn. Di van medreseyan de zimanê perwerdehiyê zimanê Kurdî bû. Vê yekê jî rê li ber derketina helbestên Kurdî vekir. Gelek helbestvan ji van medreseyan rabûn. Piraniya helbestvanên vê serdemê ji van medreseyan xwendibûn.¹¹⁸ Wihareng çand û edebiyata Kurdî ya di serdema mîrektiyan de jî li ser bingeha van medreseyan hêşîn bû û teşe girt. Edebiyata Kurdî li medreseyên girêdayî mizgeftan ên li gund û bajaran derketiye holê û li dîwan û dîwanxaneyên arîsrokrat û xanedanan eleqe û hîmaye dîtiye.¹¹⁹

¹¹⁸ Adak, b.n., r. 177

¹¹⁹ Amir Hassanpour, *Nationalism and Language in Kurdistan, 1918-1985*, Sanfrancisco, r. 52. (Yê neqldike: Philip Kreyenbroek- Christine Allison, *Kürt Kimliği ve Kültürü*, Avesta Yayınları, İstanbul 2003, r. 83.)

BEŞA DUYEM

DÎROK Û ERDNÎGARIYA HÎZANÊ

Bajarê Hîzanê bi der û dora xwe ve ji tixûbê xwe yê niha pir firehtir e. Erdnîgariya vê herêmê ji başûrê Gola Wanê bigre heta tixûbê Cizîra Botan dirêj dibe. Ev herêm gîhanekeke girîng e di navbera du hêzên emperyal ên serdema berî Îslamê de. Ji vana Pers- Part- Sasaniyên Îranî dikete hêla rojhilatê Hîzanê, Bîzansên Romî jî li hêla rojavayê wê dima. Ev herêm ji hêla hêşinayî, fêkî, dar û ber, çem û kaniyan ve gelek dewlemend e. Her wisa jî bi çiya û geliyên xwe yê asê û bilind ve ciyekî stratejîk e ji hêla xweparastinê ve.

Ksenophonê dîrokzan û fermandarê Yûnana kevn herêma Zagrosê ku dikeve başûrê Gola Wanê wek welatê Kardûkan nîşan dide.¹²⁰ Hîzan dikeve nav tixûbê vê herêmê. Bazil Nikitinê dîrokzanê Kurd dibêje ku ev herêm piştî wexta, di serdema dewleta Romayê de wek Moksena tê bi navkirin û wek eyaletekê tê avakirin. Navenda vê eyaletê bajarê Hîzanê ye ku li nêzî vî bajarî kelhayek heye ku mîmariya Romayê nîşan dide.¹²¹ Heman erdnîgarî ji hêla nivîskarên serdema Romayê ve jî wek Korduene yan Gordyene tê binavkirin. Ev erdnîgarî herêmeke wek dendika welatê Kurdan ê îroyîn e. Kordueneya ku di navbera sêgoşeya Pers, Ermenî û Romayê de tengijîbû, di navenda gelek hesabên polîtîk de hat heta hatina Îslamê.¹²²

Mîrekiya Hîzanê bigre bi çar aliyê xwe ve bi mîrekiyên Kurdan ên din ve cînar bû. Li aliyê wê yê bakûr û rojava, mîrekiya Bidlîsê hebû. Li aliyê wê yê başûr mîrekiya Cizîra Botan, li aliyê wê yê rojhilat mîrekiya Miksê cih digirt.¹²³

¹²⁰ Ksenophon, *Onbinlerin Dönüşü*, Sosyal Yayınları, İstanbul 1985, r. 111-113.

¹²¹ Bazil Nikitin, *Kürtler SosyolojikveTarihi İnceleme*, Deng Yayınları, İstanbul 1994, r. 24-26.

¹²² Driver, G. R. *The Name Kurdan Dits Philological Connexions*, JRAS, 1923, r. 400-401, (Yê ku neqil dike: Muhammed Yücel, “Antik Çağın İkiKudretli İmparatorluğu Arasında Sıkışmış Bir Ülke”, *Kürt Tarihi Dergisi*, Hejmar:16, r. 20.)

¹²³ Evliya Çelebi, *Seyahatname*, Yeni Şafak Gazetesi, İstanbul 2006, r. 404-412.

1. HÎZAN JI DESTPÊKÊ HETA HATINA ÎSLAMÊ

Navend û paytexta vê herêmê bajarê Hîzanê ye. Navê Hîzanê yê pêşîn Arart e. Ev nav muhtemelen ji Êrartûyan hatiye.¹²⁴ Paşê navê vî bajarî dibe Hîzan. Navê Hîzanê di çavkaniyên dîrokî de wek “Hîzan” yan jî “Seherxîzan” derbas dibe. Gelê herêmê jî bi piranî wek “Hîza” yan jî “Hîzan” bi lêv dike. Çavkaniyên dîrokî yên ku qala dîroka Hîzanê dikin pir hindik in. Çavkaniya sereke ya di vê derbarê de bêguman pirtûka dîroka Kurd a bi navê *Şerefname* ye ku ji hêla Mîr Şerfxanê Bidlîsî ve hatiye nivîsîn. Li gorî vî dîrokzanî Hîzan ji navê “Seherxîzan” hatiye kurtkirin. “Seherxîzan” yanî “ew kesên ku di seher û berbanga sibê de hişyar dibin û radibin”. Edetê Kurdan e ku ji bo rihetiya telafûzê, navan kurt dikin. Wek mînak ji “Îzzeddîn” re dibêjin “Ezo”, ji “Şemseddîn” re dibêjin “Şemo”, ji “Cimşîd” re dibêjin “Cimo”, ji “Ebdal” re dibêjin “Ebdo” û hwd. Lewma Kurdan ji navê “Seherhîzan”ê “seher” avêtine û gotine “Xîzan”.¹²⁵

Em hin caran di derbarê telafûz û nivîsîna navê “Hîzanê” de jî rastî îxtîlafan tên. Navê Hîzanê di metnên dîrokî û edebî yên klasîk û modern de bi gelemperî wek “Hîzan” derbas dibe. Yanî herfa serî ya “H” di metnên bi herfên Erebi de wek (ح) derbas dibe. Wek mînak; yek ji metnê herî kevn ê di destê me de ku navê Hîzanê tê de derbas dibe, pirtûka Ehmed Bîn Yûsuf Bîn Elî İbnî Erzaq El Farûqî ya bi navê *Tarîxu Meyafraqîn* e. Di vê pirtûka dîrokê de ku di sedsala 12ê Mîladî de hatiye nivîsîn, navê Hîzanê bi herfa H yê yanî wek (ح) derbas dibe.¹²⁶ Di metnê destxetê mesnewiya *Yûsuf û Xuleyxa* ya Selîmiyê Hîzanî de jî navê Hîzanê bi herfa H yê yanî wek (ح) hatiye nivîsîn.¹²⁷ Ehlê Hîzanê jî navê Hîzanê bi herfa H yê û hetta bi (H) ya zirav, yanî wek (ه) bilêv dike. Nivîskarê pirtûka *Dîroka Wêjeya Kurdî* Feqî Huseyn Sağniç jî ku bi eslê xwe ji Hîzanê ye, di pirtûka xwe de navê Hîzanê wek (H)

¹²⁴ Hasan Çiçek, "Hizan'ın Kültürel Zenginliğinin Arka Planı", *1. Uluslar arası Düinden BugüneTatvan ve ÇevresiSempozyumu Bildirileri*, Beyan Yayınları, İstanbul 2008, r. 663.

¹²⁵ Bidlîsî, b.n., r. 161.

¹²⁶ Ehmed Bîn Yûsuf Bîn Elî İbnî Erzaq Farûqî, *Tarîxû Meyafraqîn*, (Wergera ji Erebi: Yusuf Baluken) Weşanên Nûbiharê, Stenbol, r. 448

¹²⁷ Gevefî, b.n., r. 41.

nivîsiye.¹²⁸ Lê hem Feqî Huseyn Sağniç û hem jî Ayhan Geverî ji pirtûka Qanatê Kurdo û Aleksandir Jaba neqla vê beyta Selimiyê Hîzanî dikin a wek “Selfmê dil Suleyman im / Esîrê mîrê Xîzan im” û çawa ku tê xuyanê di vê beyta hatiye neqilkirin de navê Hîzanê wek “Xîzan” derbas dibe.¹²⁹ Di hin belgeyên bi Osmaniya Tirkî û maqaleyan de jî navê Hîzanê wek “Xîzan” yanî bi herfa (x / خ) yê derbas dibe.¹³⁰ Lê rewş çî dibe bila bibe, îro piraniya nivîsîn û telafûza navê Hîzanê wek “Hîzan” e li nav Kurdan.¹³¹ Madem Şerefxan wateya “Hîzan”ê wek “hişyarbûn û rabûn”ê daye, derdikeve holê ku di destpêkê de wek “Xîzan” hatiye bilêvkirin. Piştî wexta jî guheriye û bûye “Hîzan”.¹³²

Îro Hîzana ku jê re “nefsê Hîzan” yanî “Hîzan bi xwe” tê gotin û di dîrokê de wek bajarê serbajar/paytext xizmet kiriye ji mîreka Hîzanê re nêzî Xeydayê ye û êdî qasî gundekî ye. Li vî bajarê kewnê ku aniha xerabe ye sûreke dîrokî heye ku li ser qadeke mezin ava ye. Lewma ji vir re “Nava Sûrê” jî tê gotin.¹³³ Hîzan ji salên 2000an ên berî Mîladê ve bûye war û wargeh ji însanan re. Lewra di van tarîxan de ketiye bin desthilatdariya Hîtîtan. Li Hîzanê kelefeyên ji bermayeyên dîrokî yên ji salên 1400ê b. z. ku ji Asûriyan mane, hene. Ji kelefeyên sûr, xan û hemameke li gundê Kayalar (ev gund vê dawiyê li ser bermayeya Hîzana kevn ava bûye) tê fêmkirin ku Hîzan navendeke Asûriyan a girîng e. Hîzan piştî salên 1000î yên b. z. dikeve bin desthilatdariya Êrtartûyan û paşê jî dikeve bin hukumdariya Medan. Piştî Medan ev herêm digel derdora xwe ya fireh ket bin desthilatdariya Persan.¹³⁴ Niştecihbûna vê herêmê ya ku ji b.z. bi Hîtîtan destpê dike, bi desthilatdariya Med, Pers, Roma, Bîzans berdewam dike. Di serdema Îslamê de jî bi wasiteya Xelifeyên

¹²⁸ Sağniç, b.n., r.369., ; Kerem Soylu, *Dereleme Araştırma Deşifresyon, Mesail-i Mühimme-i Kürdistan (Kürdistan'ın Önemli Meseleri), Pêvek (Osmanlıca Orijinal Belgeler)* Belge No: 1236/18, Weşanên Enstîtuya Amedê, Diyarbakır 2010, r. 920.

¹²⁹ Sağniç, b.n., r. 449; Geverî, b.n., r. 43.

¹³⁰ Abdurrahman Adak, Hayrullah Acar, Yusuf Baluken, “Gora Feqiyê Teyran / Faqah Tayran’s Tomb”, *Kovara Nûbihar Akademî*, I/I, s. 2014, r. 109-118.

¹³¹ Abdülkadir Badıllı, *Bedüzzaman Said-i Nursî Mufassal Tarihçe-i Hayatı*, Timaş Yayınları, İstanbul 1990, r. 49.

¹³² Bitlisi, b.n., r. 253.

¹³³ Çiçek, b.n., r. 663-668.

¹³⁴ Ahmet Demir, *İslam'ın Anadolu'ya Gelişi*, Kent Yayınları, İstanbul 2008, r. 138.

Îslamê, Emewî, Ebbasî, Merwanî, Selçûkî, Eyyûbî û Osmaniyan kete bin desthilatdariya Ereb, Kurd û Tirkan.¹³⁵

Pêşiyên mîrekiyên Bidlîs û Hîzanê yên berî Îslamê, ji hemû binemal û xanedanên li wan deran kevntir in. Evana digihêjin serokne Şêrwan, Teberistan û Gîlanê. Hozên Rojikan jî digihêjne wan hozne ji rojhilata Îranê hatine li Xelat, Mûş, Bidlîs, Hezro û Hîzanê bi cih bûne.¹³⁶ Agahiyên nivîskarê dîroka Kurd ê pêşîn Şerefxanê Bidlîsî yên di derbarê avabûna Hîzanê de îbaretê bi hin texmîn û rîwayetên muxtelîf in. Li gorî gotinên Bidlîsî ji gotegotên devê ehlê vê herêmê tê fêmkirin ku avakarê vî bajarî Meraxayê Tebrîzê ye. Ya rast ew e ku avakarê vî bajarî kifşe nîne. Lê li gorî gotinan eslê hukumdarên Hîzanê ji nehya Bilêc/Bilîcan a li ser Xînuşê ne. Wisa tê fêmkirin ku bav û kalên van ên berê gava hatin hêla Bilîcanê merivne bi îtibvar bûn. Lewma mîyesserê bi destxistina Kelha Bilîcanê bûn. Paşê ji wan sê birayên jêhatî û serwext derketin. Navê wan Dil, Bil û Bilîc bûn. Evana ber bi aliyê Hîzanê ve çûn û ev wilayet bi destê zorê, bi şûr û şer xistin bin destê xwe û veqetandin bi sê beşan. Birayê mezin Hîzan hilda, yê navîn Mukus hilda û yê piçûk jî nehya Isbayerd hilda bin hukmê xwe.¹³⁷

Ji qeyd û agahiyên dîrokî jî derdikeve holê ku Hîzan ji dîroka qedîm vir de cih û warê desthilardariyê û kan û madena hukumdar û rêvebiran e. Li gor nivîskarê *Tarîxû Meyafarqîn* Îbnû Erzaq El Meyafarqînî, ew hukumdarên ku li Meyafarqînê yanî li Sîlvan / Silîva ya îroyîn ku navçeyeke dîrokî ya Dîyarbekrê ye, hezar kusûr sal berê dewleteke Kurd a bi navê Merwanî ava kirine, eslê wan ji Hîzanê ne û ji Hîzanê hatine wir. Avakarê vê dewletê Badê lawê Dostkî El Carboxtî /Harboxtî, Ebû Ebdullah Huseynê lawê Dostkî ye. Leqebê wî Bad e, ji çiyayên Bahesmî hatine û ev der jî li wilayeta Hîzanê ye. Warê wî li hêla Hîzan û Madenê ye. Pêşî Dîyarbekir hilda bin hukmê xwe û dewleta xwe mezin kir.¹³⁸

¹³⁵ Hasan Çiçek, "Hizan'ın Kültürel Zenginliğinin Arka Planı", *1. Uluslar arası Düünden BugüneTatvan ve ÇevresiSempozyumu Bildirileri*, Beyan Yayınları, İstanbul 2008, r. 663.; Ahmet Demir, "Tatvan'ın Bağlı Bulunduğu Bitlis ve Çevresinde Eyyubi Hakimiyeti", *1. Uluslar arası Düünden BugüneTatvan ve ÇevresiSempozyumu Bildirileri*, Beyan Yayınları, İstanbul 2008, r. 126.

¹³⁶ Ebdullahê Memê Mehmed Hoko Xanî Varlı, *Dîroka Dugelên Kurdan 600-1500*, Derpêç 1, Weşanên Sîpan, Stenbol 1997, r.266.

¹³⁷ Bitlisi, b.n., r. 253.

¹³⁸ Ehmed Bîn Yûsuf Bîn Elî İbnî Erzaq Farûqî, *Tarîxû Meyafarqîn*, (Wergera ji Erebî: Yusuf Baluken) Weşanên Nûbiharê, Stenbol, r. 448

2. HÎZAN JI DESTPÊKA ÎSLAMÊ HETA MÎREKTIYA HÎZANÊ

Li gor hin rîwayetên ku Şerefxanê Bidlîsî vediguhêze jî, bajarê Hîzanê yek ji wan bajar û beldeyan e ku di serdema Îslamê de hatine avakirin.¹³⁹ Lê ev gotegotên ku Bidlîsî di pirtûka xwe de neqil dike, qasî ku ji qeydên dîrokî tê xuyanê, dûrî rastiyê ne. Lewra çavkaniyên dîrokî yên din û kelefeyên ji dîroka beriya Îslamê û hetta ji beriya mîladê mane yên li Hîzana kevn ên wek sûr, pire û hwd. nîşan didin ku Hîzan û der û dora wê, beriya Îslamê jî bajarekî girîng û navendeke berbiçav e.¹⁴⁰ Lêbelê eger ev gotinên Şerefxan di maneya pêşketin û geşedana vî bajarî ya di serdema Îslamê de be, di cih de ye. Lewra ev bajar û der û dora wî di vê serdemê de bûye navenda xwendin, ilm û îrfanê. Xêncî heftheşt medreseyên mezin ku bi sedan telebe tê de dixwendin ên mîrî yên navenda serbajarê Hîzanê, bi dehan medreseyên li bajar û beldeyên din ên vê herêmê û heta li gundên der û dor, vê tespîtê îspat dikin.

Hîzan, Bitlîs û derdora wê p.z. di salên 395an de her çiqas bû qada şerê di navbera Sasanî û Romyê, lêbelê hêz û desthilardariya eslî di destê hukumdarên herêmî de bû.¹⁴¹ Herêma Hîzanê di tarîxa 640-411 de di serdema xelifetiyê Hz. Omer de bûye musulman.¹⁴² Îyaz Bîn Xenemê serfermandarê artêşa Îslamê ya Cezîreyê di vê tarîxê de Dîyarbekir, Bidlîs, Xelat fetih kir. Di vê fethê de sehabiyekî bi navê Şêx Muhemmed jî heyê. Şêx Muhemmed ji hêla Hz. Omer ve ji bo fetha Hîzanê hatiye wezîfedarkirin. Di wê serdemê de mîrekiya Hîzanê di destê Xrîstiyanan de bû. Şêx Muhemmed bi artêşa xwe Hîzanê fetih dike. Bi emrê Hz. Omer dibe waliyê Hîzanê û li ser navê sikke tîn çêkirin. Heft sal wezîfe dike û li wir wefat dike. Aniha qebra wî digel birayê wî Şêx Bahaeddîn û nozdeh ehlên mala wî di tîrbeyeke nav mezarîstana kevn a Sûra Hîzanê /Nefsê Hîzanê de ye.¹⁴³

¹³⁹ Bitlisi, b.n., r. 254.

¹⁴⁰ Hasan Çiçek, "Hizan'ın Kültürel Zenginliğinin Tarihsel Arka planı", *1. Uluslar arası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, Beyan Yayınları, İstanbul 2008, r. 661.

¹⁴¹ Vakîdî, *Futûhul Cezîre*, 219; Ahmet Demir, *İslam'ın Anadolu'ya Gelişi*, Weşanên Kent, Stenbol 2004, r. 141.

¹⁴² Beg, b.n., r. 126.

¹⁴³ Hîzan Kaymakamlığı, Kîtabeya li ser Turbeyê (10.03. 2016)

Ev herêm piştî serdema çar xelifeyan, heta salên 928an ê zayînî, di bin desthilatdariya Emmewî û Ebbasiyan de maye.¹⁴⁴ Li gorî qeydên dîrokî di vê serdemê de waliyên Emewî yên bi navê Mesleme b. Ebdulmelîk, El Cerrah, Seîd b. Amr El Cereşî, Mesleme El Cereşî, Muhammed b. Merwan li herêma Kurdistan, Azerbeycan û Ermeniyeyê rêveberî kirine. Di serdema Ebbasiyan de jî navên waliyên bi navê Ebu Cafer El Mensûr wek rêveberê vê herêmê derbas dibe. Harûn Reşîd jî beriya ku bibe Xelîfe, waliyê Kurdistan, Azerbeycan û wilayetên rojava bû. Ji xwe di vê heyamê de herêma Hîzanê beşeke ji vê erdnîgariyê bû.¹⁴⁵

Di dawiyê sedsala 10an de Hîzan, Bidlîs û der û dora wê dikeve bin desthilatdariya Merwaniyên Kurd ên musulman ku navenda wan Amîd û Meyafarqîn e.¹⁴⁶ Wuhareng Hîzan jî dikeve nav erdnîgariya dewleta Merwaniyên. Ji xwe avakarê vê dewletê Baz Bîn Dostik ji Hîzanê ne.¹⁴⁷ Ev xanedan ji aliyê Hîzanê tîn û pêşiyê herêma Ercîş û der û dora wê hildidine bin hukumraniya xwe, di sala 983an de herêma Dîyarbekirê hildide bin hukmê xwe û paşê jî Mûsulê dixin nav tixûbê dewleta xwe ya bi navê Merwanî. Di serdema Merwaniyên de gelek qebîle û şaxên eşîreta Humeydî /Xuytî yên Kurd li vê herêmê hatine bi cihkirin ji hêla Merwaniyên ve.¹⁴⁸ Piştî şerê Melazgirê Hîzan û herêma Hîzanê ji desthilatdariya Merwaniyên Kurd derdikeve û dikeve destê Selçûkiyên Tirk. Piştî demeke kin, hemû herêmên mîrektiyên Kurd digel herêma Hîzanê dikeve bin hukumraniya Dewleta Eyyûbiyên Kurd.¹⁴⁹

Di serê sedsala XV. de jî ev herêm dibe hedefa êrîşên dewleta Akkoyûniyan û paşê jî ya Safewiyan. Sîyaseya Sultanê Akkoyûniyan Êzûn Hesên ya li hemberî mîr û hukumdarên Kurdan pir dijwar û tund bû. Vî sultanî li erdnîgariya Kurdan di dewsa mîr û desthilatdarên Kurd de yên şîî û qizilbaş dianî ser text û di encama vê sîyasetê de gelek mîrektiyên Kurd hatin hilweşandin. Dewleta Safewî jî heman sîyaset

¹⁴⁴ İbnî Esîr, *El Kamîl Fîl Tarîx*, (wergêr: Abdülkerim Özeydîn), İstanbul 1987, C. VIII, r. 166.

¹⁴⁵ Beg, b.n., r. 127.

¹⁴⁶ İbnü'l Erzak, *Meyafarkin ve Amid Tarihi*, (*Mervani Kürtleri Tarihi*), Wergêr: M. Emin Bozarlan, İstanbul 1990, r. 38-57.

¹⁴⁷ Ehmed Bîn Yûsuf Bîn Elî İbnî Erzaq Farûqî, *Tarîxû Meyafarqîn*, (Wergera ji Erebi: Yusuf Baluken) Weşanên Nûbiharê, Stenbol, r. 448

¹⁴⁸ Mükrimin Halil Yinanç, Maddeya "Bitlis", *İslam Ansiklopedisi*, C. II, r. 662.

¹⁴⁹ Hizan Milli Eğitim Müdürlüğü, hizan.meb.gov.tr/tarihce.htm, (dîroka xwegihîne: 20.05.2015)

dimeşand. Mîrên mîrektiya Hîzanê bi awayekî gelemperî geh bi şer û geh bi dîplomasî, hukumdariya xwe dane berdewamkirin.¹⁵⁰

Di serê sedsala XVI. de têkiliya Osmanîyan a bi mîrekiyên Kurd û her wiha bi mîrektiya Hîzanê re li ser naskirina hukumraniya mîrên Kurd bû û di çarçoveya îttifaqa peymanî Amasyayê ya 1514î de bû. Lê her çiqas piştî sedsal û nîvekê û du sed sal ev sîyaseta Osmanî hatibe guherîn jî, dîsa jî mîrekiyên Kurdan digel mîrektiya Hîzanê, karibûn bibine serfiraz û sekeftiyê berdewmiya hukumdarî û hukumeta xwe heta nîvê sedslala XIX.¹⁵¹

Seyyahê navdar Evliya Çelebî di *Seyahatnameya* xwe de bi munasebeta rêwitiya xwe ya bi Wezîrê dewleta Osmanî Sedrêezem Melek Ahmet Paşa re ya ji Diyarbekirê ber bi Bidlîs û Wanê ve, navê Hîzan û mîrektiya Hîzanê zikir dike. Evliya Çelebî dibêje ku dema Wezîrê Osmanî digihêje Wanê, gelek mîr û hukumdarên mîrekiyên Kurdan ên wek Hekkarî, Mehmûdî, Hîzan, Bazîd û hwd. wî pêşwazî dikin û pê re hevdiştin pêk tînin. Li gor agahiyên Çelebî Melek Ahmed Paşa salekê piştî hatina xwe ya bi Wanê, bi bahaneyan êrîş dibe ser mîrektiya Bidlîsê. Çelebî di vê geştê de bi awayekî dûr û dirêj qala êrîşa artêşa Osmanî ya li mîrektiya Bidlîsê û hilweşandina wê dike. Di derbarê vî şerî de û di salên 1650yî de û di bin fermandariya sadrazam Melek Ahmet Paşa de çêdibe, agahiyên berfireh dide. Lêbelê qasî hûrgiliyên ku di derbarê mîrektiya Bidlîsê de dide, di derbarê mîrektiya Hîzanê de, nade. Tenê çend caran qala Hîzanê, mîrektiya Hîzanê û mîrê Hîzanê dike, lê navê wî nabêje. Wek mînak Çelebî gava Bidlîsê dide nasîn û hudûdê wê nîşan dide, dibêje ku wilayeta Bidlîsê dikeve bakûrê mîrektiya Hîzanê. Gava qala şerê navborî dike, dibêje ku digel ku wezîrê Osmanî gazî hemû mîrên Kurdan dike ji bo şerê li hember mîrektiya Bidlîsê; lêbelê xêncî begên Kurdan ên piçûk, mîrên Kurdan ên mezin naynê alikariya artêşa Osmanî. gazî piraniya mîrên Kurdan, mîrên Hîzanê jî alikariya Osmanî nekirin. Evliya Çelebî navê çend mîr û begên piçûk ên ku alikariya dewleta Osmanî kirine, dide; lê navê mîrektiya Hîzanê nade.¹⁵² Qasî ku tê xuyanê mîrektiya Hîzanê beşdarî vî şerî nebûye.

¹⁵⁰ M. S. Lazarev, Ş. X. Mihoyan, *Kürdistan Tarihi*, Avesta Yayınları, İstanbul 2010, r. 77-90; Veysel Aydeniz, *Akkoyunlu-Kürt İlişkileri*, Kent Yayınları, İstanbul 2013, r. 67; Bitlisi, b.n., r. 253.

¹⁵¹ Epözdemir, b.n., 110.

¹⁵² Evliya Çelebi, *Seyahatname*, Yeni Şafak Gazetesi, İstanbul 2006, r. 404.

Piştî vî şerê han, ew pêbawerî û destebiratiya muteqabîl a di navbera Kurd û Osmaniyan de ya bi peyman a Amasyayê destpê kiribû, derizî. Ji vê dîrokê pê de, yanî ji nîveka duduyan a sed sala hevdehan pê ve, mucadeleyeke veşarî di navbera dewleta Osmanî û mîrektiyên Kurd de destpê kir. Lêbelê di vê pazûbaziye de her du alî jî zef nikaribûn hevûdu bileqandana.¹⁵³ Mîrektiya Hîzanê jî wek wan mîrektiyên din, di bin bandora vê atmosferê de bû. Lê li gor dabeşkirinên îdarî, hin caran statuya mîrektiya Hîzanê guherîbe jî, bi gelemperî Hîzan û herêma der û dorê, ji hêla mîr û hukumdarên niştecih ve, bi sedsalan wek “hukumet”ekê hate birêvebirin.¹⁵⁴

3. HÎZAN DI SERDEMA MÎREKTIYÊ DE

Li gor hin qeydên dîrokî, binyada Mîrên Hîzan, Mukus û Espayêrdê eynî ne û bav û kalên wan ji Xunûsa li herêma Bilîcanê hatine. Van pêşî kela Bilîcanê di demeke kurt de bi dest xistine, paşê jî texmînen di salên 1200î de her sê bira bi hev re hatine û Hîzan, Mukus û Espayêrd hildane bin destê xwe. Birayê mezin ê bi navê Dil bûye hukumdarê Hîzanê.¹⁵⁵ Li gorî teoriyeke din jî mîrên Hîzanê ji xanedana Eyyûbiyên Kurd in. Dewleta Eyyûbî di sala 1207an de Turkmenên Xelatê mexlûb kirin, desthilatdariya Xelatê kete destê xanedaneke Eyyûbî. Vê xanedana Eyyûbî demeke dirêj li vê herêmê hukumraniya xwe berdewam kirin. Dema Celaledîne Harzemşah di sala 1229an de ev herêm îstila kir, ew xanedana Eyyûbî jî mecbûr ma ku terka vê derê bike. Ev xanedan paşê berjêrî başûrê Gola Wanê bûn û ev herêm kirine bin hukmê xwe. Mîrên Hîzanê jî milekî vê xanedana Eyyûbiyan e.¹⁵⁶ Ev nêrîna han bêhtir tê qebûl kirin a di derheqê menşeya mîrên vê herêmê de. Kîjan teorî rast dibe bila bibe, ev yek tê pejirandin ku binyada mîrên Hîzan, Mukus û Espayêrdê yek in.¹⁵⁷

¹⁵³M. S. Lazarev, Ş. X. Mihoyan, *Kürdistan Tarihi*, Avesta Yayınları, İstanbul 2010, r. 77-95

¹⁵⁴*Mecmua-yi Tevarih-i Osmani*, Maddeya “Hizan”, <http://ercaninal2.blogspot.com.tr>, (dîroka xwegihînê: 27.07.2016)

¹⁵⁵Bitlisi, b.n.r. 260.

¹⁵⁶Hakan, b.n., r. 7

¹⁵⁷Hakan, h.b., r. 7-8.

3.1. Rewşa Sîyasî

Gelek desthilatdarên xwemalî û bîyanî li herêma mîrektiya Hîzanê hukum kirine. Ji Êrtû, Med, Roma, Bîzans, Pers bigre heta Ereb, Kurd û Tirkên serdema navîn. Her wisa gelek mîr wek mîrê Hîzanê hukumdariya hukumeta Hîzanê kirine. Mîr Şerefxanê Bidlîsî navên qismekî mîrên Hîzanê yên berî xwe û yên dema xwe, bi awayekî kronolojîk di *Şerefnameya* xwe de nivîsiye. Qasî ku em dizanin ji Şerefxan vir de kesek li ser mîrên Hîzanê nexebitiye, em rastî xebatekê nehatin ji bo mîrên Hîzanê yên piştî Şerefxan. Me di van çavkanî û belgeyên dirokî de bîst mîrên Hîzanê tespît kirin. Mîrên ku me di derheq dîroka desthilatdariya wan de di çavkaniyên dîrokî de agahî bi dest xistin, me salên hukumdariya wan li hemberî navê wan nivîsî. Yê ku salên desthilatdariya wan ne kifş e lê salên wefata wan kifşe ye, me ew dîrok li hemberî wan nivîsî. Lê yê ku me di derheqê de agahî bi dest nexistin lê navê wan û rêza kronolojîya hukumdariya wan kifşe be, me bi hesabekî texmînî (wek: Teqrîben) tarîx da wan. Ji bîst mîrên Hîzanê, navên deh mîran di *Şerefnameyê* de derbas dibin û ew jî ev in li gorî kronolojiyê.¹⁵⁸

- 1-Mîr Dil (Teqrîben: m. 1200)
- 2-Emîr Suleyman (Teqrîben: m. 1400)
- 3-Emîr Melîk (Teqrîben: m. 1470)
- 4-Emîr Dawud (Teqrîben: m.1540)
- 5-Sultan Ahmed (Teqrîben: m.1560)
- 6- Sultan Muhammed (m. 1575)
- 7- Mîr Dawudê II. (Teqrîben: 1582)
- 8-Mîr Melîk Xelîl (m. 1583)
- 9-Mîr Mehmûd (m. 1585)

¹⁵⁸Bitlisi, b.n.,r. 259

10-Mîr Hesên (Teqrîben: m.1600)¹⁵⁹

Xêncî van deh mîran, navên sê mîrên din jî di malpera/sîteya resmî ya Qaymeqamtiya Hîzanê de derbas dibe. Di vê malperê de dîroka Hîzanê hatiye nivîsîn û tê gotin ku Hîzan piştî şerê Çaldiranê yê Yawuz Sultan Selîm ketiye bin hukmê Osmaniyan. Piştî vê dîrokê Murteza Bey ku ji Azerbeycanê hatiye, begligek yanî mîrekiyek ava kiriye û li gorî hêza xwe wek dewleteke serbixwe jiyaye. Di vê serdemê de Hîzan wek Erzant dihat nasîn. Piştî mirina Murteza Beg, kurê wî Ebdal Beg ketiye dewsa wî. Piştî Ebdal Beg Mîr Şerafeddin bûye hukumdarê mîrekiyê. Tê gotin ku Mîr Şerafeddin li Hîzanê du qesr dane çêkirinê. Ji van qesran ya herî girîng li Serin Tepe ku wek Girê Sergincî tê binavkirin, hatiye avakirin û 336 odeyên wê hene. Her wisa tê gotin ku Mîr Şerafeddin her şev li odeke wê dima. Desthilatdariya vê mîrekiyê heta nîveka duduyan a sedsala 19. Berdewam kiriye.¹⁶⁰

Qasî ku tê xuyanê agahiyên di malpera resmî ya Qaymeqamtiya Hîzanê de û yê Şerefxanê Bidlîsî ku di pirtûka xwe ya navdar a dîroka Kurd a bi navê *Şerefnameyê* de nivîsîne, ji hevdu nagrin. Lewra Şerefxan wek mîrzade û dîrokanekî wê herêmê, navê deh mîrên Hîzanê yê berî û piştî şerê Çaldiranê yê Yawuz Sultan Selîm, dide û derbarên wan de agahiyên berfireh dinivîse. Di derheq tu mîrekî da jî nabêje ku ji Azerbeycanê hatine. Şerefxan cihê hatina wan, wek Bilîcan nîşan dide. Bilîcan jî navê çiya û herêmeke jora Bidlîsê, nêzî Mûşê û di nav tixûbê Kopê de ye. Her wisa di nava wan navên ku zikir dike de jî navê van her sê mîran tune. Bi qenaeta me ev agahiyên di malpera resmî de, agahiyên berê ne, agahiyên kevn in. Heta deh- panzdeh sal berê jî nasname û dîroka Kurdî bi awayekî resmî dihat înkarkirin û nedihat qebûkirin. Lewma digel ku *Şerefname* çavkaniya dîroka Hîzanê ya pêşîn û heta yekane ye jî, qet agahî jê hilnedane û jê serfê nezer kirine. Îddiaya hatina mîrên Hîzanê a ji Azerbeycanê jî, ez bawerim dîsa li gor îcaba zihniyeta berê ya Tirkirina Kurdan e û bi wê ve eleqedar e. Lêbelê ev her sê mîr bi qenaeta me piştî wan deh mîrên ku Şerefname qala wan kirine, bûne hukumdarê Hîzanê. Em ê di listeya mîrên Hîzanê de cih bidin van mîran.

¹⁵⁹Bitlisi, h.b., r. 256-257.

¹⁶⁰Hizan Kaymakamlığı, <http://www.hizan.gov.tr/detay/hizan-tarihi>, (dîroka xwegihînê: 24.07.2016)

Navên du mîrên Hîzanê jî li ser kêla Feqiyê Teyran a li gundê Şandisa Hîzanê hatin dîtinê. Ji vana yek Mîr Huseyn e ku qebra Feqî daye çêkirin û jê re weqif ava kiriye. Navê mîrê din jî Mîr Şeref e ku bavê vî Mîr Huseynî ye.¹⁶¹

Di hin lêkolînên li ser çand û dîroka Hîzanê de navê mîrekî Hîzanê jî wek Mîr Cîhan yan jî Cîhan Paşa derbas dibe û wek hevçaxê Feqiyê Teyran qala wî tê kirin. Li gor van qeydan Feqî gava hatiye Hîzanê û di Medreseya Etîq de xwendiyê, bûye aşiqê keça wê ye bi navê Sînemê.¹⁶² Feqiyê Teyran çawa ku ji lêkolîn û derca dîrokê ya di helbestên wî de jî derdikeve holê, di navbera nîveya duduyan a sedsala XVI. û serê sedsala XVII. de jiyaye.¹⁶³ Ew çax meriv dikare serdema Mîr Cîhanê Hîzanî bi teqrîbî wek dawîya sedsala XVI. û serê sedsala XVII. nîşan bide.

Navên du mîrên din ên Hîzanê jî li ser kêlikên qebrên li qebriştana Medreseya Taxê ya li gundê Taxê hatine dîtin. Navê mîrekî Mîr Ebdî ye di sala 1825an de wefat kiriye. Li gor nivîsa li ser vê kêlikê Mîr Ebdî kurê Mîr Suleyman e.¹⁶⁴ Li gor qenaeta me Mîr Suleyman jî di salên 1750yê de mîrtiya Hîzanê kiriye. Selîmiyê Hîzanî yê ku edebiyata Kurdî de çiyekî wî yê girîng heye û xwediyê mesnewiya Kurdî ya bi navê *Yûsuf û Zuleyxayê* ye, ew mîrê Hîzanê yê ku Selîm mesnewiya xwe îthaf kiriyê û di beytekî de jî dibêje “Selîmê dil Suleyman im / Esîrê mîrê Hîzan im”, ev Mîr Suleyman e. Vê gavê nayê zanîn ka çima qebra vî mîrî li vir e. Lê ev kelha Taxê ya mezin û ji bo parastinê munasib, wek cihekî stratejîk e ji bo rêveberiyê. Dibe ku ji ber vê sedemê ev der hatibe hilbijartin.

Navê mîrekî Hîzanê yê din jî Mîr Şerefeddîn ne. Ev mîr di salên 1840î de li ser text bûye. Ev yek ji wesîqeyên arşîva Osmanî yê bi navê *Mesail-i Mühimme-i Kürdistan* yê salên 1830-50 tê fêmkirin. Li gor agahiyên arşîva Osmanî, têkiliyên Mîr Şerefeddîn him bi Mîrên Kurdan yê wek Mîr Brdirxanê Cizîrî û yê din re baş in û him jî bi dewleta Osmanî re baş e.¹⁶⁵

¹⁶¹ Adak- Acar-Baluken, g.n., r. 19.

¹⁶² Çiçek, b.n., r. 670.

¹⁶³ Seîd Dêreşî, *Bermayêt Dîwana Feqiyê Teyra*, Çapxana Zankoya Dihok, Çapa Yekem, Dihok, 2011, r. 60-61.

¹⁶⁴ Çiçek, b.n., r. 665

¹⁶⁵ Kerem Soylu, *Dereleme Araştorma Deşifrasyon, Mesail-i Mühimme-i Kürdistan (Kürdistan'ın Önemli Meseleri), Pêvek (Osmanlıca Orijinal Belgeler)* Belge No: 1236/18, Weşanên Enstîtütuya Amedê, Diyarbakır 2010, r. 131.

Di hin qeyd û belgeyan de navê mîrê Hîzanê yê dawîn jî derbas dibe. Li gorî van çavkaniyan Navê mîrê dawî Mîr Muhyeddîn e¹⁶⁶. Di salên 1845-50î de gava Osmanî mîrektiyên Kurd ji holê radikin, ev mîr li ser text bû.

Lêkolînerê dîroka edebiyata Kurdî Feqî Huseyn Sağniç jî di pirtûka xwe de gava qala Selîmiyê Hîzanî dike, dibêje ku li gor gotinên ehlê Hîzanê, berî Selîmiyê Hîzanî du mîrên Hîzanê yên bi navê Mîr Şeref¹⁶⁷ hebûne. Lê ji ber ku xêncî van gotinên li nav gel, tu belgeyeke dîrokê neketiye destê me, me navê van her du mîran nexist nav lîsteya mîran. Her wisa Êsivê Welî ku wek avakarekî medreseyeke kevn a Hîzanê navê wî derbas dibe, me navê wî jî nexiste nav lîsteya mîrên Hîzanê. Ji ber ku di derbarê mîrtî û rêvebertiya wî ya Hîzanê de tu agahî û belge di dest me de nînin. Wek texmîn û qenaetekê em dikarin bibêjin ku Êsivê Welî jî mîrekî Hîzanê ye. Lewra bi gelemperî avakar û finansorên medreseyên serdema mîrektiyên, mîr û mîrzade bûn yan jî xanedanên wan bûn. Lêbelê ji ber ku di vê derbarê de belge û qeyd di dest me de tunene, me Êsivê Welî wek mîrekî Hîzanê nîşan neda.

Li goristana li nav Hîzana kevn ku jê re Sûra Hîzanê tê gotin, digel du mezelên sehabiyên ên bi navê Şêx Muhemmed û Şêx Bahaeddîn û nozdeh mezelên malbata wan, qasî şeş-heft mezelên din jî hene.¹⁶⁸ Li gorî gotina xelkê ehlê vir, ev mezel ên mîrên Hîzanê ne. Lêbelê ji ber ku ev mezel bêxwedî mane, piraniya wan şikestine û nivîsên li ser şahîdeyên kêlikên van mezelan rind naynê xwendin, me vê gavê ev mîr jî nexistin nava vê lîsteyê.

Ew çax gava em navên van hemû mîrên Hîzanê li gor kronolojiyê rêz bikin, lîsteyeke awaha derdikeve holê:

- 1-Mîr Dil (Teqrîben: m. 1200)
- 2- Emîr Suleyman (Teqrîben: m. 1400)
- 3-Emîr Melîk (Teqrîben: m. 1470)

¹⁶⁶Abdullah Varlı, *Dîwan û Jînawayiya Ehmedê Xanî*, Weşanên Sîpan, Stenbol, r. 111-115; Şakir Epözdemir, *1514 Amasya Antlaşması Kürt- Osmanlı İttifakı ve Mevlana İdris-i Bitlisi*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2005, r. 160- 169.

¹⁶⁷Sağniçi b.n., r. 449.

¹⁶⁸Binêr: r. 38.

- 4- Emîr Dawud (Teqrîben: m.1540)
- 5- Sultan Ahmed (Teqrîben: m.1560)
- 6- Sultan Muhammed (m. 1575)
- 7- Mîr Dawudê II. (Teqrîben: 1582)
- 8- Mîr Melîk Xelîl (m. 1583)
- 9- Mîr Mehmûd (m. 1585)
- 10- Mîr Hesên (Teqrîben: m.1600)
- 11- Murteza Beg (Teqrîben: m.1620)
- 12- Ebdal Beg (Teqrîben: m.1640)
- 13- Mîr Şerafeddin (Teqrîben: m.1660)
- 14- Mîr Şeref (Teqrîben: m. 1680)
- 15- Mîr Huseyn (m. 1706)
- 16- Mîr Cîhan (Teqrîben: m. 1750)
- 17- Mîr Suleyman (Teqrîben: m. 1775)
- 18- Mîr Abdî (m. 1825)
- 19- Mîr Şerefeddîn (Teqrîben: m. 1845)
- 20- Mîr Muhyeddîn (Teqrîben: m. 1950)

Li gor çavkanî û qeydên dîrokî rêvebir û hukumdarên vê mîrekiyê ji berê de bi împarator û mîrekiyên din ên der û dora xwe re, rêya lihevkerinê dimeşandin. Bi saya vê polîtîkaya aşitiyane, sultanên mezin bela xwe bi ehlê vê mîrekiyê nedane.¹⁶⁹

Xelqê vê mîrekiyê wek ehlê eşîretên “Nemiran” têne zanîn. Sedemê navlêkirina vî navî ev e ku gava kesekî xwedan wezîfe yan jî ulûfe, yanî

¹⁶⁹Bitlisi, b.n.,r. 258.

xwedanmeqamekî ji ehlê vê eşîr û qebîleyê wefat dikir, rêvebiran ulûfe dîsa bêkêmasî dida zarên wî, çi yên piçûk û çi jî yên mezin. Wihareng ew kesê ku meîşeta wan pêk tîne her wekî ku nemiriye, di rewşa wan a kêmbûn û zêdebûnê de guherînek çênedibû. Lewma ji wan re hatiye gotinê “nemiran” yanî “namirin”.¹⁷⁰ Her wisa di qeydên destxetên kevn û salnameyên Osmanî yên wilayeta Bidlîsê de jî em rastî navê vê eşîreta “Nemiran” tî. Kifş e ev eşîr yan federasyona eşîran niştecihên Hîzanê yên qedîm in. Ev nav heman demê de navê herêm û bajarekî Hîzanê ye. Di salnameyeke Osmaniyan de ku di dawiya sedsala 19an de hatiye nivîsîn de jî qala Hîzanê û vê eşîreta Hîzanê tê kirin¹⁷¹

3.2. Rewşa Civakî

Mîr û hukumdarên mîrekiya Hîzanê ji ber ku rêya aşitî û lihevkerinê şopandine û ev taybendmendiyeke wan a ciyawaz e, ev wek çandekê bandor li ser hemwelatîyên vê mîrekiyê kiriye û bûye xûy û xesletê ehlê vî welatî.¹⁷² Ew atmosfera xwendin û perwedehiyê ya li vê mîrekiyê jî bandor li ser qerekerê însanê vê herêmê kiriye. Her wiha bi saya vê dorhêla ilmî û îrfanî, însan û civatên li vê herêmê bi kesayetiya xwe ya aram û giran, nefispiçûk û abid derdikevin pêş.

Şerefexan wek çavdêriyeke derbarê Hîzanê de dibêje ku ehlê vî welatî bi rabûna xwe ya bo nimêjê û îbadetê şevê û sehera sibê, bi teqwa xwe, bi dîndariya xwe, bi pêbawerbûn û emînîbûna xwe û bi sedeqeta xwe ya bi dîn re navdar e di nav bajarên Kurdistanê de. Ji piçûkan bigre heta mezinan kesekî bênimêj tunebû. Xelqê vî bajarî di wê baweriyê de ne ku eleqeya gelek ewliyayên Xweda bi vî bajarî re hene û ev bajar yek ji wan ciyan e ku dua lê tî qebûlkin. Bi rastî piraniya hukumdarên vê hêlê hê jî xwediyê van xesletan in.¹⁷³ Ev taybetmendiyan ehlê vê herêmê di serdema mîrekiyan de jî wek mîras û kesayetiyeke dîrokî berdewam dike û fêkiyên xwe yên di hêla çand, edebiyat, îrfan û hwd. de dide. akademîsyen û lêkolînerê li ser çand û dîroka Hîzanê Hasan Çîçek jî vê rewş û taybetiyê awha tîne ziman:

¹⁷⁰Bitlisi, h.b.,r. 255.

¹⁷¹*Bitlis Vilayetine Mahsus Salnamedir*, İkinci Defa, Sene-i Hicriye-i Kameriyye: 1316, Bitlis Vilayet Matbaası, 1892, r. 174.

¹⁷²Bitlisi, b.n., r. 255.

¹⁷³Bitlisi, b.n.,r. 253.

“ Hîzan heta serê sedsala XX. bi çendîn medreseyên xwe ve, navenda çandê û perwerdehiyê û ilm û irfanê ya wê serdemê ye ku weke hin bajarên navenda perwerdehiyê yê roja me ya îroyîn ku warê çend heb zanîngehan in. Zanyar û alimên ku di wê serdemê de li wê herêmê gihîştine, paşê li seranserê welatê Osmanî nav û deng dane. Hîzan heta serê sedsala XX. hema wek Bexda(d)ya sedsala IX. e. Di wê serdemê de li vê herêmê yê ku dixwestin bibine alimekî baş, rêya wan exleb bi Hîzanê re derbas dibû.

Hin bajêr yan herêm hene ku bi gîhandina şexsiyetên girîng û hêja ve, berhemdariya xwe, dewlemendiya xwe, munbîtbûna xwe û ciyawaziya xwe tavilê bi meriv didin hîskirin. Hîzan jî yek ji wan navendên me ye. Hîzan xwedî paşedîrokeke dewlemend û entellektuel a berhemdar e. Çavkaniya vê dewlemendiyê, medreseyên li vê herêmê ne. Hîzan digel ku xwedî îqlîmekî sert û sar e jî însanê wê xwedî qerekerêkî xayet mûnîs, mutedîl, camêrane ne û dûrî îfrat û tefrîtê ne. Bi qenaeta min sedemê vê yekê, ev paşdîroka çandî ye ya li Hîzanê. Bi saya medrese û alimên li vir, atmosfereke entellektuel peyda bûye. Wihareng ehlê vir jî pê rewşen û rohnîdar bûne; zana, serwext û şareza bûne. ”¹⁷⁴

Li erdnîgariya mîrekiyên Kurdan piraniya gelheyê Kurd bû. Lê digel vê yekê gelên wek Ermenî, Asûrî, Keldanî, Suryanî, Ereb, Tirk jî di hêla gelheyê de wek kêmeteweyan li van herêman dijiyan. Heta li hin deran jî Kurdan jî zêdetir bûn. Lêbelê Kurdên Sunî ji hêla rewşa siyasî ve xwedî serdestiyeke dîrokî bûn.¹⁷⁵ Çawa ku li gelek mîrekiyên Kurd, xêncî Kurdên musulman, Kurdên Êzîdî û Ermenî û Suryaniyên Xrîstiyân hebûn, li mîrekiya Hîzanê jî Ermeniyên Xrîstiyân digel Kurdên Musluman dijiyan. Hejmara Ermeniyên li Hîzanê ji ya Kurdan her çiqas kêmtir be jî li gelek gundan û li qeza û serbajarê Hîzanê nifûseke girîng a Ermeniyân hebû. Ermeniyên Hîzanê girêdayî Katogîxosiya Axtamarê ne.¹⁷⁶ Ermeniyên Hîzanê û yê li mîrekiyên din ên Kurd bi sedsalan di nav hev de û bi dostane jiyane. Di

¹⁷⁴Çiçek, h.b., r. 661-663.

¹⁷⁵Sinan Hakan, *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2002, r. 32.

¹⁷⁶Mayevsriy V. T. *19. Yüzyılda Kürdistan'ın Sosyo-Kültürel Yapısı ve Kürt –Ermeni İlişkileri*, Weşanên Sipan, Ankara 1997, r. 302

serdema Îslamê vir de desthilatdarî di destê Kurdan de bû. Lê Ermenî aliyê bawerî û nesnameya xwe de azad bûn û ji mîr û hukumdarên Kurd razî bûn. Lewra mîrên Kurd xwe wek mîrên Kurd û Ermenî û yên mayîn, didîtin.¹⁷⁷

3.3. Dawîlêhatina Mîrektiya Hîzanê

Di sala 1789an de Selîmê III. derkete ser textê Osmanî û her wiha di rêveberiya Osmanî de bizavên rojavayîbûnê jî destpê kir. Paşê bi Sultan Mehmûdê II. re bizava rojavayîbunê bi awayekî şênber kete rojeva dewletê. Di serê sedsala 19an de dewleta Îngilîz rêya bazirganiya Hindîstan û Besrayê xistibû destê xwe û bi Mezopotamya û Kurdistanê re kete nav têkiliyan.¹⁷⁸

Bandora dewletên Ewrûpî di vê serdemê de li ser dewleta Osmanî zef zêde bû û van dewletan nedixwest ku dewleta Osmanî ji hev belav be. Lewra dewleteke zeîf a wek Osmanî ku hakimê rêya bazirganiyê ya Hindîstanê ye, rewşeke herî cazîb bû. Mîrektî û eşîretên Kurdan ku bi Osmaniyan re bi awayekî otonom dijiyan, ber bi rewşeke serbixwe ve diçûn. Lê Ewrûpiyan vê yekê nedixwestin. Ev pêvajoyê dijê polîtîkayên Ewrûpiyan ên mêtîngeriye bû. Dewlemendiyên Kurdistanê yên binerd û sererd jî hessasiyetên dewletên wek Îngilîz, Fransa, Alman, Rûs û Emerîqa ên di derbarê vê herêmê de, zêde kir.¹⁷⁹ Sultan Mehmûdê II. digel vê rewşa tevlihev a sîyasî, xebatên wî yên rojavabûyînê û sîyaseta hukmê merkezî ku wek bingeheke rojavabûyînê dihate hesêb, mezintirîn îcraetên wî ne. Sedemê bingehîn ê bûyerên di navbera dewleta Osmanî û Mîrektiyên Kurd de ku di serê sedsala 19an de qewimî, ji ber sîstema navendîparêziya ku bi Mehmûdê II. destpê kiriye, derketiye holê.¹⁸⁰ Guherîna denge/dewranê ya piştî desthilatdariyên dewletên Ewrûpî yên mêtînger ên li ser erdnîgariya Osmanî û xasma li ser rojhilata navîn, polîtîkaya Dewleta Osmanî ya Kurd guherî. Her wiha ew îtîfaqa dîrokî ji holê rabû.¹⁸¹

Di hin çavkaniyên dîrokî de tê gotin ku hukumetên Osmanî bi xanedanên desthilatdar ên Kurd re ku li erdnîgariya rojhilat, rojava û başûrê Gola Wanê hakim

¹⁷⁷Mayevsriy, h.b., 132.

¹⁷⁸Ethem Xemgîn, *Kürdistan Tarihi Cild III.*, Weşanên Doz, İstanbul 1997, r. 67.

¹⁷⁹Hakan, b.n., r. 32.

¹⁸⁰Mesut Yeğen, *Devlet Söyleminde Kürt Sorunu*, Weşanên İletişim, Stenbol 1999, r.58-68.

¹⁸¹Sinan Hakan, *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2002, r. 32.

in, muteffiq e û statuya wan a huqûqî wek “Yurtluk, Ocaqlık, Lîwa û Hukümet” nas kiriye û ji berê de desthilatdarî ji wan re hiştiye. Her wisa di belgeyeke Osmanî ya beriya ji holê rakirina mîrekiya Hîzanê de, Hîzan wek “Hukümet” tê nîşandan û navê mîrê wê hukümetê jî wek “Mîr Muhyeddîn” hatiye qeydkirin.¹⁸² Ji van qeydên dîrokî jî derdikeve holê ku statuya mîrekiya Hîzanê heta dawiya serdema Osmanî jî wek “hukümet” berdewam kiriye. Her wiha mîrê dawîn ê Hîzanê jî Mîr Muhyeddîn e.

Piştî sîyaseta Sultan Mehmûdê II. ya hukmê merkezî ya di nivê sedsala 19an de, dewleta Osmanî ew îttifaqa sala 1514an a bi peymanê Amasyayê pêkhatibû bi awayeyî yekalî xerab kir. Di heman demê de bi leşkerên giran êrîş bir ser mîrekiyên Kurd û şerên dûr û dirêj di navbera Dewleta Osmanî û mîrekiyên Kurdan de qewimîn. Lewra îdareya Osmanî di vê tarîxê de li gor îcaba sîyaseta nû dixwest ku rêvebiriyên mîrekiyên Kurdan ên ku statuya hukümetan de bûn, ji holê rake. Lewma artêşa Osmanî ya giran berê da mîrekiyên Kurd ên wek Baban, Soran, Behdînan, Mehmûdiyan, Bradost, Mukriyan, Erdelan, Rojkan, Hekkarî, Hîzan, Mukus, Zîrkan, Palo, Êgil, Siwêdî û Çemîşkezekê.¹⁸³

4.SERDEMA PIŞTÎ MÎREKIYÊ

Bi vê siyaseta hukmê zatî yanî merkeziyetparêziyê ya Osmanî, ew aştî û aramî çawa li hemû herêmên mîrekiyên Kurd rabû, li Hîzanê jî ji holê rabû. Di encama êrîşên artêşa Osmanî, herêmên mîrekiyên Kurd û xasma serbajarên wan ên bi dehan medrese, xan û qesr û kaşxaneyan mamûr û bi sed hezaran nifûs ve şên û şad, talan û wêran bûn. Li van bajaran kevirlî ser kevir nema. Bidlîs, Hîzan jî wek nehya û gund dikevin nav tixûbê vê wilayet Di salên 1850yî de mîrekiya Hîzanê bû hedefa vê keraset û felaketê. Qeydên resmî yê komarê derbarê Hîzana di vê dîrokê de awha dibêje: “Hîzan di serê nîveka duduyan a sedsala XIX. de gundek bû û girêdayî Bidlîsê bû, Bidlîs jî nehya bû û grêdayî sancaqa Mûşê bû û Muş jî girêdayî wilayeta Erzurumê bû.”¹⁸⁴ Derdikeve holê ku bi hilweşandina mîrekiya Hîzanê,

¹⁸²Hüküm-ü Şerif-î 29 Ramazan 1262 K OH 1822-9-1846 2(M), Yê ku neql dîke: Abdullah Varlı, *Dîwan û Jinewayiya Ehmedê Xanî Cild I.*, Weşanên Sîpan, Ankara 1996, r. 111-115.

¹⁸³Epözdemir, b.n., 114.

¹⁸⁴Hizan Kaymakamlığı, <http://www.hizan.gov.tr/detay/hizan-tarihi>, (dîroka xwegihînê: 24.07.2016)

ew(î) bajarê “Hîzana ku wek Bexdaya sedsala IX.” dikin gund. Ew bajarê Bidlîsê jî ku serbajarî kiriye û bi qesr û kaşxaneyên xwe û bi pirtûkxane û xan û hemam û medrese û hwd. şuhretşîarê alemê ye, geriye (bûye) nehya û bi sancaqa Mûşê ve hatiye girêdan. Bi qenaeta me, ev guherîna van serbajaran a bi gund û nehyan, dereceya texrîbat û talan û wêran û şêlana di dîroka 1850yî de bi awayekî din yanî bi awayekî endîrekt nîşan didin.

Dewleta Osmanî piştî ji holê rakirina van mîrektiyên Kurdan di salên 1847-51î de qirara çêkirina “Eyaleta Kurdistanê” dide û Meclîsa Wala ya Osmanî Unwanê “Fatihê Kurdistanê dide Padîşahê serdemê Sultan Abdülmecîd. Hîzan digel Bidlîs û Mûşê dikve nav tixûbê vê eyaletê. Dewleta Osmanî Eyaleta Kurdistanê di sala 1865an de ji holê radike.¹⁸⁵

Hîzan di sala 1913an de marûzê îşxala Rûs dibe û di sala 1914an de Rûs jî Hîzanê vedikişin û derdikevin. Di sala 1919an de mintiqeya Hizana nû ku jê re dibêjin Karasu, dikin navenda navçeyê, navê Hîzanê lê dikin û bi Bidlîsê ve girê didin. Hîzana dêrîn jî wek “Nefsê Hîzan” yanî “Hîzan bi xwe” yan jî “Hîzana eslî”, hin caran jî wek “Sûra Hîzanê” tê binavkirin; aniha “mezra/gom” ye, navê wê bi Tirkî kirine “Kayalar” û mezreya gundê “Gayda” ye. Di serdema komarê de di sala 1929an de Hîzanê jî navçetiye dadixin bûcaktiyê. Di sala 1936an de jî Hîzanê jî Bidlîsê vediqetînin û bi Mûşê ve girê didin. Paşê jî li gor qanûna bi hejmara 2881î dîsa dikin navçe û bi Bidlîsê ve girê didin. Aniha qasî 180 gundên Hîzanê hene û piraniya navên wan ên eslî bi Kurdî û Ermenikî ne. Navê gundekî tenê bi Tirkî ye. Piştî avabûna komarê, navên gund û beldeyên Hîzanê yên orjînal, wek hemû navên gund û beldeyên herêmên din, vegerandine zimanê Tirkî.¹⁸⁶

¹⁸⁵ Cemal Ülke, “Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürdistan Eyaleti ve Kürdistan Eyaletinin Kuruluşu”, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı’dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013, r. 161.

¹⁸⁶ Hîzan Kaymakamlığı, <http://www.hizan.gov.tr/detay/hizan-tarihi>, (dîroka xwegihîne: 24.07.2016); <http://nisanyan1.blogspot.com.tr/2013/01/hizan-notlar.html> (dîroka xwegihîne: 02.05.2016);

BEŞA SÊYEM

BANDORA TAYBETMENDIYÊN RÊVEBİRÎ Û ÎSTIQRARA SIYASÎ DI PEYDABÛNA ZANYARÎ Û EDEBIYATA KURDÎ DE LI HÎZANÊ

1. RÊVEBİRÎ Û ÎSTIQRARA SIYASÎ LI HÎZANÊ

Mîrektî rêxistineke sîyasî ya Kurdan e ku binyada wê diçe heta serdema antîk. Mîrektiya Hîzanê jî wek mîrektiyeke Kurd ji konfederasyona eşîretên hêzdar û qerebalix pêk dihat.¹⁸⁷ Li paytexta van mîrektiyan meclîseke taybet hebû ku di vê meclîsê de xêncî serekên eşîretan, alim û zanyarên mezin, şêx, seyyîd û eyanan jî cih digirtin. Reîsên eşîretan di heman demê de wek şêwirmendê mîr wezîfe dikirin û li ser sîyaseta mîrektiyê giraniya wan hebû. Reîsê her eşîretekê kurek yan du kurên xwe dişande qesra mîr û ji van re dihate gotn “xizmeta mîr”. Her wisa li cem mîr grûbeke bijarte ya perekende yanî “ne ji tu eşîretekê” hebû. Ev jî zenaetkar bûn, alim bûn, Şêxu’lÎslam bûn. Binemala mîr yanî xanedana hukumdar bi hêza xwe ya çekdarî û burokratîk qontrol û çavdêriya konfederasyona eşîretan dikir, ew rêvedibirin û diedilandin. Ev sîstema rêvebiriyê gelek nimûneyên pergala dewletbûnê nîşan didin. Ji xwe Dewleta Osmanî jî ji van mîrektiyan re digot “hukumetê Ekrad” yanî “Hukumetên Kurdan”¹⁸⁸

Ev sîstema gelemperî ya rêvebiriya mîrektiyan, bêguman li mîrektiya Hîzanê jî hebû. Em ji *Şerenameyê* hîn dibin ku eşîreta Nemiran di nav van eşîretan de ku konfederasyona mîrektiya Hîzanê pêk tînin, xwedî roleke girîng e. Piraniya xelqê vê mîrektiyê wek ehlê eşîretên “Nemiran” têne zanîn. Sedemê navlêkirina vî navî ev e ku kesekî xwedan wezîfe yan jî ulûfe, yanî xwedanmeqamekî bilind yê ji ehlê vê eşîr û qebileyê gava wefat dikir, rêvebir wê ulûfeyê, yanî meaşê ku distan dîsa bêkêmasî dida zarên wî kesê wefatkirî, çi yên piçûk û çi jî yên mezin. Wihareng ew kesê ku

¹⁸⁷ Hakan Özoğlu, *Osmanlı Devleti ve Kürt Milliyetçiliği*, Çeviren: Nilay Özok Gündoğan- Azat Zana Gündoğan, Kitap Yayınevi, 2. Baskı, İstanbul 2009, r. 79.

¹⁸⁸ Cemal Ülke, “Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürdistan Eyaleti ve Kürdistan Eyaletinin Kuruluşu”, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı’dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013, r. 158.

maîşeta wan pêk tîne her wekî ku nemiriye, di rewşa wan a kêmbûn û zêdebûnê de guherînek çenedibû. Lewma ji wan re hatiye gotinê “nemiran” yanî “namirin”.¹⁸⁹ Her wisa di qeydên destxetên kevn û salnameyên Osmanî yên wilayeta Bidlîsê de jî em rastî navê vê eşîreta “Nemiran” tî. Kifş e ev eşîr yan federasyona eşîran, niştecihên Hîzanê yên qedîm in. Ev nav heman demê de navê herêm û bajarekî Hîzanê ye. Di salnameyeke Osmfanyan de jî ku di dawiya sedsala 19an de hatiye nivîsîn, qala Hîzanê û vê eşîreta Hîzanê tê kirin¹⁹⁰ Li ser kêla Feqiyê Teyran a li gundê Şandisa Hîzanê jî hatiye nivîsîn ku ew mîrê Hîzanê yê ku weqf çêkiriye bo tîrba Feqî, ji eşîra Nemiran e. Li gorî nivîstekên li ser kêlikên gora Feqî, gora Feqî di sala 1705an de piştî wefata Feqî ya bi qasî 76 salî ji aliyê mîrê Hîzanê Mîr Huseyn ve hatiye çêkirin. Mîr Huseyn di heman salê de li Hîzanê ji bo mesrefên gora Feqî weqfê jî sazî kirîye. Ji bo mucawirên gorê 50 quruş ratib tayîn kirîye. Mîr Huseyn ji eşîra Nemira ye û bavê wî Mîr Şeref Beg jî mîrekî navdar bûye.¹⁹¹ Xêncî eşîra Nemiran navê eşîra Bilîcan jî derbas dibe ku di rêvebirîya mîrekiya Hîzanê de xwedî rol in.¹⁹²

Hukumdarên vê hukümetê ji berê de rêya lihevkerîna dimeşînin bi sultanên mezin re. Lewma di esnayê wan felaketan de ku carê na carê tî serê Kurdistanê, sultanên mezin bela xwe bi ehlê vê herêmê nadin. Heta fatîhan çend caran hemû Kurdistan ji serdan pê serobinê hevdu kirin û piraniya mîrekiyên Kurd ji dest serwerên wan girtin; lê heçî Hîzan e ji ber siyaseta ku dişopandin a bi aqilane, axa vê mîrekiyê di destê hukumdarên wan de ma. Şerefxanê Bidlîsî ji pirtûka Mewlana Ebdurrezzaq Semerqandî ya bi navê *MetleusSedeynê* neqil dike ku Emîr Suleymanê mîrê Hîzanê di sedsala panzdehan de bi rêya sîyaseteke dîplomatîk nehîşt ku mîrekiya Hîzanê wek wan mîrekiyên Kurdan ên din bikeve destê Emîr Tîmûr Gurgan û Qara Yûsufê Turkmen û rê li ber hilweşîna hukûmeta xwe girt. Di vê serkeftinê de hevkarî û îtifaqa mîrekiya Bidlîs û mirekiya Hîzanê jî diyar de bû.¹⁹³

¹⁸⁹ Bitlisi, b.n., r. 255.

¹⁹⁰ Adak- Acar-Baluken, g.n., r. 112.

¹⁹¹ Müfid Yüksel, “Feka Teyran’ın Mezar Şahidesi”, [mufidyuksel.com/category/tarihe-notlarim\(diroka-xwegihine: 25.05.2015\)](http://mufidyuksel.com/category/tarihe-notlarim(diroka-xwegihine:25.05.2015)); Abdurrahman Adak, Hayrullah Acar, Yusuf Baluken, “Gora Feqiyê Teyran / Faqah Tayran’s Tomb” Kovara *Nûbihar Akademî*, I/I, s. 2014, r. 109-118.,

¹⁹² Bitlisi, b.n., r. 258

¹⁹³ Bitlisi, b.n., r. 255.

Ji vê dîrokê pê de li mîrektiya Hîzanê îstiqrar û aramî zêde bû. Paşê bi îtifaqa dewleta Osmanî û Kurdan a di serê sedsala XVI. de ev rewşa aram bêhtir bi pêş ket. Padişahê dewleta Osmanî Yawuz Sultan Selîm di sala 1514an de bi 28 mîrên Kurdan re peymana îttifaqê dest nîşan kir. Di nav vê peymanê de ku wek Îttifaqa Osmaniyan û Kurdan tê qebûl kirin, mîrê Hîzanê Mîr Dawud jî heye. Li gor vê peymanê mîr û mîrekiyên Kurd dê serxwebûn û statuya xwe ya berê berdewam bikin. Lêbelê dê girêdanan wan a manewî bi xelîfetiya Padişahê Osmanî re hebe û her wisa her sal dê mîqdarek hediye yê simbolîk ji bo xelîfe bête pêşkêş kirin. Dê herdu alî li hemberî êrişeke derveyî ya li ser hevpeymanekî, alîkariya hevûdu bikin. Ev peymana îttifaqê dê di serdemên padişah û mîrên din de jî berdewam be.¹⁹⁴

Têkiliyên xanedan û hukumdarên Mîrektiya Hîzanê û Mîrektiya Bidlîsê ji berê de bi dostaniyê dimeşiya. Her du mîrektî wek du dewletên muttefiq di nav hevkarî û hevalbendiyê de bûn. Her çend serdema mîrê Hîzanê Mîr Ehmedê kurê Mîr Dawud de di navbera van her du mîrekiyên muttefiq ên Kurd de şerekî mezin derket û gelek xûn jî rijiya, lê bi awayekî gelemperî tekiliya mîrên Hîzanê hem bi mîrên Bidlîsê û hem jî bi mîrên Kurd ên din re aştiyane bû.¹⁹⁵ Xasma bi mîrektiya Muksê re. Lewra di navbera mîrên Hîzanê û mîrên Muksê de digel têkiliyeke lêzimatîyê û dostaniyê, reqabeteke erênî jî hebû. Ev reqabet di derbarê xizmet û xebatên avadanî û ilmî de dibû sedemê pêşveçûnê.¹⁹⁶ Ji ber vê sîyaset û rêvebiriya erênî, li Hîzan û bajar û herêmên girêdayî Hîzanê dezgehên xwendin û perwerdehiyê hatin avakirin. Mîran veberhênerî û finansoriya karên zanyarî kirin û wihareng Hîzan ji hêla xwendin û tehsîlê ve wek navendeke girîng navdar bû. Karê xêr û xwendinê raxbet dît. Xasma medreseyên Dawudiyeyên ku ji hêla Mîr Dawud ve hatin çêkirin, êdî ji mîrên din re jî bûn wek mînak û nimûne. Li gor agahiyên ku Şerefhanê Bidlîsî dide, ev medrese di dema wî de jî bi zanyarên xwedî xizmetên xêrê û bi feqî û telebeyan tijî ne.¹⁹⁷ Piştî van medreseyan hejmara medreseyan li Hîzanê zêde bûn.

Ev bingeha zanyarî û çandî li ser hîmayeya mîran a zana û edebiyatnasan çêbû. Ev hîmaye jî bi du awayî pêk dihat. Yek, çêkirina saziyên çandî û

¹⁹⁴ Şakir Epözdemir, *Amasya Antlaşması 1514 Kürt- Osmanlı İttifakı ve Mevlana İdris-i Bitlisi*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2005, r. 160- 169.

¹⁹⁵ Bitlisi, b.n., r. 255.

¹⁹⁶ Hakan, b.n., r. 16.

¹⁹⁷ Bitlisi, b.n., r. 256.

perwerdehiyê ya ji aliyê mîr û hukumdaran ve. Ya duduyan, bi awayekî rasterast xwedîderketina mîran a li zanyar û nivîskaran. Ev jî dibû sedem ku nivîskar û edebiyatnas li vê herêmê zêde bibin, ji welat û mîrekiyên din talib û xwendekar werin û li vir perwerdehî bibînin. Her wiha xwedîderketina rêvebir û mîran a li edîb û zanyaran, dibû sedem ku edîb berhemên xwe pêşkêş û îthafî wan mîr û hukumdaran bikin. Ev pergala ku em jê re dibêjin sîstema patronajê, wuhareng li mîrekiya Hîzanê jî derketiye holê. Em vê rewşê bi awayekî eşkere xasma di navbera Mîrê Hîzanê yê sedsala 18an Mîr Suleyman û Selîmiyê Hîzanî de ku helbestvanê pêşîn ê Hîzanê ye ku helbestên xwe bi Kurdî nivîsiye, dibînin.¹⁹⁸ Her wisa xwedîderketina Mîr Huseyn a li mîras û merqeda Feqiyê Teyran a li gundê Şandisa Hîzanê jî mirov dîsa dikare wek nimûneyeke vê sîstema hîmayeyê ya li Hîzanê nîşan bide.¹⁹⁹

Di gelek çavkanî û belgeyên dîrokî de qala îstiqrara sîyasî ya serdema mîrekiyên Kurd tê kirin. Bêguman Hîzan jî wek mîrekiyeke ji wan mîrekiyan, mezherê van tewsîf û taybetmendiyên e. Di serdema mîrekiyên Kurd de herêma di navbera Enqere û Îranê de heta tixûbê Erebiştanê di bin desthilatdariya Kurdan de bû. Dîyarbekir, Bitlîs, Hîzan, Hekarî, Cizîr û hwd. bi navçe û gundên xwe yên bi xêr û bereket û bi erd û eraziyeke xwe yên bi adan dihatin nasîn. Lewra Kurd di vê serdemê de jiyaneke aram bi dest xistibûn. Mîr û hukumdarên xwemalî yên Kurdan ew ji xesp û talan û şêlanê diparastin. Piştî ku mîr û hukümetên herêmî yên Kurdan ji hêla dewleta Osmanî ve ji holê hatin rakirin, li van herêm û wilayetan aramî û sikûnet nema. Anarşî û kaoseke mezin destpê kir. Ew paşayên li herêma Kurdan ên alîgirê Tirkan jî nekarîbûn Kurdên girêdayî xwe biparastana.²⁰⁰

Hetta Hîzan di vê hêla îstiqrarê de, ne ku paş wan mîrekiyên din bû, bîlakîs li pêş bû. Çawa ku di şerefnameya Şerfxanê Bidlîsî de derbas dibe ku çavkaniya pêşîn a derheq Hîzanê û mîrekiya Hîzanê de ye, mîrên mîrekiya Hîzanê rêya li hev kirin û aştîyê bi mîr û hukumdarên cînar re meşandine. Hetta bi împaratorên hêzdar û îstîlaker ên wê serdemê re jî sîyaseteke maqûl meşandine. Wihareng herêma xwe û ehlê welatê xwe ji şer û îstîleyan parastine. Her wisa jî ji hukumraniya xwe û azadiya

¹⁹⁸ Ayhan Tek, “Li Dor Behsa Patronajê Mem û Zîna Ehmedê Xanî”, *Mukaddime*: Hehmar 3, r. 41-60.

¹⁹⁹ Adak- Acar-Baluken, g.n., r. 112.

²⁰⁰ Avyarov, *Osmanlı -Rûs ve İran Savaşlarında Kürtler*, Weşanên Sîpan, Ankara 1997, r.47

gelê xwe jî tawîz nedane. Vê rewşa han, yanî îstiqrara sîyasî ya li mîrektiya Hîzanê rewşa ewlehiyê baştir kir. Ev bû sedemê pêşketina aborî û bazirganiyê. Her wisa dewlemendî û avadanî zêde bû. Li ser van hêmanên bingehîn ên civakî rewşeke munbît a bo xwendin û perwerdehiyê hate holê. Mîr û hukumdarên Hîzanê jî weke gelek desthilatdarên mîrektiyên din, dezgehên ilm û irfanê ava kirin û zanyar û edebiyatnas parastin.²⁰¹ Lewma gelek zanyarên dîn û helbestvanên Kurdînivîs ji Hîzan û der û dora wê derketin. Bi vî awayî Hîzan geriya herêmeke ilmê dîn û navendeke edebiyata Kurdî. Wihareng Hîzan jî bûye yek ji wan bajar û mîrektiyên serdema navîn ku ekola xwe ya çandî û edebî pêk anîne.

Mirov dikare bibêje ku li Mîrektiya Hîzanê ji salên 1200î bigere heta salên 1850î desthilatdariyeke bi îstiqrar a mîran berdewam kiriye. Ev bi hesebekî wasatî dike 650 sal. Ev tecrubeya hukumraniyê ya evqas dirêj û îstiqrareke sîyasiya evqas berdewam pir girîng e. Ev yeka han, bûye bingeha ekoleke çandê, çêbûna çîneke arîstokrat, peydabûna edebiyateke nivîskî li mîrektiya Hîzanê.

2. BINGEHA ABORÎ Û BAZIRGANIYA HÎZANÊ

Hêmanekî girîng ê ku civatê pêk tîne û pêş dixê jî aborî ye. Xasma di serdema navîn de bajar û herêm li gor faalbûna xwe ya aborî û bazirganiyê derketine pêş yan jî temirîne. Hîzan û der û dora wê çawa ji ber erdnîgariya xwe ya stratejîk di serdema dêrîn de bala împaratorên hêzdar ên wê demê kişandiye ser xwe, her wisa bi ber û bereketa erdê xwe jî bûye navendeke cazîb a aborî û bazirganiyê ku çavê otorîteyan û komên însanan lê ye.

Erdnîgariya herêma Hîzanê çawa bi dar û ber û daristanên xwe ve serdestî herêmên der û dora xwe ye, her wisa ji hêla pirbûn û zêdebûna cureyên ber û fêkiyên xwe ve jî temayûz dike. Şerefxanê Bidlîsî di pirtûka xwe ya bi navê *Şerefname* de gava bajarên serdema navîn ji hêla aborî û bazirganiyê ve dide ber hev, derheq Hîzanê de jî dibêje li vî bajarî yanî Hîzanê gelek cureyên fêkiyan yên wek tirî û kişnîşan hene. Ev bajar bi ber û bereketa bax û baxçe û rezên xwe ve dişibihe hin bajarên Îranê yên dewlemend; xasma bajarê Tebrîzê. Hetta cureyekî ber û fêkiyekî heye di erdnîgariya fireh a li der û dor de tenê li herêma mîrektiya Hîzanê û hinek jî

²⁰¹Bitlîsî, b.n., r. 255.

geliyên Muksê yên hêla Hîzanê çêdibe. Ew jî bindeq e; hin cih jî jê re dibêjin findiq.²⁰²

Hîzan yek ji wan bajar û mîrektiyan e ku mehsûlatê wî têra wî dike. Çawa ku tê xuyanê di serdema berî Îslamê de ji vê warîdata xwe sûd wergirtiye, mehsûlê zêde îxrac kiriye û ev warîdata zêde bûye bingeha bazirganiya vî bajarî. Her wisa jî di serdemên navîn û di serdemên din de jî ev bazirganî, bûye binaxeya bazara vî bajarî. Di salnameyên aîdê sedsala 19an a Bitlîsê de di derbarê rewşa aborî û bazirganiya Hîzanê de tê goin ku hewa û ava wê xayet mutedîl e. Mehsûlatên wek çawdar, gilgîl, nîsk, beqle, hêjîr, tirî, gûz, hurmî, şambelot,rûn, dimis, hingiv, hirî, mazû, tiffîk û hwd. jê tèn. Ev mehsûlat ji îhtiyacê herêmê pir û pir zêdetir e. Fêkî û sebzeyên wî jî her wisa ser îhtiyacê re ye. Li herêmê kinc, gore û hwd. tèn hunandin û îmalkirin. Her wisa li herêmê hesinkarî û pilewerî/qilêkerî jî li pêş e.²⁰³ Di salnameyeke din de jî tê gotin ku aboriya Hîzanê gelek pêş e û mehsûlê vî bajarî pir e. Mehsûlê zêde îxracî bajarên wek Wan, Xelat, Mûş Bulanik û der û dora wan dibe û tê firotanê û bi zexîre re tê mubadelekirin.²⁰⁴

Tê xuyan ku aborî û bazirganiya Hîzanê ji berê de xayet zindî ye. Bingeha vê yekê jî dewlemendiya erdnîgarî û xwezaya Hîzanê ye. Vê dewlemendiyê hem têra bajêr kiriye û hem jî bazirganiya bajar a bi derva re derxistiye holê. Ev yeka han bûye sedemê refaha civatê û her wisa jî bûye zêdebûna bac, dahat û derameta rêvebirên vî bajarî. Wuhareng li Hîzanê binaxeya hebûnên çandî, ilmî û edebî yên maddî û manewî pêk hatiye.

²⁰² Bitlisi, b.n., r. 254.

²⁰³ *Salname-i Vilayet-i Bitlis*, Bitlis Vilayet Matbaası, Birinci Defa, 1310, sal: 1892, r. 190.

²⁰⁴ *Bitlis Vilayetine Mahsus Salnamedir*, İkinci Defa, Sene-i Hicriye-i Kameriyye: 1316, Bitlis Vilayet Matbaası, 1892, r. 174.

3. AVADANÎ

Amûreke girînga çêbûn û pêşketina şaristanî, zanyarî û edebiyatê bêguman avadanî ye. Li Hîzanê mirov rastî gelek nimûneyên bi vî rengî tê. Ev avadaniya li Hîzanê ji serê dîroka berî zayînê destpê dike û di serdema mîrekiya Hîzanê de digihêje asteke herî berbiçav.

Xerabeyên sûr, xan û hemamê ya li gundê Kayalarê yanî li Hîzana kevn ku ji hêla Asûriyan ve hatine çêkirin, nimûneyên bajarvanî û şaristaniyeke xurt in li Hîzanê.²⁰⁵ Her wisa kela Hîzanê jî berhemeke avadaniyê ye li Hîzanê. Bazil Nikitin dibêje ku ev herêm piştî wexta, di serdema dewleta Romayê de wek Moksena tê bi navkirin û wek eyaletekê tê avakirin. Navenda vê eyaletê bajarê Hîzanê ye ku li nêzî vî bajarî qelayek heye ku mîmariya Romayê nîşan dide.²⁰⁶ Di salnameyeke Osmaniyan de jî qala şeş heb kelayên Hîzanê tê kirin û tê gotin ku li herêma Hîzanê şeş kelha hene ku çend heb ji wan xerabe ne. Ji vana yên herî navdar kela Xîzanê, kela Ûçûmê û kela Taxikê ne. Agahiyên dîrokî yên derbarên van kelayan de bi dest me neketin.²⁰⁷

Şerefxan rîwayetekê derbarê navê Hîzanê de neqil dike ku tê de behsa vê kelha Hîzanê tê kirin. Tê rîwayetkîrn ku navê vê derê “Seherhîzan” bû. Avakarê kelhaya wê çû hecê û gava zivirî hat, muhafîzên kelayê derî serda girtine û nehîştine ku bikeve kelayê. Ew jî ji ber vê pir ber xwe ketiye. Paşê wî ji wan re bi Farisî bang kiriye û gotiye: “xîzanê bêîfbar” û qet nesekiniye û dîsa ketiye rêya xwe ya berê û ziviriye û çûye.²⁰⁸

Binaxeyên bo çêbûna şaristaniyeke xurt, hatibûn amadekirin li axa mîrekiya Hîzanê ji hêla Mîrên Hîzanê ve. Dîsa li gorî ku Şerefxan dibêje Mezgefta Mezin a li vî bajarî, bêguman berhemeke ji berhemê avakarê vê kelayê ye. Gelek histûnên dar ên vê mizgeftê hene. Lê ehlê vê derê kes nizane ev histûn ji kîjan darê ne. Hinek

²⁰⁵Hasan Çiçek, "Hizan'ın Kültürel Zenginliğinin Arka Planı", *1. Uluslar arası Düünden BugüneTatvan ve ÇevresiSempozyumu Bildirileri*, Beyan Yayınları, İstanbul 2008, r. 662.

²⁰⁶ Bazil Nikitin, *Kürtler SosyolojikveTarihi İnceleme*, Deng Yayınları, İstanbul 1994, r24-26.

²⁰⁷ Adak- Acar-Baluken, g.n., r. 113.

²⁰⁸ Bitlisi, b.n., r. 254.

dibêjin ku ev histûnên han ji wê darê ne ku Tirk jê re dibêjin “it burnu” û Kurd jê re dibêjin “şîlan”.²⁰⁹

Şerefxan di pirtûka xwe ya navdar de qismen behsa mal û avahiyên Hîzanê jî dike û dibêje ku avahiyên di hundurê kelayê de wek rasad hatine çêkirin û ji tûxla û heriyê ne.²¹⁰ Ev rewş jî nîşan didin ku Hîzan wek paytexta mîrekiya Hîzanê taybendmendiyên bajarên navendî yên serdema navîn di xwe de nîşan dide.

Civaknas û lêkolînerekî Rûs ê bi navê Mayevsry V. T. di pirtûka xwe ya bi navê *Rewşa Çandî û Civakî ya Kurdistana Sedsala 19an* de dibêje ku mal û avahiyên herêma Serheda Kurdistanê yên li hêla bakûr ên navçeyên wek Melazgirt, Varto, Mûş, Xelat, Bergirî, Havasor, Mahmûdiye, Hamidiye, Arçak, Tîmar yek qat in û bi rêk û pêk nînin. Lê yên başûrê serheda Kurdistanê yên navçe û herêmên wek Karçîkan, Şatax, Westan, Mukus, Hîzan, Şêrwan, Siêrd, Xerzan û Sason-Hezo xaniyên wan bi tevahî ahşab in û bi piranî du qat in û meriv li qatê jor û heywan jî li qatê jêr in.”²¹¹ Di vir de tişta bala meriv dikşîne ew e ku piraniya wan bajarên ku avahiyên wan îbtîdaî û nerind in ên bakûrê serhedê, girêdayî mîrekiyeye Kurd nînin. Lê wan bajarên ku nivîskar avahiyên wan xayet mazbût û baş dibîne, bigre tevaya wan girêdayî mîrekiyeye Kurd in. Ev jî didin nîşandan ku mîrekiya Hîzanê bi avadaniya li erdnîgariya xwe, war û wargeheke refah û aramiyê, nîzam û întizamê û her wisa jî zemînekî munbît ê çandê nivîskî û perwerdehiyê ye.

Bi vî awayî Mîrên Hîzanê li ser navê xwe warên perwerdehiyê çêkirine, kelha ava kirine, gund û bajar îmar kirine. Her wisa jî weqif saz kirine û xwedî li merzel û mîrasa zanyar û edîbên xwe derketine. Ev binesaziya dîrokî- digel şer, wêranî, talan û şêlanên giran- bûne sedemê mayîn û berdewamiya van berhemên dîrokî.

²⁰⁹ Bitlisi, b.n., r. 254.

²¹⁰ Bitlisi, h.b., r. 255.

²¹¹ Mayevsriy V. T. 19. *Yüzyılda Kürdistan'ın Sosyo-Kültürel Yapısı ve Kürt –Ermeni İlişkileri*, Weşanên Sipan, Enqere 1997, r. 81

4.ÇAND

Çawa ku me di destpêkê de jî gotibû çand têgeheke berfireh e. Hemû xebat û hilberînên însan ên maddî û manewî digre nav xwe. Ji ber vê çendê me xwes ku em vê mijara fireh tengtir bikin û tenê li ser aliyê wê yê bi mijara me re têkildar bisekinin. Lewma hêla çandê ya ku bi nivîs, ‘ilm û edebiyarê re eleqedar qada lêkolîna me ye. Gava em ji hêlê ve li mîrekiya Hîzanê dinêrin tê xuyanê ku li vê herêmê çandê qedîm a xanedanî û arîstokratîyê ku xwedîtî li dezgehên ilm û xwendinê dîkin, heye. Ev jî bûye sedemê peydabûna çandê dînî û edebiyateke herêmî.

Çanda Hîzanê ya serdema mîrekiyê bi hêla dezgehên çavkanî û baweriya dînî ve, hevaheng û heveng e bi mîrekiyên din ên Kurdan ve. Yanî di hêla dezgehên perwerdehî û xwendinê de ku wek medrese rola sereke listine, her wisa ji hêla baweriya dînî ya Îslamî ya bi rengê rêya “ehlê sunnet û cemaetê”, li ser mezhebê “Şafîî” di hêla emelî de û şopandina mezhebê “Eşarî” di hêla îtiqadî de, hevpar e bi mîrekiyên din re.²¹²

Hîzan ji hêleke din ve jî ji wan mîrekiyan e ku karibiye ekoleke çandî ya xweser pêk bîne. Her wisa karibiye ji der û dorê kes û kesayetîyan kaşî xwe bike û ekola xwe û kesên ehlê ekola xwe li derveyê herêma Hîzanê belav bike. Ananeyeke zanyarî ya dînî û derketina alimên ehlê ilmê û ehlê tesewwufê, digel madena peydabûna edîb û şairên Kurd, taybetîyeke sereke ya vê ekolê ye.²¹³ Vê ekola çandî, dînî û edebî ya li vê mîrekiyê, Hîzan gerande navendeke ilm û edebiyatê. Wuaheng di hêla cem’a zanyaran ve Hîzan bi mîrekiyên Kurdan ên mezin ên wek Bidlîs, Cizîr, Îmadiyê û hwd. re karibû bikeve pêşbaziyeke serkeftî.

Evê çandê çawa standardeke dînî û bawerî di nav herêma mîrekiya Hîzanê de pê anî, her wisa jî di hêla ziman û nasnameya Kurdî de jî bingeha standardizastonekê çêkir. Ev çand ji hêla dînî ve bi alema Îslamê re bû sedemê hevpariyê. Ji hêla ziman û edebiyata Kurdî ve jî bi Kurdên din ên li dervayî mîrekiya Hîzanê re xalên muşterek anî holê.

²¹² Abdurrahman Adak, “Tarîxa Perwerdeya Bi Kurdî Di Medreseyan Kurdan De” *Kovara DENG*, hêjmar: 99, Ist. 2015, r. 53-60.

²¹³ Binêr: r. 65.

5. DEZGEHÊN PERWERDEYÊ: MEDRESE

Di serdema mîran de saziyên sereke yên ku tê de perwerdehî dihate kirin, jê alim, edebiyatnas, huqûqnas, dîplomat û brokrat derdiketin, medreseyên mîran e. Ev medrese çawa li mîrekiyên Kurd ên din hebûn, her wisa li mîrekiya Hîzanê jî hatibûn avakirin. Van dezgehên rengê xwe dan çanda Kurdî ya wê serdemê û bûne çavkaniya edebiyata Kurdî ya nivîskî jî.

Em di bin vê sernavê de li ser hemû medreseyên Hîzanê nasekinin. Tenê li ser medreseyên Hîzanê yên serdema mîrekiyan hûr dibin. Lewra çarçove û tixûbê xebata me serdema mîrekiyan e. Ev serdem jî bi awayekî teqrîbî ji sedsala zayînî ya XII. Destpê dîke û di nivê sedsala XIX. de diqede.²¹⁴

Dezgehên sereke yên ku wek çavkaniya çanda nivîskî rol listine li mîrekiya Hîzanê, medrese ne. Ev medreseyên ku wek “medreseyên mîrî” yan jî “medreseyên mîran” ketine lîteraturê gelek zanyar gîhandine û heman demê de maktiya edebiyata Kurdî ya klasîk jî kirine. Hîzan di vê hêlê de herêmeke girîng û navendî ye ji bo van saziyên perwerdehiyê. Lewma em dixwazin bi awayekî hûrgilî li van medreseyên Hîzanê binêrin. Bêguman taybendndmendiyên rêvebirî û îstiqrara siyasî di peydabûna çand û edebiyatê de diyarde ye. Xwedîderketina rêvebir û desthilardaran a li zana û edîban, avakirina war û wargehên perwerdehiyê û derdoreke aram û bi îstiqrar, binaxeyên herî girîng in ji bo peydabûn û geşedana van nirx û cewheran. Medreseyên Kurdan di serdema mîrekan de çawa li her mîrgeheke Kurd hatibûn avakirin; li Mîrekiya Hîzanê jî hatibûn çêkirin. Ev medreseyên Hîzanê jî ji hêla mîrên vê herêmê û ji hêla ehlê xanedana mîr û xasma ji hêla jinên xanedanê ve hatine avakirin.²¹⁵

Bajarê Hîzanê heta serê sedsala 20an jî navenda herêmê ya ilm û çandê ye. Delîlên vê yekê yên herî eşkere ew medrese ne ku kelefeyên wan hê jî li ser piya ne. Çawa îro bajarên ku çend unîversîte lê hene wek bajarên çandê û entelektuel tîn pejirandin; Hîzanê jî heta serê sedsala 20an wek navendeke perwerdehî, çandî û

²¹⁴ Hakan, b.n., r. 6-32.

²¹⁵ Abdurrahman Adak, “Kurtênêrînek li ser tarîxa perwerdeya bi Kurdî di medreseyên Kurdan de” *Kovara Deng*, Hejmar:25/99, Ist. 2015, r. 53-60.

edebî, roleke bi vî rengî hildaye ser milê xwe. Îro Hîzana ku jê re “nefsê Hîzan” yanî “Hîzan bi xwe” tê gotin û di dîrokê de wek bajarê serbajar/paytext xizmet kiriye ji mîreka Hîzanê re nêzî Xeydayê ye û êdî qasî gundekî ye. Li vî bajarê kewnê ku aniha xerabe ye sûreke dîrokî heye ku li ser qadeke mezin ava ye. Lewma ji vir re “Nava Sûrê”jî tê gotin. Di serdema mîrekiya Hîzanê de gelheya bajarê Hîzanê ku jê re “Nefsê Hîzan” tê gotin 72000 (heftê du hezar) xane ye. Lewra di wê serdemê de gelheya bajarê ne wek şexs, wek xane/mal dihate jimartin.²¹⁶

Medreseyên li vî bajarî yên ku heta niha cih û navên wan tên zanîn şeş heb in. Ev medrese li aliyên rojava, başûr û bakûrê sûrê ne. Ji van şeş medreseyan kelefeyên sê heban bi awayekî eşkere li ber çavan e. Lêbelê hersêkên din tenê nav û cihên wan kifşe ne. Em ê li gor kronolojiyê li ser van medreseyan bisekinin. Em ê wan medreseyên ku dîroka wan ne kifşe ne jî, bi awayekî teqrîbî û li gor mezinahî û girîngiya wan rêz bikin. Aniha em ê li gor vî rêbazê pêşiyê li ser wan şeş heb medreseyên nav bajarê Hîzana kevn bisekinin û paşê jî li ser du medreseyên derveyê bajar hûr bibin û di derbarê wan de agahî bidin.

5.1. Medreseya Mîr Dawud

Ev medrese, medreseya herî kevn e ku di derheqê de agahî hene. Em van agahiyan ji pirtûka Şerefxanê Bidlîsî ya bi navê *Şerefname* hildidin. Mîrê Hîzanê yê ku navê xwe daye vî medreseyê Mîr Dawud yek ji wan bîst pênc mîrên Kurdistanê ye ku bi Sultanê Osmanî Yawuz Sultan Selîm re îttifaqa Kurd-Osmanî ya bi navê Peymana Amasyayê ya di slala 1514an de îmze kiriye.²¹⁷

Mîr Dawudê kurê Mîr Melîk ku mîrê Hîzanê ye, Medreseya Mîr Dawud çêkiriye. Şerefxanê Bidlîsî di *Şerefnameyê* de bi pesn qala vî medreseyê û avakarê wê dike. Muhtemelen di serê sedsala 16an de hatiye avakirin. Lewra Sultan Ahmedê kurê avakarê vî medreseyê Emîr Dawud Bîn Emîr Melîk beşdarî sefera Qanûnî Sultan Suleyman a Bexdadê bûye.²¹⁸ Fetha Bexdadê di sala 1534an de bûye û bavê Sultan Ahmed beriya kurê xwe 39 sal li ser hukum maye. Ku wisa ne bavê wî di serê

²¹⁶Çiçek, b.n., r. 663-668.

²¹⁷Şerefxanê Bidlîsî, *Şerefname*, Weşanên Deng, Stenbol 2006, r. 160

²¹⁸ Bidlîsî, h.b., r. 162

sedsala 16an de li Hîzanê hukumdarî kiriye. Li gorî Şerefxan vî mîrê han ji ber ku zana û hunermendan pir hez dikir, li Hîzanê dest bi çêkirina Medreseya Dawudiyeyê kir û qedand. Şerefxan dema pirtûka xwe nivîsiye awha qala rewşa medreseyê dîke: “Ev medreseya han hê jî tîjiye bi alimên kûr û feqiyên jêhatî”.

Sed heyf îro tenê kelefeyên vê medreseyê mane. Medrese li aliyê bakûrê sûrê li ser girekî ye. Ev gir tam li tûşa sûrê ye. Kelefe û darên li dorê mane. Di navbera medrese û sûrê de çemek derbas dibe. Ev medrese sê sed mêtro dûrî sûrê ye û tenê kelefeyên wê mane.²¹⁹

5.2. Medreseya Etîq

Medreseya Etîq li aliyê rojavayê sûrê û li ser girekî ye. Medreseya herî nêzî sûrê ye. Di navbera wê û sûrê de sed mêtro heye. Kelefeyên wê hê jî hene. Avahiyê medreseyê dişibihe Medreseya Ûsivê Welî. Kifş nîne ku ev navê “Etîq” ka gelo navê mîrekî Hîzanê yan navê mirovekî din ê avakarê vê medreseyê ye. Ev “etîq” bûn yanî “kevn” bûn, gelo di maneya kevintirbûna vê medreseyê de ye? Ev jî nayê zanîn. Dibe ku medreseya pêşîn ev be di Hîzanê de û her wisa dibe ku piştî Medreseya Dawudiyeyê hatibe avakirin. Ev ne kifş e.

Tiştê ku ev medrese navdar kiriye Feqiyê Teyran e (H. 971-1050), (Z. 1563-1641). Lewra Feqî li wir xwendekarî kiriye. Helbestvanê navdar gava li vir tehsilê digre dibe aşiqê Sînema keça Cîhan Paşa yê ku rêvebirê wê demê yê Hîzanê ye. Feqî gava diçe bo ratibê Sînemê dibîne. Muhtemelen pêvajoya ku Mîr Muhemmed digerrîne Feqiyê Teyran awha destpê dîke. Merzelê Sînemê jî qasî pêncî mêtro dûrî sûrê ye, dikeve rojhilatê başûrê medreseyê û li ser girekî xweşik e. Li derdora merzel dîwar danîne û hildane bin muhefezeyê.²²⁰

²¹⁹Çiçek, b.n., r. 669.

²²⁰Çiçek, h.b., r. 670.

5.3. Medreseya Şahzade

Ev medrese, wisa tê texmînkirin ku di sedsala 16. de ji hêla şehzadeyekî yanî mîrzadeyekî ve hatiye avakirin. Navê vî mîrzadeyî nayê zanîn. Mintîqeya ku Medreseya Şahzadeyê lê ye, tê zanînê. Lêbelê qet tu kelefeyekî wê nemaye. Yek ji wan sê medreseyan e ku ciyê wê tam nayê zanînê.²²¹

Tê gotin ku heft sed telebeyî li vê medreseyê dixwend û ders digirt. Li gorî gotinên rûsîpiyên vê derê di heyamekî de hemû maîşeta vî heft sed telebeyî jinikeke ehlê vir hildabû ser milê xwe.²²²

5.4. Medreseya Ûsivê Welî

Yek ji wan medreseyan e ku di “Nefsê Hîzanê” de hê kelefeyên wê hene. Li aliyê başûrê sûrê dikeve. Sê sed mètre dûrî sûrê ye û li ser rêya Kemalan (Keklik) e. Di navenda medreseyê de hewşeke mezin heye. Li aliyê wê yên bakûr û başûr gelek ode hene. Li hêla wê ya rojhilatê jî avahiyekî dirêj cih digre.

Her wisa li aliyên rojhilat û başûrên medreseyê jî merzel heye. Li gorî ku tê gotin merzelê avakarê medreseyê Ûsivê Welî jî li aliyê rojhilatê medreseyê ye. Li aliyê rojhilatê medreseyê merzelekî mezin heye. Tê gotin ku ev merzel, ên telebeyên vê medreseyê ne. Mezinbûn û firehiya vî merzelî, wan rîwayetên di derheqê mezinbûna vê medreseyê de tesdîq dike. Tê gotin ku hejmara telebeyên vê medreseyê hin caran dibû heft sed û pêncî.

Derbarê Ûsivê Welî û vê medreseyê de qet tu qeydeke dîrokî tune xêncî rîwayetan. Her çend nayê zanîn Ûsivê Welî yê avakarê vê medreseyê ka gelo mîr bû yan na.²²³ Lê bi qenaeta me Ûsivê Welî jî mîrekî Hîzanê ye. Lewra bi gelemperî avakar û finansorên medreseyên serdema mîrektiyan, mîr û mîrzade bûn yan jî xanedanên wan bûn. Lewma bi ihtimaleke mezin Ûsivê Welî jî mîrekî ji mîrên Hîzanê ye ku ev medrese bi ser navê xwe çêkiriye. Lêbelê ji ber ku di vê derbarê de - vê gavê- tu belge û qeyd di dest me de tunene, me Ûsivê Welî wek mîrekî Hîzanê nîşan neda di listeya mîrên Hîzanê de.

²²¹Çiçek, h.b., r. 671.

²²²Çiçek, h.b., r. 671

²²³Çiçek, h.b., r. 665.

5.5. Medreseya Meydanê

Tê gotin ku li aliyê başûrê sûrê ye û li mintîqeya medreseyan e. Mintîqeya medreseyê kifşe ye û tê zanîn. Lê kelefeyên wê nemane. Yek ji wan medreseyan e ku li derdora “Kaniya Medreseyan” in û ciyê wê tam nayê zanînê. Li vê herêma “Kaniya Medreseyan” cihê çend medreseyên din jî hene lê ne navê wan û ne jî dîroka wan tê zanîn. Di derbarê wan de vê gavê agahî tunene.²²⁴

Tê gotin ku ji vê medreseyê gelek alimên navdar derketine. Ji wana yek jî Mela Xelîlê Sêrtî ye. Seyda û muderisên wek Mela Xelîl ji vê medreseyê him derketine û him jî li vir ders dane.

Mela Xelîl ji gelek alimên Kurdistanê yê pêştatir ên nîveka duyem a sedsala XVIII. ders girt û perwerdehiya xwe qedand. Her wisa di serê sedsala XIX. de li Medreseya Meydanê ya li Hîzanê dest bi seydatiyê kir. Muderistiya wî ya li vir qasî pênc salî berdewam kir.²²⁵

Hin zanayên din ku li vê medreseyê xwendine yan jî ders dane, ev in:

Sofî Huseyîn Efendî: Di serê sedsala 19. de jiyaye. Zanayekî mezin e ku Mela Xelîl îrşad kiriye û bûye sedem ku ew bibe zanyarekî hêja.

Huseyîn El Qarasewî: Di serê sedsala 19. de jiyaye. Seydayê Mela Xelîl e. Mela Xelîl ilmê Tecwîdê jê hîn bûye.

Abduhadî El Arwasî: Di serê sedsala 19. de jiyaye. Yek ji muderrisên Medreseya Meydanê ye. Mela Xelîl dersên Mentiqê jê girtiye.

Mela Mûradê Xorosî: Di serê sedsala 19. de jiyaye. Tê gotin ku zanyarekî dema Sibxetullah Arwasî bûye. Îtibara wî li cem Sibxatullah Arwasî gelekî pir bûye.²²⁶

²²⁴Çiçek, h.b., r. 670- 671.

²²⁵Sağniç, b.n., r. 414

²²⁶Çiçek, b.n., r. 671.

5.6. Medreseya Sîxalê

Ev medrese jî navê wê di nav gelê Hîzanê de heye, qala wê tê kirin. Mixabin derheq cih û bermayeyên kelefeyên wê de tu agahî bidest me neketin. Her wisa di derbarê dîroka çêkirin û xerabûna wê de jî tu agahî tune. Ev medrese ji wan medreseyan ye ku tenê navê wê maye.²²⁷ Piştî van şeş medreseyên serdema mîrektiyên ên li nav bajarê Hîzanê ya kevn, îcar jî em werin ser her du medreseyên serdema mîrektiyên ên Hîzanê yê yê li dervayî bajêr.

5.7. Medreseya Taxê

Medreseya Taxê li gundê Taxê ya li ser rêya Muksê ye û sî û şeş km dûrî Hîzanê ye. Ev gundê han aniha vala ye. Merzelê avakar û himayetkarên vê medreseyê li kêleka medreseyê ye. Lêbelê tu agahiyek tune di derbarê dîroka avakirina medreseyê de. Tenê meriv dikare ji dîroka wefata li ser van kêlikan a ehlê xanedana ku avakarên medreseyê ne, dîrokeke texmînî ya avakirina vê medreseyê derxîne. Derbarê vê medreseyê de tenê kesên ji vê herêmê xwedî agahî ne. Lêbelê ev agahî bi devkî ne, ne bi wesîqe ne. Her wisa ji ber ku gelek navdar û naskirî ji vir perwerde bûne û li vir ders dane, navê vê medreseyê tê zanîn.

Li hêla rojavayê medreseyê merzelê mîrê avakarê medreseyê û yê jin û zarên wî hene. Mîrê wê serdemê Mîr Ebdî, jinên wî Mîranete Xatûn û Pakîze Xatûn li vir hatine definkirin. Qesra Mîr Ebdî di qelha Taxê de ye. Qelhe hema li hemberî medreseyê ye. Li ser kêlikê Mîr Ebdî wek dîroka wefatê Hîcrî: 1241 (Zayînî: 1825) dinivîse. Dîroka wefata jina wî ya Mîranete Xatûnê, Hîcrî: 1237 (Z: 1821) û ya Pakîze Xatûnê ku keça Mîr Esad e, Hîcrî: 1256 (1840) ye. Mîr Ebdî kurê Mîr Suleyman e. Mîranete Xatûn keça Mîr Eyûbxanê mîrê Muksê ye.

Li gor rîwayetan zarên Mîranete Xatûnê qet çênebûne. Lê zarên Pakîze Xatûnê hebûne. Gava Pakîze Xatûn bi zarên xwe pesnê xwe dida, Mîranete Xatûn jî gotiye “dê zarên min ên wisa çêbin ku qet neqedin, her tim bijîn û ez ê jî bi wan re bijîm. Lê zarên te dê bimirin û dê navê te nemîne.” Lewma Mîranete Xatûnê bi alîkariya mîrê xwe Medreseya Taxê çêkiriye. Ji ber ku dîroka wefata wê 1821 e, dîroka avabûna vê

²²⁷Çiçek, h.b., r. 672

medreseyê jî tê derdora salên 1800î. Muhtemelen ev medrese yan dawîya sedsala 18an yan jî di serê sedsala 19an de ava bûye. Li rojhilatê başûrê medreseyê mizgeftê heye lê gelek ciyên wê hilşiyaye. Medrese çawa ku tê xuyanê ji heşt beşan pêk tê. Çawa ku tê gotinê tê de ciyê razana telebeyan, ciyê xwarina wan, ciyê dersa wan, ciyê mutala û muzakereya wan ji hev cuda bûne. Lê sed heyf ku îro tenê xerabeyên wan mane.

Taybendmendiyeke medreseya Taxê ev e ku ev medrese ji hêla xeyrîmenkûlan ve gelek dewlemend e. Herî kêr li danzdeh gundan xwedî xeyrîmenkûl e. Tê gotin ku li van gund û gomên han erd û eraziyên medreseyê hene:

Çilçax (Kalkanlı), Çirûnan (Akçay), Usp (Esendere), Çemêûris (Soğuksu) û goma wê ya bi navê Kesrasan, Suzan (Doğancık), Sercun (Çatakdeğirmen û goma wê ya bi navê Gîş, Nurs (Kepirli) û goma wê ya bi navê Oxîş (tê gotin ku hemû erd û eraziyê Oxîşê û tevî sê zozanên wê, yên medresê ne), Gutûs (Ayvacık) û gomên wê yên bi navên Sêvkar û Oxent, Ūçim (Sürücüler), Arincık, Guç, Devtax, Spendan.

Hemû hewceyiyên wan telebeyên ku li vir dixwendin, ji hêla gundiyan ve dihate tedarîkkirin. Hejmara telebeyan ji heftêyî berjêrtir nediket.²²⁸

5.8. Medreseya Gulpîkê

Gulpîk gundekî herêma mîrektiya Hîzanê ye. Ev gund dikeve bakûr û rojavayê bajêrê Hîzanê. Di navbera gundê Xoros û Kilîbyan de di devê çem û di gelî de cih digre. Gelek zanayên mezin ji gundê Gulpîkê rabûne. Yên wekî Mela Xelîlê Sêrtî, Mela Îsmâîl jî ji vî gundî ne. Medreseya Gulpîkê di nav medreseyên Kurdistanê yên hemdemên xwe de gelek navdar bû. Gelek kesî alaza xwendina di wê medreseyê de dikir. Lê ev yek bi destê her kesî nediket.²²⁹

Li gorî agahiyên ku Feqî Huseyên Sağniç di pirtûka xwe de dide, Mela Emerê Gulpîkî yê bi fiqreyên xwe navdar e di serê salên 1800î de li vî gundî û di vî medreseyê de xwendiyê û ders girtiye.

²²⁸Çiçek, b.n., r. 666.

²²⁹Feqî Huseyên Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 527.

BEŞA ÇAREM

REWŞA ÎLM Û EDEBIYATÊ LI MÎREKTIYA HÎZANÊ

1.REWŞA ÎLMÎ

Mîrên Hîzanê digel wê sîyaset û desthilatdariya xwe ya aştiyane, dam û dezgehên xwendinê ava kirine. Her wisa xwedîtî û hîmayekariya zanyar û edîban kirine. Vê yekê jî zemînekî munbît amade kiriye ji bo gihîştin û derketina zanyar û edîban û her wisa jî ji hatin û bi cihbûna wan a bi bal Hîzanê ve.

Li mîrekiya Hîzanê li ser van hêmanan ekoleke çandî ya xwendin û perwerdehiyê derkete holê. Wihareng Hîzan jî bû navendek ji wan navendan ku atmosfereke zanyarî û çandeke nivîskî lê çêbûye û geş bûye. Wek wan mîrekiyên Kurdan ên xwedî ekol, wek Cizîr, Hekkarî, Miks, Îmadiye, Bazîd û hwd. Vê ekola zanyarî û edebî ya li mîrekiya Hîzanê ji sê hêlan ve şax veda. Yek, çêbûn û belavbûna şop û toreyeke perwerdehiyeke dînî û derketina aliman di bin unwanên wek seyda, mela, feqî û taliban de. Van, dane dû allameyên Kurd ên di dereceya alema Îslamê û dunyayê de ku mîsyona tecdîdê pêk tînin yê wek Ebû Henîfe Dînewerî, Îbnî Teymiye û hwd. ku bi Bedûzzeman Seîdê Nûrsî yê Kurdî ve dawî lê hatiye. Ya Ya dududan, gerîna Hîzanê ya wek navend û herêmeke ilmê tesewwuf û irfanê. Qasî ku tê dizanin bi Şêyxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq destpê dike û bi Şex Edurrehmanê Taxî berdewam kiriye û belav bûye. Ya sisêyan jî, peydabûn û geşbûna edebiyateke Kurdî ya Kurmancî ya nivîskî li Hîzanê. Ev tradîsyon jî bi Mela Selîmê Hîzanî, Mela Emerê Gulpîkî û yê wek wan ên Kurdînivîs ên piştî mîrekiyê diqede.

Vê ekola çandî, dînî û edebî ya li vê mîrekiyê, Hîzan gerande navendeke ilm û edebiyatê. Vê ekolê çawa ku gelek zana û edîbên ku ne ji Hîzanê bûn, kaşî Hîzanê kir; her wisa jî gelek edebiyatnas, zanyar û alimên ehlê ekola Hîzanê ji bo îrşad û dersê yan jî bi sedemne dî, sewqî dervayî herêma Hîzanê kir. Ew li hemû Kurdistanê û alema Îslamê belav bûn. Wek mînak Feqî Teyran her çiqas ji Miksê ye; lê cazîbeya Mîr û medreseyên Hîzanê ew anî Hîzanê. Her wiha peywendiya wî bi Hîzanê re çêbû

û heta Hîzan ji bo xwe kire warê daîmî.²³⁰ Yan jî hatina ji beldeya Arwasa Miksê bi Xeydaya Hîzanê ya Şêx Sibxetullah ê Xewsê Hîzanî ku alimekî ilmê dîn ku hem ehlê medreseyê ye û hem jî ji hêla xelîfetiya wî ya Xalidîtiyê û Nexşebendîtiyê ve, ehlê tesewwufê ye. Ji hêla din ve jî çûyîna ji Hîzanê ya Mela Xelîlê Sêrtî bal bi Sêrtê ve. Yan jî çûyîna Seyda Ebdurrehmanê Taxî ya bi bal Norşîna Bidlîsê ve û hwd. mirov dikare wek mînak bijmêre.

Di vê mijarê de pîrsgirêkek derdikeve pêşiya me. Gelo krîter û pîvana mensûbiyeta zanyar û edîban a herêmî li gor çiyê? Bi qenaeta me çareseriya vê pîrsgirêkê jî divê di çarçoveya herêmî de bête fikirîn. Herêmên ilmî û edebî xwediyê sînoren coxrafî û îdarî ne. Di dirêjahiya tarîxê de hemû alim û helbestvanên ku di nav wan sînoran de jiyana xwe bihurandine, ji xebatên vê qadê re dibin mijar.²³¹

Di vê serdemê de gelek zana, şair, edîb û nivîskar ji Hîzanê derketine. Çawa ku me li jor jî got ji vana hinekên wan alimên dîn in û hinekên wan jî edebiyatnas û helbestvan in. Hinek jî hene xwedî her du nasnameyan e. Wekî din, ji vana hinekan berhemên xwe bi zimanê Erebî nivîsîne û hinekên wan jî bi zimanê Kurdî. Hin jî hene ku yan berhem nenivîsîne û yan jî berhemên wan nehatine heta roja me ya îroyîn, lê di xebata zanyarî de şop û rêç hîştine û mîraseke ilmî ya li ser dil û devan dijî, ji wan maye. Em ê di vê çarçoveyê de li ser zanyar û edîbên serdema mîrektiya Hîzanê bisekinin. Ev serdema dîrokî jî teqrîben, sedsalên zayînî yên di navbera sedsala XIIan û heta nivê duyem ê sedsala XIXan digre nav xwe. Li gor vê pîvanê em li ser yên piştî nêveka sedsala XIXan, yanî piştî 1850 yê zayînî nasekinin.

Aniha em ê di bin sernava “Zanyarên Hîzanî Yên Dînî” de, li ser zanyarên ilmê dînî û ehlê tesewwufê, yên ku me di derheqa wan de agahî bi dest xistine, bisekinin. Di bin sernava “Zanyarên Bi Hîzanê re Peywendîdar” de jî em ê di derbarê wan alimên ji Hîzanê ne, lê çûne chekî din mane; yan jî ji cihekî din in, lê hatine li Hîzanê bi cih bûne de, agahî bidin.

²³⁰ Seîd Dirêşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*, Weşanên Lîs, Ankara 2011, Beşa Pêvekan.

²³¹ Adak, Abdurrahman; “Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmî: Nimûneya Herêma Bedlîsê”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 1/1, Havîn 2016, r. 34

2.ALIMÊN HÎZANÎ

Ji van zana û şairên ji Hîzanê yê herî kevn, bi qasî ku em dizanin sê heb in ku Şerefxanê Bidlîsî di *Şerefnameyê* de behsa wan dike. Xêncî van aliman, hin alim û zanayên Hîzanî yê din jî hene ku hin ji Hîzanê rabûne û hin jî Hatine li Hîzanê xwendine û li wir bi cih bû. Wihareng bi Hîzanê hatine nasîn û wisa navdar bûne. Aniha em ê li ser van aliman bisekinin. Ew alim ev in:

2.1.Şeyxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq

Şerefxan wî wek alim û mutesewwifekî Hîzanî yê Kurd dide nasîn. Dîsa dibêje ku kurê Şêx Hesênê Hîzanî ye, xelîfeyê Şêx Ebdullah Bedaxşanî ye. Her wisa sîlsîleya wî ya tesewwufê digihêje Şêx Rukneddîn Elauddewle Essîmnanî. Şerefxan tenê helbesteke wî ya derheq xweşikayiya hewa Bidlîsê de neqil dike. Kifş e ku Seyxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq şair e jî. Lêbelê ne kifş e ku helbestên wî bi kîjan zimanî ne. Tirbeya wî ya munewwer li Bidlîsê, nêzîkî Gok Meydanê ye û xelk şev û roj diçe ziyaret dike.²³² Her çiqas Şerefxan nabêje ku Şeyxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq şeyşul Îslantiya kîjan dewlet yan hukumetê kiriye, bi qenaeta me Seyxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq şeyşul Îslantiya hukumeta Bidlîsê kiriye. Lewra ji zîyareta xelqê ya tirba wî, derdikeve holê ku ehlê mîrektiya Bidlîsê wî nêzîk ve nas dikin.

2.2.Şêx Hesênê Hîzanî

Şerefxanê Bidlîsî wî wek bavê Şeyxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq dide nasîn. Ji leqebê wî yê wek “Şêx”iyê û mensûbiyeta wî ya wek “Hîzanî” jî derdikeve holê ku ew alim û arifekî dewra xwe ye. Her wisa jî ji Hîzanê ye. Bidlîsî,wekî din tu agahiyekê di derheq wî de nade.²³³

²³²Bitlisi, b.n., r. 382.

²³³Bitlisi, h.b., r. 382.

2.3.Mewlana Xizir Bîbî

Muderrîsê Medreseya Şerefiyeyê ye di dema Şerefxanê Bidlîsê de, yanî di salên 1595an de. Di usûl furûata Fiqha mezhebê Şafiî de çawa ku bêemsal e, her wisa jî di ilmê tefsîr û hedîsê de jî bêhemta ye. Kî jî wî ders girtiye, gihîştiye mertebeya kemalê. Şerefxan di berhema xwe de nabêje Mewlana Xizir Bîbî ji kuderê ye. Lê mutercîmê bi bal Erebî yê Şerefnameyê Muhemmed Elî Ewnî yê Sîweregî wek têbinîyekê dibêje ku Bîbî ji Hîzanê ye.²³⁴

Xêncî van her sê alimên Hîzanê ku Şerefxan behs dike, çend alimên din ên mezin ên ji Hîzanê yên serdema mîrekîtiyê hene.

2.4.Mele Emerê Gulpîkî

Mela Emerê Gulpîkî ji gundê Gulpîkê ye û alimekî serdema mîrekîtiya Hîzanê ye. Gulpîk gundekî bajarê Hîzanê ye. Ev gund dikeve bakûr û rojavayê bajêr. Di navbera gundê Xoros û Kilîbyan de di devê çem û di gelî de cih digre. Gelek zanayên mezin ji gundê Gulpîkê rabûne. Yên wekî Mela Xelîlê Sêrtî, Mela Îsmail jî ji wî gundî ne. Mela Emerê Gulpîkî di sedsala nozdehan de li derdorê salên pêşî yên çarîka duyem ji dayîk bûye. Ev jî tqriben tê derdora salên 1830yî. Mela Emer wekî pîraniya feqiyên herêma mîrekîtiya Hîzanê di gelek medreseyan herêmê de xwendiyê. Tê gotin ku Mela Emer piştî medreseya Gulpîkê li medreseya Kûlatê, Xorosê û Cizîra Botan jî xwendina xwe domandiye.²³⁵

Mela Emer kesekî fiqrebêj û nuktedan bû. Ew bi vê taybetiya xwe navdar bû. Tê gotin gelek fiqre û nukteyan wî hene ku li medreseyan tên gotin. Xasma li herêma Hîzanê û ligelek herêmên din jî gava dabaja navê Mela Emerê Gulpîkî tê kirin, fiqreyên wî xweberê tên bîra mirov. Ev fiqre û nukteyan Mela Emer bi awayekî perekende ji hêla hin ehlê medreseyan ve hatine nivîsîn. Lê bi awayê pirtûk nehatine

²³⁴ Şeref Han, *Şerefname*, Türkçeye Çeviren: M. Emin Bozarlan, Deng Yayınları, İstanbul 2011, r. 269.

²³⁵ Sağniç, b.n, r. 527.

berhevkin. Feqî Huseyîn Sağniç di pirtûka xwe ya bi navê Dîroka Wêjeya Kurdî de behsa jîyana Mela Emer dike û ji fiqre û nukteyên wî nimûneyan nîşan dide.²³⁶

Di edebiyata Kurdî ya serdema mîrektiyan de qasî ku em dizanin, nimûneyên fiqre û nuktedaniyê tunene; yanî hebin jî em nizanin. Lewra di vê hêlê de hê lîkolînên berfireh nehatine kirin. Lewma girîngiya kesayetiyên edebî yên wek Mela Emer zêdetir dibe. Ji ber vê qasê jî divê li ser Mela Emer û berhemên wî xebatên berfihrtir bêne kirinê.

2.5.Mela Mûradê Xorosî

Di serê sedsala 19. de jiyaye. Ji gundê Xorosê ye. Xoros gundekî Hîzanê ye ku bi derxistina aliman navdar e. Tê gotin ku Mela Mûradê Xorosî zanyarekî dema Sibxetullah Arwasî bûye. Îtibara wî li cem Sibxetullah Arwasî gelekî pir bûye.²³⁷

3. ALIMÊN BI HÎZANÊ RE PEYWENDÎDAR

3.1. Seyda Şêx Ebdurrehmanê Taxî

Şêx Ebdurrehmanê Taxî ji wan alim û zanyaran e ku bi eslê xwe ji Hîzanê ye lê paşê ji Hîzanê koç kiriye, çûye cihekî din, yanî memleketekî dî.

Taxî di salên 1831 de li Taxê hatiye dunyayê. Taxî ji ber ku beriya qedandina serdema mîrektiyan, yanî beriya 1850 hatiye dunyayê û qasî kut ê xuyanê salên xwe yê tehsîlê di medreseyên serdema mîrektiyan de derbas kiriye, em wî wek zanyarekî serdema mîrektiyan dihesibînin. Piştî qedandina tehsîla medreseyê, bûye muderîsê medreseya Taxê. Seydayê Taxî paşê bûye xelîfeyê Şêx Sibxetullahê Arwasî yê li Keydaya Hîzanê. Wuhareng terîqeta Nexşebendî ya ku Mewlana Xalidê Bexdadî yan jî Şehrezorî ji Hîndîstanê anîbû, ji Mewlana Xalid bi sîlsîleya Seyyîd Tahayê Nehrî û xelîfeyê wî Şêx Sibxetullahê Arwasî tê Hîzanê. Şêx Sibxetullahê Arwasî ku wek Xewsê Hîzanî jî tê naskirin û Seydayê Taxî, vê ekola tesewwufê li piraniya herêma

²³⁶Sağniç, h.b., r. 527.

²³⁷Çiçek, b.n., r. 671.

Hîzanê û Serhedê û her wisa jî li hin coğrafyayên alema Îslamê belav dikin. Taxî di sala 1887an de li Norşîna Bidlîsê wefat dike.²³⁸

3.2.Seyyîd Sibxetullahê Arwasî

Arwasî jî wan alim û zanyaran e ku ji cihekî hatiye û li Hîzanê bi cih bûye. Seyyîd Sibxetullahê Arwasî ku bi leqeba Xewsê Hîzanî navdar e, ji gundê Arwas a girêdayî Mukusa Wanê ye. Mukus jî di serdema Mîrektiyan de mîrektiyeke Kurd a girîng bû û ji hêla erdnîgariyê ve bi herêma Hîzanê re cînar e. Arwasî heta salên 1829an li Wanê bi ilmê Îslamî re meşxul bûye. Ji Şêx Xalidê Cezerî ku xelîfeyê Mewlana Xalidê Bexdadî Şehrezorî El-Muceddîdî ye, dersa terîqeta Neqşebendîtiyê girtiye. Paşê di salên 1840î de li herêma mîrektiya Hîzan li gundê Xeydayê ku nêzîkî Hîzana qedîm e, bi cih dibe.

Seyyîd Sibxetullahê Arwasî bi ilm û îrşada tesewwufê di herêmê de wek Xewsê Hîzanî nav û deng dide. Piştî wefata Şêx Xalidê Cezerî, bi wesîla Mela Mûradê Xorosî ji Ji Seyyîd Tahayê Nehrî yê Şemzînanî ku xelîfeyekî girîng ê Mewlana Xalidê Şehrezorî ye, ders digre û dibe tabiyê wî. Taybetiya usûla wî wek ya Mewlana Xalid, dersên medreseyên Kurdan û ilmê terîqetê, terîqeta Neqşî bi hev re dida telebe û murîdên xwe. Çar xelîfe li dû xwe hîştine: Kurê xwe Şex Bahauddînê Arwasî, Mela Xalidê Olekî, Mela Ebdurrehmanê Taxî û Mela Ebdurrehmanê Botanî.²³⁹

3.3.Abduhadî El Arwasî

Di serê sedsala 19. de jiyaye. Yek ji muderrisên Medreseya Meydanê ye. Mela Xelîl dersên Mentiqê jê girtiye.²⁴⁰ Qasî ku ji paşnav û leqebê wî tê zanîn, ew jî wek Seyyîd Sibxetullahê Arwasî, ji gundê Arwasê yê li ser Muksê Wanê hatiye Hîzanê. Li Medreseya Meydanê seydatî kiriye û ders daye.

²³⁸ Ömer Pakiş, "Seyyid Sibğatullah El -Arwasî ve Şeyh Abdurrahman Et-Tağî", *I. Uluslararası Düünden Bugüne Tatvan veÇevresi Sempozyumu*, Beyan Yayınları, Ankara 2008,r.588.

²³⁹ Ömer Pakiş, "Seyyid Sibğatullah El -Arwasî ve Şeyh Abdurrahman Et- ağî", *I. Uluslararası Düünden Bugüne Tatvan veÇevresi Sempozyumu*, Beyan Yayınları, Ankara 2008,r.590.

²⁴⁰ Çiçek, b.n., r. 670.

4. REWŞA EDEBIYATA KURDÎ LI MÎREKTIYA HÎZANÊ

Gava meriv li serdema klasîk û herêmên ku lê edebiyata Kurdî derketiye holê û geş bûye dinêre, hin taybetiyên wan ên hevpar derdikevin pêş. Ev taybetî, wek hebûna îstiqrareke sîyasî, çêkirin û xwedîderketina mîr û hukumdaran a li dezgehên xwendinê û hwd. xwe nîşan didin. Meriv van hemû bingeş û paşxaneyên dîrokî yên girîng li mîrekiya Hîzanê dibîne. Li ser van binaxeyan digel zanyariyeke dînî ya xurt, edebiyateke Kurdî ya nivîskî jî şax vedaye.

Li mîrekiya Hîzanê wuhareng ekoleke çanda nivîskî û edebî çêbû. Ev edebiyatnasên herêma mîrekiya Hîzanê wek berdewamiya tradîsyoneke şair û edebiyatnasên Kurdînivîs in ku rêça Eliyê Herîrî, Melayê Cizerî û Ehmedê Xanî hwd. dişopînin. Qasî ku tê xuyanê ev ananeya li Hîzanê ya di edebiyata Kurdî de ji *Yûsuf û Zuleyxaya* Selîmiyê Hîzanî destpê dike, bi *Nehcul Enama* Mela Xelîlê Sêrtî, Axaokê Bêdarî û bi yên mayî ve, berdewam dike.

Em ê aniha li ser edebiyatnasên Hîzanî û yên bi Hîzanê re peywendîdar yên serdema mîrekiyê, yanî yên heta nêveka duduyan a sedsala XIX. bisekinin û di derbarê wan û xebatên wan de agahî bidin. Paşê jî em ê wek nirxandin û paşgotinê, di derbarê taybetiyên edebiyata Kurdî ya mîrekiya Hîzanê de çend xalên girîng destnîşan bikin.

4.1. Edebiyatnasên Hîzanî Yên Kurdînivîs

4.1.1. Selîmiyê Hîzanî

Selîmiyê Hîzanî di nêveka duyem a sedsala 18an de hatiye dunyayê. Yek ji girîngtirîn edîb û helbestvanekî serdema mîrekiya Hîzanê ye. Tê gotin ku gelek behrem nivîsîne. Heta qala dîwaneke wî ya têkûz jî tê kirin. Lê vê gavê xêncî mesnewiya wî ya girîng a bi navê “Yûsuf û Zuleyxa” yê tu berhemên wî bi dest me neketine.²⁴¹

Çavkaniya sereke û herî girîng a di derbarê jiyana Selîmiyê Hîzanî de berhema wî ya bi navê “Yûsuf û Zuleyxa” ye. Navê “Selîm” di mesnewiya wî de çar

²⁴¹ Feqî Huseyn Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2002, r. 449

caran derbas dibe. Helbestvan navê xwe di beşên tewhîd, munacat û xitameyê de wek “Selîm/Selîmî” derc kiriye. Di beşa “tewhîh û tehmîd”ê de awha dinivîse:

Ya Reb bi cemala Zatê sermed
Azad bikî Selîmiyê bed

Di behsa “Ne’tê Resûlullah” de navê wî û dîroka nivîsîna “Yûsuf û Zuleyxa”yê bi “hesabê ebcedê” derbas dibe.

Ya Reb Selîmiyê gunehkar
Mehrûm nekî bi heqqê muxtar

Lewra ku ziyade ew şenî’ e
Ehmed tu bikî ji bo şefî’ e

Aza tu bikî ewî Tu şa kî
Bo xatirê nûrê Mucteba kî

Sed barî şukur di dewrê axir
Ev “name” te kir ji bo me zahir

Lewra bi hikayetê seniye
Tarîx ji îsmê “Heq xenî ye”²⁴²

Di beşa 42. a mesnewiyê de di wê hengamê de ku Yûsuf û birayê xwe yê Yaqûb digihêjin hevûdu, dîsa navê helbestvan wek Selîm derbas dibe. Wekî din di xatimeya beşa dawîn de jî navê wî heye:

Ev reng dibûne ziyade dilşad
Ya Reb tu bikî Selîmî azad

²⁴² Ayhan Geverî, *Yûsuf û Zuleyxa Selîmiyê Hîzânî*, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2013, r. 42

Wehhab û Kerîm û hem Rehîm î
Mehrûm nekî ji xwe Selîmî

Navê Selîmiyê Hîzanî di nav gel de jî wek “Selîm” tê zanîn. Digel vê yekê nivîskarê dîroka edebiyata Kurdî Qanatê Kurdo ji vî edîbî re dibêje “Selîm Suleyman”. Lewra di arşîva Moskovayê de bi vî navî hatiye qeydkirin. Qanatê Kurdo ev agahî ji ber xebata Rudenkoyê girtiye û di vê derheqê de dibêje ku:

“ Li kitêbxana Lenîngradê da ya bi navê Saltîkov-Şêdrînda bi melûmatiyêd A. Jaba li nav nivîsarêd Kurdî da yêd ewî anîbûne Pêterbûrgê destnivîsarek bi sernavê “Ûsib û Zelîxe” heye. Ew destnivîsar ya Selîm Sulêman e. A. Jaba nivîsiye ku Selîm Sulêman hemdemê Şerefxan Bitlîsî bûye (XVI-XVII), şayir û dengbêjê Mîr Şeref mîrê Hîzanê bûye. Xên ji vê em tiştêkî derheqa wî da nizanin. Ne eyan e kîjan salê, li kî derê û ji kîjan neslê ew ji daykê bûye. Li axiriya destana xwe da ya “Ûsib û Zelîxe” da ewî her nivîsiye ku ew hêsîrê mîrê Xîzan bûye:

Selîm dil men Sulêman im
Esîrê mîrê Xîzan im.”²⁴³

Lêbelê qasî ku tê xuyanê ev malika ku li jor hatiye dayîn, tu eleqeyêke wê bi mesnewiya “Yûsuf û Zuleyxa”ya Selîmiyê Hîzanî re tune. Lewra wezna wê û ya *Yûsuf û Zuleyxa* yê ji hevûdu nagrin. Malikên mesnewiya Yûsuf û Zuleyxa yê ji deh kiteyan pêk tên û wezna wê ya erûzê li ser behra bi tefileyên “*mef’ûlu / mefa’ilun / fe’lun*” in. Lê ev malika ku di dawîya mesnewiyê de hatiye derckirin, ji heşt kiteyan pêk tê û weznê wê yê erûzê jî li weznê mesnewiyê nayê. Weznê wê yê erûzê bi tefileyê “*Mefaîlun / Mefaîlun*” e. Digel ku bi dehan destxetên vê mesnewiyê hene; lê ev malik tenê di dawîya nusxeya Rudenkoyê de heye. Wisa dixuyê ku ev beyt ne girêdayî metnê mesnewiyê ye. Wekî ku Qanatê Kurdo neqil kiriye, ew li “axiriya destanê” hatiye nivîsîn. Xuyaye ev şîr ya Selîm Silêman e û bi awayekî di bin nusxeya Rudenkoyê de hatiye derckirin. Ev beyt təkiliya şair û mîrê Hîzanê nîşan dide. Jixwe di beşa “Medhiye”yê ya mesnewiyeyê de ya bi sernavê “Medhiyeya

²⁴³ Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî-I*, Weşanên Roja Nû, Stockholm 1983, r. 103

Derheqê Emîrê Hîzanê ye” de ev têkilî eşkereye. Lê tiştê girîngtir ew e ku divê em bipirsin ka kî ye? Kengê jiyaye? Lê ne Rudenkoyê û ne jî Qanatê Kurdo derbarê wî mîrê Hîzanê de tiştê negotîne. Hevdembûna Selîm Silêman û Şerefexanê Bidlîsî zeîftirîn îddîa ye û derheq vê gotinê de îspat û delîlek jî nehatiye dayîn. Ji xwe jî metnê destnivîsên mesnewiyê eşkere bûye ku Selimiyê Hîzanî ev metn du sed sal piştî Mîr Şerefê Hîzanî nivîsiye.²⁴⁴

Wekî piraniya şairên serdema edebiyata klasîk, Selimiyê Hîzanî jî di beşa “Ne’ta Resûlullah” de tarîx derc dike. Di vê beşê de dîroka nivîsîna vê berhema xwe bi hesabê ebcêdê qeyd kiriye. Selimiyê Hîzanî di vê beşa “Yûsuf û Zuleyxa”yê de awha dibêje:

“Lewra bi hîkayetê seniyye
Tarîx ji îsmê Heq xenî ye”

Anegorî vî hesabî tarîxa ji peyva “Heq xenîye” derdikeve, sala 1173yê Hîcrî / 1759ê Mîladî ye. Ev tarîx dîroka nivîsîna vê berhemêye.²⁴⁵

Hemû lêkolînerên ku heta niha li ser mesnewiya “Yûsuf û Zuleyxa”yê xebitîne dibêjin ku ew mîrê Hîzanê ku Selimiyê Hîzanî di mesnewiya xwe de medha wî kiriye û berhema xwe pêşkêş kiriyê, navê wî nayê zanîn. Ayhan Geverî ku xebateke berfireh li ser kiriye, dibêje ku derheqê wî mîrî de tiştê nayê zanîn.²⁴⁶ Feqî Huseyn Sağniç jî bi texmînî û li gor gotegotên nav xelqê Hîzanê, dibêje ew mîrê ku Selimiyê Hîzanî di dewra wî de jiyaye û di berhema xwe de medha wî kiriye, Mîr Şerefê mîrê Hîzanê ye. Sağniç derheq vê îddîaya xwe de tu belge, delîl û yan jî wesîqeyekê nîşan nade. Ji xwe bi xwe jî dibêje ku ne li gor agahiyekê, bîlakîs li gor gotegotên devê ehlê Hîzanê vê texmînê dike.²⁴⁷

Lê li gorî encama lêkolînan ku me di vî warî de kirin, ew mîrê ku Selimiyê Hîzanî mesnewiya xwe pêşkêş kiriyê û di berhema xwe de pesnê wî daye, Mîr Suleyman e. Lewra mîrê Hîzanê ye ku serdema hukumdariya wî rastî nivîsîna

²⁴⁴ Geverî, b.n. r. 55.

²⁴⁵ Geverî, h.b, 45; Mizûrî Evdirrehman. (1994). “Hozanvanê Kurd Selîmê Hîzanî û Berhemê Wî Yûsûf û Zuleyxa”, *Karwan*. Hejmar: 93. (Neql ji Geverî)

²⁴⁶ Geverî, b.n. r. 55.

²⁴⁷ Sağniç, b.n., r.

mesnewiya Yûsuf û Zuleyxayê tê, Mîr Suleyman e. Em vê yekê ji agahiyên li ser kêla Mîr Ebdî fêm dikin. Li gor nivîsa li ser kêlikê mezêlê Mîr Ebdî yê mîrê Hîzanê, ev mîr bi xwe di sala 1825ê Mîladî de wefat kiriye û kurê Mîr Suleymanê mîrê Hîzanê ye. Merzêlê Mîr Ebdî li gundê Taxê ku bi medreseya xwe navdar e, li kêleka medreseya Taxê ya dîrokî ye. Li hêla rojavayê medreseyê merzêlê Mîr Ebdî ku avakarê medreseyê ye û yê jin û zarên wî hene. Mîrê wê serdemê Mîr Ebdî, jinên wî Mîranete Xatûn û Pakîze Xatûn li vir hatine defînkirin. Qesra Mîr Ebdî di nav kela Taxê de ye. Kela hema li hemberî medreseyê ye. Li ser kêlikê Mîr Ebdî wek dîroka wefatê, Hicrî: 1241 (zayînî: 1825) dinivîse. Dîroka wefata jina wî ya Mîranete Xatûnê, Hicrî: 1237 (z: 1821) û ya Pakîze Xatûnê ku keça Mîr Esad e, Hicrî: 1256 (1840) ye. Li ser kêlikê Mîr Ebdî dinivîse ku Mîr Ebdî kurê Mîr Suleyman e.²⁴⁸

Mîr Ebdî yê 1825an de wefat kiriye temenekî wasatî yê şêst-heftê salî derbas kiribe, jidayîkbûna wî teqrîben tê salên 1755-1765an. Bavê Mîr Ebdî Mîr Suleyman jî muhtemelen di navbera salên 1745-1775an de mîrtiya Hîzanê kiriye. Ew dîroka ku Selîmiyê Hîzanî mesnewiya xwe ya *Yûsuf û Zuleyxa* nivîsiye û îthaf û pêşkêşî mîrê hîzanî kiriye, 1759 e. Ev dîrok jî dikeve navbera salên hukumdariya Mîr Suleyman. Lewma bi qenaeta me ew mîrê ku Selîmiyê Hîzanî di mesnewiya xwe de qala wî dike, Mîr Suleyman e. Her wisa ew malika wek “Selîm dil men Sulêman im / Esîrê mîrê Xîzan im” ku wek destnîşanekê di dawîya mesnewiya *Yûsuf û Zuleyxayê* de ye, di hêlekê de wek bi gotineke girtî ya bi *hunerê tewriyeyê* ku ji du maneyên gotinê, qesta maneya dûr dike. Yanî bi maneya nêz û zahir Hz. Suleyman Pêxeberê ku bi hukumdariya xwe navdar e tîne bîra meriv û di hêla din de jî rasterast qesta mîrî Hîzanê yê bi vî navî dike. Her wisa dibe ku di çarçoveya *huner tezatê* de bi gotina “Selîm dil men Suleyman im” dewlemendiya dilê xwe, bêminnetî û îstixnaya xwe tîne ziman. Digel vê yekê, bi gotina “Esîrê mîrê Xîzan im” jî bi dîlbûn û esîrbûna xwe ya ji mîrê Hîzanê re îftixar dike. Ev malika ku wek îmzayekê li dawîya mesnewiyê, qenaeta me ya di vê hêlê de zêdetir dike.

²⁴⁸Çiçek, b.n., r.665.

Peywendiya Selimiyê Hîzanî Digel Mîrê Hîzanê

Ji beşa methiyeyê ya mesnewiya *Yûsuf û Zuleyxayê* ya Selîmiyê Hîzanî tê fêmkirin ku Hîzanî şairekî serayê ye û helbestvanê qesra mîr e. Selîmiyê Hîzanî weka gelek helbestvanên Kurd ê serdema mîrektiyan berhema xwe, helbestên xwe pêşkêşî mîr û hukumdarekî Kurd kiriye.²⁴⁹ Ji teswîr û danasînên Selîmiyê Hîzanî yê derbarê wesf û taybendmendiyên Mîrê Hîzanê derdikeve holê ku mîrê Hîzanê di hêla hukumdari, desthilatdari û rêvebiriya hukumeta xwe de kêmtirê ji şah, padîşah û melîkên Fars, Tirk û Ereben cînar, nîne. Lewma hewcedari bi pêşkêşiya berhema xwe ya bi wan nedîtiye. Bîlakîs pêşkêşî mîrê mîrektiya herêma xwe, mîrê Hîzanê kiriye. Ev beşa methiyeya mesnewiya wî vê yekê bi awayekî êşkere nîşan dide:

Ger medhê bikin ji bo Emîr e
Alem ku hemû bi wî xebîr e

Her medhê hêja ji bo Xweda ye
Lewra ku ezîm e, Kibriya ye

Ev erz û sema û cumle ekwan
Ew hemdê dikin ji bo wî Rehman

Ew laiqê hemd û hem senayê
Ya qenc ew e em bikin duayê:

Ya Rebbî bi heqqê mahê Kenan
Mehfûz bikî Emîrê Hîzan

Ya Rebbî bi heqqê îsmê Ezem
Duşmen ku bibin ji dest wî mulzem

Her çi ku bibit ji bo wî duşmin
Çavek birêjin ku bête ber min

²⁴⁹Geverî, b.n, 45.

Ya Reb bi letafeta hekîman

Azad bikî Emîrê Hîzan

Edlê Tu bikî li wî zîyade

Rehmê tu bikî li wî îfade

Mehfûz bikî ewî bi şewket

Mexsûs bikî ewî bi dewlet

Xalî nekî tu ji dest wî îhsan

Her wext û zeman biçîte dewran

Roja ku bibîte heşr û mêzîn

Wechê wî bike Îlahî nûrîn

Ya Rebbî bi cahê nûrê Yasîn

Meqbûl bikî dua ku amîn.²⁵⁰

Ev beşa medhiyeyê ya mesnewiyê dide nîşandan ku di edebiyata Kurdî ya li mîrekiya Hîzanê de jî wek hin mîrekiyên Kurdan ên wek Cizîrê, sîstema patronajê heye. Çawa ku şairê patronajê yê mîrekiya Cizîra Botan Melayê Cizîrî ye,²⁵¹ şairê patronajê yê Hîzanê jî Selîmiyê Hîzanî ye. Mîrê ku Selîm li gor têkiliya vê pergalê, berhema xwe pêşkêş û îthaf kiriyê û ji bo wî methiye nivîsiye, qasî ku em zanin Mîr Suleymanê Hîzanî ye.

²⁵⁰Geverî, h.b., 63.

²⁵¹Ergün, b.n., r. 205

4.1.2. Mela Xelîlê Gulpîkî (Sêrtî)

Nisbeta Mela Xelîlê Sêrtî her çiqas bi bal Sêrtê ve tê kirin jî ew di eslê xwe de xelkê devera Hîzanê ye.²⁵² Herwisa li Hîzanê hatiye dinê, qismekî girîng ê jiyana xwe, tehsîl û seydatiya xwe li wir derbas kiriye. Lewma li gor krîtera nîsbeta herêmî ku me li jor qal kiribû,²⁵³ ew edebiyatnasekî Hîzanî ye. Mela Xelîl di sala 1750²⁵⁴ yan jî 1751²⁵⁵ ê mîladî de hatiye dinê. Di derheqê dîroka ji dayikbûna wî de rîwayetên muxtelîf hene. Hinek vê dîrokê hetanî sala 1754²⁵⁶ an jî dibin. Lê piraniya çavkaniyan tarîxa ji dayikbûna Mela Xelîlê Sêrtî 1750î nişan didin.²⁵⁷ Li ser kêla mezêlê wî jî dîroka ji dayikbûna wî wek 1750 nivîsandiye. Li ser cîhê ji dayikbûna Mela Xelîl tu îxtîlaf nîne. Çavkaniyên di vî warî tev cîhê ji dayikbûna Mela Xelîl gundê Gulpîkê yê li ser bajarê Hîzanê nişan didin.²⁵⁸ Gund dikeve bakûrê Hîzanê. Ji vî gundî gelek kesên zana, edîb û helbestvan derketine. Mela Xelîl jî yek ji wan e. Jixwe ji malbata Mela Xelîl re digotin “Mala Mela”. Navê bavê wî Mela Hesên, navê bapîrê wî Mela Xalid e.

Mela Xelîl li Gulpîkê mezin bû. Hê di zaroktiya xwe de bi hişmendî û qabiliyeta xwe ya hîfzê, balê dikişîne ser xwe. Pêşî li cem bavê xwe dest bi xwendina Qurana Pîroz kir. Piştî qedandinê, bi awayekî bêrawestan dest avête pirtûkên fiqhê. Demeke ne pir dirêj di medreseya bavê xwe de ma û bi ser xwendinê ve bû. Paşê mîna piraniya feqiyên Kurdistanê bi destûr û şîretên bavê xwe derbasî medreyên cur be cur bû û li cem seydayên cur be cur ên navdar xwend. Mela Xelîl bi ezmeke mezin ji hemû deriyên asê û astengên dijwar ên li pêş tehsîla ilmê derbas bû û ew quflên mifte lê nayên bi hêsanî vebûn. Dawiya dawî kitêbên xwe di medreseya

²⁵² Adak, Abdurrahman; “Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmî: Nimûneya Herêma Bedlîsê”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 1/1, Havîn 2016, r. 40.

²⁵³ Bn., r. 74.

²⁵⁴ Tehsîn Îbrahîm Doskî-Hemdî Abdulmecîd Selefî, *Mu'cemu's-Şueari'l-kurd*, Weşanên Spirêz, Duhok 2008, r. 148-149; Maddeya “Mollâ Halîl es-Sî‘irdî”, *Îslâm Âlimleri Ansiklopedisi*, Cild: XVIII, İstanbul, r. 126; Huseyin Şemrexî, *Nehc-ul Enam*, Weşanên Nûbihar, çapa yekem, Stenbol 2012, r. 5; Mustafa Öncü, *Basîretu'l-Kulûb fî Kelâmi 'Allâmi'l-Guyûb Adli Eserinin Arap Dili Açısından İncelenmesi (teza doktorayê)*, r. 20.

²⁵⁵ Alî Nebî Doskî. *Mela Xelîl Es- sîrtî*, Weşanên Spirêz, Duhok, 2007, r. 24.

²⁵⁶ Muhamed Alî Es- Sîwerekî, *Mu'cemu'l E'lami'l Kurd*, Weşanên Bengê Jin, Suleymaniye 2006, r. 261.

²⁵⁷ İbrahîm Gözetin, *Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcul Enam*, Teza Mastîrê ya Neçapkirî ya Sosyal Bilimler Enstitüsü ya Muş Alparslan Üniversitesi, r. 54.

²⁵⁸ Şemrexî, b.n., r. 5.

Îmadiyeyê de li cem seydayê mezin Miftî Mela Mehmûdê Behdînî qedand û destûrnameya xwe stand. Îmadiye jî di serdema mîrektiyan de mîrektiyeke hêzdar a Kurd bû. Her wisa ev mîrektî bi medreseyên xwe û bi seydayên wan medreseyan navdar bû. Mela Xelîl bi vê îcazeta ku ji medreseyên mîrektiya Îmadiyeyê stendibû, êdî dikariya li hemû medreseyên li her deverên Kurdistanê ders bida.²⁵⁹

Mela Xelîl piştî qedandina xwendina medreseyê digel hildana îcazetê vegeriya Hîzanê. Di medreseya Meydanê de qasî pênc salan seyda kir. Medreseya Meydanê nêzikê gundê Gulpîkê ye. Melîl Xelîl paşê diçe Sêrtê û li wir bi cih dibe. Ji wê rojê şûnda bi navê “Mela Xelîlê Sêrtî” tê bi navkirin û umrê xwe yê mayî li vî bajarî derbas dike.²⁶⁰

Navê Mela Xelîl di berhemên wî de û di xebatên li ser kurtejiya wî de wek Xelîl Bîn Mela Huseyîn Bîn Mela Xelîl es-Siîrdî²⁶¹ hatiye nîşandan. Ji bo Mele Xelîl gelek leqeb hatine bikaranîn. Ji ber cihê ji dayikbûna wî leqebê wek “Hîzanî”, “Gulpîkî”, û “Kulatî”, ji ber cihê lê maye û jiyaye leqebê wek “Sêrtî”, ji ber neseba wî wek “Kurdi” ji ber nîsbeta mezhebê wî wek “Şafî” hatiye telqîbkirin. Leqebekî wî jî “Omerî” ye. Ji ber ku li gor hin rîwayetan nesla wî bi saya Siltan Şêxmûsê Zûlî digihêje Hz. Omer. Lewma jê re ev leqeb hatiye gotin.²⁶² Nivîskar di hinek helbestên xwe de “*Li kâtibihi Xelîl Şewqî*” gotiye û mexlesa “Şewqî” bikaraniye.²⁶³ Mela Xelîlê Sêrtî di hinek helbestên xwe de ne bi navê xwe yê rasteqîn, bi navê mustear ê wek “Şewqî” bikaraniye. Abdurahman Adak di derheqê mexlesa “Şewqî” de weha dibêje ku:

“Edebiyatnasê Kurd ê serdema mîrektiyan Mela Xelîlê Sêrtî di mesnewiya xwe ya bi navê Nehcu’l-Enamê de ku gelekî naskirî û belavbûyî ye, di beyta mexlesê de navê xwe yê rastîn emilandiye. Ew beyta ku navê wî tê de derbas dibe eve:

Xelîlê ku ev erz bidaet nebû

Welê ew bi fermana exê xwe bû

²⁵⁹ Sağniç, b.n., r. 413.

²⁶⁰ Sağniç, h.b., r. 414.

²⁶¹ Pakiş, b.n., r.6.

²⁶² Öncü, b.n., r. 20.

²⁶³ Öncü, h.b., r. 23.

Lê wî di helbestên xwe de di beyta mexlesê de ne navê xwe yê rastîn, lê mexlesek cuda ji xwe re hilbijartîye. Ev mexles jî “Şewqî” ye. Lewra ew wekî “Xelîl Şewqî” hatiye naskirin û wî bi xwe jî di serê helbestên xwe de ji bo xwe gotîye “Xelîl Şewqî”. Her weha di sîlsîleyên icazetnameyên ku li medreseyan dihatin sitandin de jî Mela Xelîlê Sêrtî wekî “Xelîl Şewqî” derbas dibe (Seyda, wr. 6b). Lê mixabin ev helbestên ku mexlesa wî di wan de ye, zehf belav nebûne û Mela Xelîlê Sêrtî bi vê mexlesê meşhûr nebûye. Ew bêhtir bi navê xwe hatiye naskirin. Sebebê vê ew e ku helbestên Mela Xelîlê Sêrtî bes di mecmûeyên destnivîsar de mane û nehatine çapkirin. Digel ku mexlesa Mela Xelîlê Sêrtî “Şewqî” ye jî wî di hemû helbestên xwe yên Erebi de jî û di yên Kurdî de jî ev mexles bi kar neaniye. Di nav van helbestên wî yên Kurmancî de Mela Xelîlê Sêrtî bes di helbestekê de ev mexles bikaraniye. Ew beyta mexlesê jî ev e. (Sêrtî, Mecmûe, 1192/1778, wr. 45):

Fidayê wî bibin âed miâlê Şewqî
Ji dor wî kê m nebin óalî we ðewqî

Lê di piraniya helbestên xwe yên Erebi de wî mexlesa “Şewqî” bi kar aniye. Wekî dawî em dikarin bêjin ku du mexlesên Mela Xelîlê Sêrtî hene. Yek ji wan navê wî “Xelîl” e, ya dî jî “Şewqî” ye.”²⁶⁴

Piştî ku Mela Xelîl icazeya xwe ya seydatiyê ji destê Mela Mehmûdê Behdînî wergirtiye, berî ku bê Hîzanê, çuyê gundê Mûsilê yê Reşîdêyê û li wir intisabê Şêx Ehmed Reşîdîyê Qadirî bûye. Ji bilî destûrnameya terîqa Qadirî, destûrnameya terîqa Neqşebendî jî ji bo wî hebû, ku ji Şêx Xalidê Cizîrî wergirtibû.²⁶⁵ Ev Şêx Xalid yek ji xelîfeyên Şêx Xalidê Şehrezorî bû; ewê ku bi navê Mewlana Xalidê Bexdadî meşhûr bûye.

²⁶⁴ Abdurrahman Adak, “Mela Xelîlê Sêrtî Helbestvanê Bi Mexlesa “Şewqî” û Helbestên Wî Yên Kurdî (Kurmancî)”, *Kovara Muqedîmeyê ya Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê*, j. 1, 2010, r. 156.

²⁶⁵ Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Li dor Edebê kurmancî Li sedsala Nozdê û Bîstê Zayînî*, Weşanên Kurê Zanyarî, Kurdistan, Hewlêr 2004, r. 66.

Piştire ew hatiye Hîzanê û li wir ji pênc salan zêdetir li Medreseya Meydanê seydatî kiriye. Paşê li ser daxwaza bavê xwe çûye navenda Sêrtê bi cih bûye. Li wê derê li Medresaya Fexriye bi dayina dersan, perwerdekirina feqîyan û telîfkirina berhemên ilmî temenê xwe borandiye. Naxwe li gor van agahîyan em dikarin bêjin ku piştî 1778an bi herî hindik 5 sal li Hîzanê ders daye û di 1786an de ji wir çûye Sêrtê. Yanî herî kêr di temenê xwe yê 36 salê de çûye Sêrtê û heta wefata xwe 56 sal li Sêrtê jiyaye”.²⁶⁶

Ji zarokên wî Mela Mîstefa li Cizîra Botanê di serdema mîrektiyan de û di dema Mîr Bedirxanê Mîrê Cizîrê de hetanî seraya wî bilind bûye. Û di medreseya wî de muderîstî kiriye û her wisa bûye Şêyxul Îslamê hukumeta mîrektiya Cizîrê.²⁶⁷ Bedûzeman Seîdê Kurdî yê Nûrsî jî di berhemên xwe yên bi navê Risaleyên Nûr de beytên Mela Xelîl neqil dike û wî wek merciyeke payebilnd destnîşan dike û dibêje “Zatekî muheqqîqê pir meşhûrê ku gotinên wî huccet e li ba me.”²⁶⁸ Wî di gelek warên ilmê de behremên hêja nivîsîne. Ji bilî berhemên wî yên Kurdî yên wek *Qesîde* û *Tecwîda Kurdî* û *Nehcul Enamê*, gelek kitêbên wî yên bi Erebbî jî hene.²⁶⁹

Li ser wefata tarîxa Mela Xelîl îxtîlaf heye. Lê di piraniya çavkaniyan de tarîxa wefata wî wek sala 1259/1843 derbas dibe. Li ser cihê wefata Mele Xelîl de tu îxtîlaf tune. Di hemû xebatên ku li ser Mela Xelîl û berhemên wî de cihê wefata wî wek Siêrt tê nîşandan.²⁷⁰ Mela Xelîl di 96 saliya umrê xwe de çûye rehma Xwedê. Li rojhilatê bajêr, li goristana Bileyliyeyê hatiye definkirin. Mela Xelîl li pey xwe çar zarok hîştine. Seyda Mela Mustefa kurê wî yê mezin e. Ew li Ciddeyê medfûn e û li ser kêla bavê xwe bi Erebbî mersiyekek nivîsiye.²⁷¹ Qismek ji wê mersiyyê:

²⁶⁶ Şemrexî, b.n., r. 5

²⁶⁷ Öncül, b.n., r.23

²⁶⁸ Bedûzeman Saîd Nursî, *Mektubat*, Weşanên Zehra, Stenbol 2013, r. 75.

²⁶⁹ Şemrexî, b.n., r. 5

²⁷⁰ Şemrexî, h.b., r. 5.

²⁷¹ Adak, b.n., r. 31.

“Efelet Şemsul Bedî fîl Ulûmî
Înna lillâhî we îinna îleyhî racîun
Qemerun hele bî Hîzan e, bî Îs’îrde xereb e
Neşerel Îlme, feehlul Îlmî mîn hû axîzûn”²⁷²

Kurdî ya wê:

Rojeke bêmisîl çû ava li nav ilmê
Em ji Xweda hatine û em ê vegerim bal Wî
Heyvek hilat li Hîzanê û li Sêrtê çû ava
Wî ilim belav kir û ehlê ilmê ew jê hilda

Ciyê Wî Di Edebiyata Kurdî de

Mela Xelîl, di gelek şaxên ilmê dînî de û her wisa di ilmê edebiyatê de pispor e. Di gelek warî de berhem nivîsiye. Di şaxên ilmê yê wê serf, nehew, belaxet, mentiq, munazere, cedel, wezi’, eqîde/kelam, hedîs, fiqih, tefsîr, tecwîd, tesewuf, mewlîd û şemalê de berhemên wî hene. Hejmara berhemên wî zêdetirê ji bîst û pêncan e. Piraniya berhemên xwe bi Erebî nivîsîne. Çend berhemên xwe jî bi Kurdî telîf kirine. Yê bi Kurdî nivîsîne, berhema wî ya navdar *Neh-cul Enam, Risaleya Tecwîdî* û çar qesîdeyên wî ne. Her weha berhemên wî hin mewzûn in û hin jî pexşan in. Heta di hin berhemên xwe de her du jî yanî hem cureyê nivîsa pexşan û hem jî ya mewzûn bi hev re bikaraniye.²⁷³

Navê berhema wî ya bi Kurdî ya navdar di çavkaniyan de wek “Nehcul Enâm fil Eqâid”²⁷⁴ derbas dibe. *Nehcul Enam* berhemeke girîng a edebiyata dînî ye. Ev pirtûk berhemeke dîdaktîk a exlaqî ye jî. Di medreseyên Kurdan de wek pirtûka dersê hatiye bikaranîn. Di asta perwerdehiyê ya seretayî û navîn de tête xwendin. Ev

²⁷² Ahmet Kırkan, “Mela Xelîlê Sêrtî”, *Nûpelda*, Hejmar: 19, 2015, r. 46.

²⁷³ Öncü. b.n., r. 25.

²⁷⁴ Öncü, h.b.n., r. 31.

berhema menzûm ku ji bo perwerdehiya xwendekarên medreseyan hatiye amadekirin bi teşeya mesnewiyê hatiye nivîsandin.²⁷⁵ *Nehcul Enamtê* maneya “rêya gel/xelqê.” Ev behrem li ser weznê erûzê hatiye nivîsîn. Li ser behra muteqarib a meqsûr (feûlun, feûlun, feûlun, feûl) hatiye hûnandin. Mirov dikare naveroka *Nehcul Enamê* di du beşên sereke û bist û du binbeşan de dabeş bike. Serbeşa yekem di derheqê eqîdeyê de ye û ya duduyan di derheqê exlaqê de ye. Her wisa du sed û heftê sê beytan pêk tê.²⁷⁶

4.1.3. Axaokê Bêdarî

Helbestvanekî din ê serdema Mîrektiya Hîzanê Axaokê Bêdarî ye. Bêdar gundekî Spayirtê ye. Spayirt jî nehyayeke Hîzanê ye. Ev gund dikeve navbera Hîzan û Miksê.²⁷⁷ Tê gotin ku Axaokê Bêdarî wek berhem dîwan û nesîhetnameyeke hêja li dû xwe hiştiye. Lêbelê ev her du berhemên wî winda ne û heta niha nehatine dîtinê. Helbestên wî bi awayekî perekende li nav Seyda, mela û feqiyên medreseyan Hîzanê û li herêmên der û dorê têne zanîn. Hin ji van helbestan bi awayekî nivîskî jî hatine berhevkirin; lê hê nehatine çapkirin û xebat li ser wan nehatine kirin. Xêncî dîwana wî ya winda, hef-heşt helbestên wî hene û têne zanîn.²⁷⁸

Celadet Elî Bedirxan di maqaleya xwe ya navdar de ku bi navê Herekol Azîzan bi sernava “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” di Hawarê de nivîsîbû, di derheqê Axaokê Bêdarî de awha dibêje ku:

“Me tu eserên vî şairî nedîtine. Me bi tenê navê wî seh kiriye. Rawiyan gote me ku Axayê Bêdarî gelek guh daye zimên û çiqas jê hat ew çend bêjeyên Erebbî û Farisî nexistine şî'rên xwe. Mela û Jaba qet qala vî şairî nekirine. Dibêjin ku Axa di pey Batê re rabûye. Ji lewra me ew daniye vê derê.”²⁷⁹

Ji mersiye ya wî ya ku di sala 1140/1727an de li ser koça dawiyê ya du kurên xwe nivîsiye derdikeve holê ku du lawên wî di eynî salê de wefat kirine. Lawekî wî

²⁷⁵ Adak, b.n., r. 329.

²⁷⁶ Gözetin, b.n., r.

²⁷⁷ Adak, b.n., r. 263.

²⁷⁸ M. Reşîde Hirîfî, “Axaokê Bêdarî”, *Nûbihar*, Hejmar: 110, r. 25.

²⁷⁹ Herekol Azîzan, “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” *Hawar*, II, Stokholm 1998, r. 813.

sêzdeh salî bûye û yê din jî panzdeh salî. Serdem û salên ku Axaokê Bêdarî tê de jiyaye, ji vê dîroka derckirî ya di risteyeke beyta mersiyeyeke wî de, eşkere dibe.²⁸⁰

Ew riste û beyta wê mersiyeyê ev e:

“Her di weqtê ev musîbet Heq li ser min aniye
Sal hezar û sed û çil bûrîn ji Hîcra ummî ye”²⁸¹

Li gorî hin çavkaniyan, Ebdurreqîb Yûsuf di rojnameya “Rûzî Kurdistanê” de di derheqê wî de maqaleyek weşandiye (j. 50, Sal: 1978).²⁸²

Axaokê Bêdarî ji wan helbestvanan e ku kêma helbestên wan gihîştine roja me ya îroyîn. Bêdarî di helbestên xwe de mexlesa “elîf” û “xeyn”ê bi kar aniye. Wihareng bi vêya îşaretî bi bal navê xwe kiriye. Ev her du herf jî ji herdu herfên pêşî yên navê wî pêk hatine. Tê xuyan ku Axaokê Bêdarî di bikaranîna mexleseke bi vî awayî de di bin bandora Feqiyê Teyran de maye. Lewra Feqiyê Teyran jî di helbestên xwe de mexlesa “Mîm” û “Hê” bikaraniye. Ew jî herdu herfên pêşî ên navê Feqî yê “Muhemmed” in.²⁸³ Mesela di helbesta wî ya bi navê “Dîwarê Dinê” de ev yeka han tê xuyanê.²⁸⁴

Cihê Axaokê Bêdarî Di Edebiyata Kurdî de

Axaokê Bêdarîhelbestên xwe bi Kurmanciyeyeke rewan û rihet nivîsîne. Di zimanê wî de hêzdarî û herikbariyeyeke di dereceya hunerê *sehlê mumteni* de li ber çavan dikeve. Yanî bi awayekî wisa sade û zelal dibêje ku ji meriv weatrê her kes bi hêsanî dikare tişteki awha binivîse û bibêje. Ji der ve sehl û asan, yanî basît tê xuyanê. Lêbelê gava meriv xwe lê sor bike û bixwaze tişteki wisa çêke û binivîse, ew çax eşkere dibe ku ne wisa ne. Ev yek mumteni e, dijwar e û çetin e. Di vê hêlê de uslûba Feqiyê Teyran bi Axaokê Bêdarî dikeve. Vê uslûba hêsan jî bandora helbestên wî ya li ser gel zêde kiriye û her wisa jî jiberkirin û xwendina wan asan bûye. Wek

²⁸⁰ Adak, b.n., r. 263.

²⁸¹ Hirîfî, g.n., r. 25.

²⁸² Mela Ebdullah Tellî, “Kund jî Birayê Bazê ye”, *Nûbihar*, Hejmar: 65, sal: 1998, r. 30; Selefî û Doskî, r. 112- 113; Adak, b.n., r. 263.

²⁸³ Adak, h.b., r. 264.

²⁸⁴ Binêr, r. 72.

mînak em li helbesta wî ya bi terzê qesîde ya “Kund jî Birayê Bazê ye” binêrin, dê ev şêwe bête xuyanê. Her wisa di helbestên wî yên de jî ev taybetmendî xwe dide der.

Kund jî birayê bazê ye, îlok dibê terlan im ez
Sûret ji rengê ziblê ye, reş reş dibê mercan im ez

Ferqa tehûr û tahirî, ew ker nizanitin çiyê
Şaş daye ber heft mêzeran, dibê Se'd Teftezan im ez

Tawis bi wî şeklê bedî, şermende ye ez saqê reş
Ew qijika gûxwer binêr, qij qij dikit elwan im ez²⁸⁵

Axaokê Bêdarî weznê erûzê jî di helbestên xwe de bi awayekî serkeftî bikaraniye. Mesela Bêdarî qesîdeya li jor a “Kund jî Birayê Bazê ye” li gor weznê erûzê, bi behra Recezê, li ser qalibê salim û bi tefileyên “mustefilun, mustefilun, mustefilun, mustefilun” ê honandiye.

Naveroka helbestên wî dewlemend in. Ji naveroka helbestên wî derdikeve holê ku wî jî wek şairên serdema klasîk di medreseyan Kurd de perwerdehiya ilmên wek fîqih, hedîs, felesefe, edebiyat, dîrok, tesewwufê û hwd. dîtiye. Bêdarî di helbestên xwe de bi giranî li ser mijarên wek hîkmet, heqîqet, rastiya dunyayê, durustî û nixên manewî û însanî disekine. Lewma meriv dikare bibêje ku Axaokê Bêdarî helebestên xwe bi naverokeke hîkmetbar û bi uslûbeke dîdaktîk nivîsîne.²⁸⁶

Wek mînak em li helbesta wî ya ku teşeya nezma wê wek *museddesa muzdemîç* ya bi navê “Dîwarê Dinê” binêrin. Em vê yekê jî bibêjin ku ev pênc helbestên Axaokê Bêdarî ku me li vir nivîsîne, me ji gotara M. Reşîdê Hirîtî ya bi navê “Axaokê Bêdarî” ya di hejmara 110an a kovara Nûbiharê de hatibû weşandin, hildan. Hirîtî hemû helbestên wî wek beyît beyît nivîsîbûn û li gor teşeyên nezmê tesnîf nekiribûn.²⁸⁷ Lê me van risteyên helbestên Bêdarî, qasî ku ji qafîye û hejmara risteyê wan derêxist, ji nû ve li gor teşeyên nezmê tesnîf kir. Lêbelê tê xuyanê di hin helbestan de hin riste û beş kêr in. Ev jî bi qenaeta me, gava helbestên Bêdarî hatine

²⁸⁵Hirîtî, g.n., r. 27

²⁸⁶Hirîtî, h.g., r. 26.

²⁸⁷Hirîtî, h.g., r. 25-27.

berhevkerin û nivîsîn, hin rist û beşên wê nehatine qeyd kirin û berze bûne. Ger rojekê metnên kevtirîn ê van helbesan yan jî dîwana wî peyda bibe, dê ev kêmasî jî sererast bibin.

Hûn werin da jê birevin, lew kevn e dîwarê dinê
Nêrgiza ne serçevîn be, şerm e bêarê dinê
Em bi xwe pê nakevin elbette ev carê dinê
Min tecerrub kir gelek caran xwezî bi parê dinê
Hinde dilsojê hev in lewra ku xeddarê dinê
Hûn werin jê derkevin lew bêwefadarê dinê

Ev dinê merdê vexwûnî cahilê nadan e ew
Hey dikit dîsa vejînê sefneyê xakan e ew
Ê ku xwe tê da hejînî, indaê nanek e ew
Ê xwe tê cahil dibînî, enzelê çoban e ew
Ehlê fedla aliman lew hinde bêzar e dinê
Bifikir carek bibîn çendê ku bedkar e dinê

Ceddê însan Adem e ê ku ji tîne çêkirî
Terkê cennet da û ew hate cîhan jê ra girî
Wî nebiyê erd û ezman hem ji bo wî çêkirî
Qenciyeq tê da nedî lew çû di rewdê êwirî
Bifikir carek bibîn pir xewl û keftar e dinê
Da bi lez zû bar biken derkevin ji dunya denê

Kar û barê vê dinê esla nehin bêderd û xem
Rahetek kê dî di pê ra nedîtî sed elem
Tu nezer de şahê Îranê di îqlêmê ecem
Ibn û bintê wî di dunyayê bûne ebd û xedem
Qet di gel ebdê Xweda sadîq nebû yar e dinê
Hêj li bal me amiyan dildar û xemxwar e dinê

Hindê xasê enbiya esla nema xeyn û elîf

Xatem û Cimsîd û Keyxusr û kuca xeyn û elif²⁸⁸

Ev helbesta Axaokê Bêdarî ya li jêr, hin xusûsiyetên *Terkîbê Bend* nîşan dide. Lê ji ber ku hin beyt û beşên wê kêr in, meriv tam emîn nabe.

.....

Ê miwafîq yek di qelbî mirwet û salek nehişt
Yek bi hesret ma ewî dîtir bi mehcûr dikuşt

Salê ewwel tu dibînî her yek bi mislê şahekî
Salê sanî tu dibînî bûye qûl dergahekî
Salê salis ew bi qîmet qet nahêje gayekî
Salê rabi ew dibîte xakê toza rahekî
Ê cefakêş û cefa çûbûne derwêş û geda
Ê li mala xwe nivîstî debr û xil'et lê veda

Ê te can dayî di ber da ew ji te ne razî ye
Dost ew e yê babê te kuştî zemanê mazî ye
Ê ku ne şerî' li nik pir ez dibînim qazî ye
Sed huner ger te hebin ya niha xerbazî ye

Rêz û tertîbê zemanê çûn ji dunyayê revî
Herduyan ser pêk ve danîn meşweret bûne xefî
Malxwêy û axayê gundan bûne lawên serkefî
Rîsipî bûne şivan lew tene gundanê şevî

.....

Qasî ku em dizanin Axaokê Bêdarî di edebiyata Kurdî de edebiyatnasê pêşîn e ku mersiye li ser ewladê xwe nivîsiye û di helbestên xwe de hicva civakî kiriye. Ev helbesta wî ya wek *mersiye* û di dirûvê *Terkîbê Bend* de ye, vê yekê nîşan dide. Lê di vê helbestê de jî beyt û beşên kêr tên xuyanê. Her wisa, derbarê bûyer û sebebê wefata cotê ewladên wî de, vê gavê, tu agahî neketine destê me.

Xem li ser pişta me hazir bûne barê uştir im

²⁸⁸Hirîtî, g.n., r. 24.

Min du şahî çûne vêkra muptelayê wan kirim
Sed mixabin vê cewabê ez ji dil talan kirim
Taqet û quwwet nema min belkê ez sincan kirim
Leşkerên derdan geha min ji aqil talan kirim
Min nema qet xwe bi carek bêser û seman kirim
Wê dema mesmûê min bû hîcretî cotê biran
Rîş û rih têkda me şil bûne ji avê hêstiran
Wê kulan ez li ser sorgulan ez werdan kirim
Vê demê dîn û teles ez hewceyê dêran kirim

Nê divê Îsa bibînim wê li ku peyda bitin
Nê birînê dil xef in êdî tu car xweş nabitin
Eya Rebbê qadir tu yî derd li canê min pur e
Min ji xanî çûne vêkra rojekê cotek kur e
Ger weled ar e we lakîn ew l inik babê dur e
Cewherek xelqê beyan bûn dî gelek şêrînsur e
Dîtina yewm'îl-qiyamet mûnîsê derdan kirim
Lê ji derd û hesreta wan bêded giryan kirim

Her di weqtê ev musîbet Heq li ser min aniye
Sal hezar û sed û çil bûrîn ji Hîcra ummî ye
Mahê Nîsanê ku roja reş li min bû şembî ye
Lazim e her çi ku heq ket em bi wî bin razî ye
Xeyn elif bes kê ji nal û zarî û ah û derûn
Ew qedaya Barî ye ma kes bi wî çû ket birûn
Saetek te'xîr nabit *wela yesteqdîmûn*
Ku çi Heq ket heq e *inna îleyhî racîûn*²⁸⁹

Ev helbesta Axaokê Bêdarî ya di dirûvê qesîdeyê de ya li jêr ku mijara wê *hîcv* e, yanî nuqurc e, bi qenaeta me meriv dikare wek nimûneyê pêşîn a *hîcva civakî* ya di edebiyata Kurdî de, binirxîne.

²⁸⁹Hirîfî, h.g., r. 25

Eger çêkî ji bo cehşê kerê ra
Ji zêr afir ji nav eywanê Kîsra

Eflatûn be ji bona wî muellim
Bibe saqî ji bo wî Îbnî Sîna

Tu wî avdî ji yenbû'a heyatê
Di şûna êm bidî wî lewz û xurma

Meke bawer ku dê sahib huner be
Ew ê dîsa wekî bavê xwe ker be

Dema tu wî ji eywanê derînî
Huner nayê ji wî xeynî zirênî²⁹⁰

5.EDEBIYATNASÊN BI HÎZANÊ RE PEYWENDÎDAR

5.1.Feqiyê Teyran

Feqiyê Teyran edebiyatnasekî bi serdema mîrektiya Hîzanê re peywendîdar e ku ji derveyê Hîzanê hatiye, li Hîzanê perwerdehî dîtiye û li wir medfûne. Belê Feqiyê Teyran edebiyatnasekî Kurd ê serdema mîrektiyan e. Ew yek ji wan hozanvanên kevntirîn e yê ku bi zimanê Kurdî helbest nivîsîne. Helbestvan, çîroknivîs û deestannivîsekî bêhempa ye di dîroka edebiyata Kurdî de. Navê wî ji piçûk û mezinan bigre ta jin û zarokan di nav gel de belav e û tev jî dizanin.²⁹¹ Ehmedê Xanî jî di mesnewiya xwe ya navdar a *Mem û Zînê* de gava qala pêşeng û pêştatirên edebiyata Kurdî ya Kurmancî dike, navê Feqiyê Teyran awha tîne ziman:

Bîna ve ruhê Melê Cezîrî

Pê hey bikira Elî Herîrî

Kêfek we bida Feqiyê Teyran

²⁹⁰ Hirîtî, h.g., r. 26

²⁹¹ M. Xalid Sadînî, *Feqiyê Teyran*, Nûbihar, Çapa Sêyem, Îstanbul, 2009, r. 11.

Heta bi ebed bimayî heyran²⁹²

Herçiqas Aleksandir Jaba, M. Emîn Zekî Beg, Mînersky, Qanatê Kurdo û hin kesên din ji bo dayîkbûna Feqiyê Teyran sedsala XIVan nîşan bidin jî ev yeka han ne rast e.²⁹³ Lewra anegorî piraniya lêkolîneran, ji hin helbestên Feqiyê Teyran derdikeve ku helbestvan di navbera sedsalên XVian û XVIIan de jiyaye. Bo nimûne di danberheva Mela û Feqî de di rêzekê de dîroka “*hizar û yek û sihan*” derbas dibe ku ev dîroka koçî dike 1621ê zayînî. Di helbesta çîrokî ya *Şêxê Sen'an* de jî di rêzekê de dîroka “*Li dehsed û sala sihê*” derbas dibe ku ev jî dike 1620ê zayînî. Di rêzehelbesteke din de jî ku tê gotin tê de dîroka wefata Melayê Cizîrî hatiye diyarkirin “*Heft eyn û lam ji hev bûn cuda*” bi hesabê ebcedê îşaret bi dîroka 1050ê koçî tê kirin ku dike 1640ê zayînî. Ev nimûne jî nîşan didin ku Feqiyê Teyran di nîveya duyem a sedsala XVian û nîveya yekem a sedsala XVIIan de jiyaye.²⁹⁴

Ev beşa helbesta Feqiyê Teyran ji bo eşkerekirina dîroka wiladeta wî wek çavkanî tê nîşandan:

Mîm û Hê heftê felek çûn
Ji hicretê dewran gelek çûn
Sal hizar û çil û yek çûn
Ev xezel anî diyare

Li gor vê derca dîrokê ya ku Feqiyê Teyran di helbesta xwe de nîşan daye, dîroka dayîkbûna wî dike 971ê Hicrî û ev jî dike 1563ê Mîladî. Yanî reqema ku Feqî di helbesta xwe de dide 1041 e û heftê salê umrê wî jî ku jê derkevin, dimîne 971.²⁹⁵ Li hemberî vê tespîta Xalid Sadinî, hin lêkolînerên wek Seîd Dirêşî dîroka ku ji vê helbestê derdixin wek 1549ê Mîladî nîşan didin.²⁹⁶ Merûf Xeznedar jî ku li ser dîroka

²⁹² Mehmet Emin Bozarslan, *Mem û Zîn Ehmedê Xanî*, Weşanên Deng, Stenbol 2005, Çapa Duduyan, r. 172.

²⁹³ Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebyeta Kurdî*, r. 70; Minorsky, *Kürtler*, Koral Yayınları, İstanbul 1992, r. 86; Beg, b.n., r. 160.

²⁹⁴ Ergün, b.n., r. 205.

²⁹⁵ Sadinî, b.n., r.44.

²⁹⁶ Seîd Dirêşî, *Bermayêt Dîwana Feqiyê Teyra*, Çapxana Zankoya Dihok, Çapa Yekem, Dihok 2011, r. 60-61.

edebiyata Kurd xebatên hêja kirine, wek dîroka jidayîkbûna Feqî sala 1563ê Mîladi nîşan dide.²⁹⁷

Feqiyê Teyran ji herêma Mîrekiya Miksê ye. Li gundê vê herêmê yê bi navê Warezûrê hatiye dinyayê. Li gundê mîrekiya Hîzanê yê bi navê Şandisê wefat kiriye. Di dawiyê helbesta wî ya bi sernavê “Dilo Rabe, Dilo Rabe Veke Çavan ku Êvar e” de agahiyeke ku katibê helbestê bi destxetê xwe derc kiriye heye. Li wir hatiye nivîsîn ku “Navê Feqî Muhemed e. Ji gundê Warezûrê ye û li wir Xwedê daye. Li gundê Şandisa ku girêdayî qeza Nemira ye medfûn e. Heqî Werazûr e, ew jî li ser qezaya Miksê ye”²⁹⁸.

Navê bavê wî Ebdullah e. Di nav xelqê de wek Feqiyê Teyran hatiye naskirin û navdar bûye. Bi îhtimaleke mezin ji ber ku piştî feqitiyê melatî nekiriye, lewma navê Feqî li ser maye. Her wisa ji ber ku helbestê xwe de pirî qala teyran kiriye, bi teyran hatiye nîspetkîrin û jê re gotine “Feqiyê Teyran”. Çawa ku tê gotin wî pêşî li Medreseya Mîr Hesênê Welî ya Miksê dest bi perwerdehiya xwe kiriye. Li Hîzanê jî maye û li wir medreseya Hîzanê ders girtîye. Paşê çûye Finika Botan û ji wir jî çûye Cizîra Botan. Li wir Melayê Cizîrî dîtîye. Bi hev re muaşere/gotûbêj kirine. Ev muaşere di dawiyê dîwana Melayê Cizîrî de ne.²⁹⁹

Bi sedsalan e ku ji kubûna Feqiyê Teyran di navbera Hîzan û Miksê de didome. Her çiqas erdnîgariya van herdu bajarên kevnare digihêjin hev û di gelek deveran de di nav hevûdu de bin jî di heman demê de çanda wan a hevbeşk jî ji normalê gelek zêdetir e. Rewşa cîrantiya wan di dereceya xwesertiyê de ye. Pirî caran wek ehlê bajarekî tevdigerin. Lê dema mijar tê jikubûna Feqiyê Teyran her yek bi aliyê xwe ve dikşîne û lê dixebite ku ji destê yê din derxe.³⁰⁰ Piştî dîtina wê qeyda li ser helbesta Feqî, hate xuyanê ku Feqî herçiqas li Miksê hatibe dunyayê, lê qebra wî li Hîzanê ye û li gundê Şandisê medfûn e. Dîsa ji qeydên du salnameyên wilayeta Bidlîsê û nivîstekên li ser kêlikên qebra Feqî ku vê dawiyê hatin dîtîne jî bi temamî nîşan dan ku qebra Feqî li gundê Şandisa Hîzanê ye. Her wisa ji van qeydan dereceya navdarî û bandora wî jî derdikeve holê. Ev agahiyên salnameyan bi Tirkîtiya Osmanî

²⁹⁷ Merûf Xeznedar, b.n., r. 205,

²⁹⁸ Seîd Dirêşî, *Dîwana Feqiyê Teyran*, Lîs, Ankara 2011, Beşa Pêvekan

²⁹⁹ Adak, b.n., r. 371.

³⁰⁰ Sağniç, b.n., r. 369.

ne. Di salên 1892 û 1898an de li Bidlîsê hatine weşandin. Wergera van qeydên di salnameya sala 1898an de: “Û li nehiyeya Ûçumê li gundê Şandisê Feqiyê Teyran medfûn e ku helbestên wî yên lîrik û hîkmetbar ên bi zimanê Kurdî û Farisî hene.”³⁰¹ Belgeyeke eynî bi vî rengî ya di salnameya Bidlîsê ya di sala 1892an de jî ev e: “Rojên Înan û Duşeman ji her derê gelek însan tên ziyareta Ziyaretgeha Şêx Teyran û Şêx Sînan ku nav tixûbê Nehiyeyê (Spayîrtê) de medfûn nin.”³⁰²

Digel van belgeyên jorî jî di nav cîhana zanistê de hebûna qebra Feqiyên Teyran a li gundê Şandisa Hîzanê, belav nebûbû. Ciyê qebra Feqî vê dawiyê li gundê Şandisê ji aliyê Müfid Yüksel ve hate dîtin. Di nivîsteka li ser kêla ber serî de bi zimanê Erebbî awha dinivîse: “Ev gora han, a bextewar, rehmetî, bexşandî, û hewcedarê rehma Xwedê, Muhemmedê ku wek Feqiyê Teyran navdar e ku di sala 1041ê de wefat kiriye.”

Li gorî nivîstekên li ser kêlikên gora Feqî, gora Feqî di sala 1705an de piştî wefata Feqî ya bi qasî 76 salî ji aliyê mîrê Hîzanê Mîr Huseyn ve hatiye çêkirin. Mîr Huseyn di heman salê de li Hîzanê ji bi mesrefên gora Feqî weqfek jî saz kiriye. Ji bo mucawirên gorê 50 quruş ratib tayîn kiriye. Mîr Huseyn ji eşîra nemira ye û bavê wî Mîr Şeref Beg jî mîrekî navdar bûye.³⁰³

Derbarê Feqiyê Teyran de di nava ragihandin û efsaneyan de gelek agahiyên dijber peyda bûne. Herçend piraniya çavkaniyan cihê jidayîkbûna Feqî Werezûza Muksê jî bizanin Cegerxwîn di vê çîroka xwe ya navborî de dibêje Mîr Mihê kurê mîrê welatê Hîzanê bûye. Piştî mirina bavê wî mîrîtî derbasî mamê wî bûye. Hêja di temenê xwe yê biçûk de bi keça mamê xwe re hatiye nîşankirin, lê piştî ku tê ber zewacê mamê wî jê re dibêje heta tu şehadetnameya îlmên dînî wernegirî ez keça xwe nadime te. Li ser vê Mîr Mihê diçe Cizîra Botan û piştî çend salan şehadetnameya îlmên îslamî werdigire. Lê dema vedigere welatê xwe dibîne ku termê destgirtiya wî Sînemê radikin, Mîr Mihê jî ji ber sewdayê bi çol û çiyar dikeve û helbestan dibêje.

³⁰¹ Bitlis Vilayetine Mahsus Salnamedir. İkinci Defa. Sene-yi Hicriye-yi Kameriye: 1316, Bitlis Vilayet Matbaası r. 174; Adak, Acar, Baluken, g.n., 218

³⁰² Salname-yi Vilayet-i Bitlis, Birinci Defa. 1310, r. 1310; Adak, Acar, Baluken, g.n., r. 109-118.

³⁰³ Müfid Yüksel, “Feka Teyran’ın Mezar Şahidesi”, <http://mufidyuksel.com/category/tarihe-notlarim>; M. Xalid Sadinî, Feqiyê Teyran’ın Mezar Taşı Bulundu, www.ilkehaber.com, (dîroka xwegihînê: 22.02.2015); Adak, Acar, Baluken, g.n., r. 109-118.

Tê xuyanê ku gelek çavkaniyên derbarê Feqiyên Teyran de, çi belge û çi jî efsane, Feqî bi Hîzanê re eleqedar nîşan didin. Ya ku eseh û eyan e Feqî li medreseya Hîzanê xwendiyê û feqîtî kiriye. Qebra wî li gundê Şandisa Hîzanê ye. Merqeda wî wek zîyaretgahêkê tê qebûlkirin û wek navendeke manewî raxbet dibîne. Hin rojên mûeyen însan ji her derê tèn wî mekanî zîyaret dikin. Mîrê Hîzanê ji bo zîyaretgaha merqeda wî weqfek ava kiriye.

Ev hîmayeya mîrê Hîzanê ya xatirat û gora Feqiyê Teyran dide nîşan ku ew hevgerêdana muteqabîl a hukumdar û helbestvan, bi gotineke din, têkiliya di navbera şair û patron a sedema klasîk, piştî wefata helbestvan jî bi rengekî cuda berdewam e.³⁰⁴ Ev sîstema ku bingeha edebiyata klasîk e, di hemû serdema mîrekiyên Kurd de û xasma li mîrekiya Hîzanê jî hukumferma ye. Lewra Feqiyê Teyran li wan dezgehên xwendin û perwerdehiyê tehsîl girtiye ku mîr û hukumdarên Kurd bûne sponsor ji wan re. Perwerdehiya wî ya li Medreseya Mîr Hesênê Welî nîşaneke vê yekê ye. Feqî piştî ku diçe Cizîra Botan, di navbera wî û mîrên Cizîrê de muhtemelen hevnasîn û têkilî çêdibin. Her çendî em bi eyan û beyan nizanin ka di navbera Feqî û Mîrê Cizîrê de têkiliyeke hîmayekarane hebûye yan na; lê hin gote got û rîwayetên hatine neqîlkirin ên di vê derbarê de ihtimaleke bi vî rengî nîşan dide.

Piraniya çavkaniyên ku li ser jiyana Feqî hatine nivîsîn diyar dikin ku Feqiyê Teyran demekê li bajarê Cizîrê û li bajarokê Finikê maye û li medreseyên Cizîra Botan xwendiyê. Ji ber vê jî di çîrokeke zargotinê de hatiye ku nasnavê Feqiyê Teyran bi xwe ji aliyê Mîrê Cizîra Botan ve hatiye danîn. Li gorî vê çîrokê, rojekê hin diz xezîneya Mîrê Cizîra Botan didizin. Di heman rojê de jî Feqî diçe Cizîrê û di derwazeya Cizîrê de ji aliyê zêrevanên bajêr ve bi gumana dizan wî û hevalê wî digirin û dibin pêşberî Mîr. Mîr dema Feqî û hevalê wî dibîne wan nas dike û wan dide berdan. Feqî piştî ku meseleyê fêma dike hinek diponije û paşê ji Mîr re dibêje mîrê min ez gelek diz û rêbiran dinasim û ji bilî vê jî ez zimanê teyrana jî dizanim. Mîr jî dibêjiyê ku tu wan dizan eşkera bikî ez ê nivê xezîneyê bidim te û navê te jî bikim Feqiyê Teyran. Li ser vê Feqî digel çend pisporên Mîr bi rê dikeve li cihekî bi kevokên li ser dara maziya reş re diaxife û cihê xezîneyê ji wan hîn dibe. Piştî ku xezîneyê derdixe Mîrê Cizîra Botan para wî didiyê û ji vir pê de navê wî weku

³⁰⁴Halil İnalçık, *Şair ve Patron*, Doğu ve Batı Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara 2010, r. 125.

Feqiyê Teyran li çar aliyê Kurdistanê belav dibe. Her wisa xwedîderketina mîrê Hîzanê li Feqî û çêkirina gora Feqî û tayînkirina ratibê bo xizmetên di wê derbarê de, vê sîstema patronajê ya li mîrekiyên Kurd û xasma ya li Hîzanê nîşan didin. Feqiyê Teyran di sala 1041/1632an de li gundê Şandisê ku girêdayî Hîzanê ye, çûye ser dilovaniya xwe. Mîrê Hîzanê yê wê serdemê Mîr Huseyîn qebreke mezbût jê re çêdike. Weqfekê jî ava dike ji bo parastin û xwedîderketina li vê merqedê.³⁰⁵

Li herêma Hîzanê û li der û dora wê û heta Bitlîsê, Tetwanê, Miksê, Hekkariyê, Cizîrê, Sêrtê û hwd. roja 31ê meha Adarê wek roja wefata Feqiyê Teyrantê zanîn. Di vê rojê de xelq û xasma seyda, mela û feqiyên medreseyan behsa heyata Feqî dikin, helbestên wî dixwînin û wek qesîde ji hevûdu re dibêjin. Roja 31ê Adarê telebeyên medreseyan li malan digerin û hêk top dikin. Ehlî jî ji bo pîroziya vê rojê pir hêk didin wan. Ew jî van hêkan dipijînin û li hevûdu belavdikin û dibêjin:

Ne Adar e, Ne Nîsan e

Roja Feqiyê Teyran e.

Lewra 31ê Adarê li gor hesabê (teqwîma) Kurdî ne ji Adarê ye û ne jî ji Nîsanê ye.³⁰⁶

³⁰⁵ Adak, Acar, Baluken, g. n., r. 119.

³⁰⁶ Mela Nîzameddin Yakışık (Hîzanî); Mela Ömerê Avetaxî (Tetwan);

NIRXANDIN

Taybetiyeke edebiyata Kurdî ya li Mirektiya Hîzanê ew e ku di navbera mîrên vê mîrekiyê û edebiyatnasên wê de pergaleke hîmayekariyê heye. Ev pergala ku di lîteratûra edebî de wek sîstema patronajê tê binavkirin, ji bo peydabûn û geşbûna edîb û berhemên edebî pir girîng e.

Sîstema patronajê ji tîkiliya di navbera mîr û helbestvanan derketiye holê. Li gor vê saziya serdema klasîk mîr û hukumdar xwedî li şair û edîban derdikeve, wan fînase dike, rûmetbar û tezîz dike.³⁰⁷ Li hemberî vê hîmaye û parêzvaniya desteya ûmera, ûlema jî xasma tayfeya şair û edîban jî bi îthafa berhemên xwe ya bi bal rêvebiran û her wisa bi meth û pesndariya wan, ew teqdîr û tebcîl kirine, bûne naşirê wesf û ciwanmêrî û xebatên wan. Wuhareng bi saya vê pergal û saziya hukumferma ya serdema klasîk, li dor qesr û kaşxaneyên mîr û hukumdaran ên li bajarên paytextên wan, kesayetiyên edebiyatnas û berhemine edebî derketine holê.³⁰⁸

Gava em li rewşa parêzvaniya edebiyatnasan a ji aliyê mîr û hukumdaran ve ya li mîrekiya Hîzanê dinihêrin, rewşeke nîspeten bi hêz tê xuyanê. Lewra em li berhema bi navê *Yûsuf û Zuleyxa* ya şairê patronajê yê Hîzanê, Selîmiyê Hîzanî dinêrin û dibînin ku tîkiliyeke eşkere ya xurt a bi vî rengî di navbera mîrê Hîzanê yê wê demê Mîr Suleyman û şair de heye. Her wisa em dibînin ku Mîr Huseynê mîrê Hîzanê yê sedsala XVIII. qebra Feqiyê Teyran wek abîde, wek bîrdarî çêdike û lê xwedî derdikeve û ji bo berdewamiya vê parastin û xizmetê jî waqîf dide avakirin.³⁰⁹ Ev yek jî vê pergala patronajiyê ya li mîrekiya Hîzanê nîşan dide.

Gava em vê sîstema hîmayeya edebiyatnasan ya li Hîzanê bi mîrekiyên din ên Kurdan re didin berhev, derdikeve holê ku sîstema patronajiyê ya li mîrekiya Hîzanê ji sîstema patronajiya mîrekiyên din ên Kurdan bihêztir e. Lewra qasî em dizanin, di nav mîrekiyên Kurdan de xêncî mirektiya Hîzanê, mîrekiya Cizîrê jî

³⁰⁷ Ayhan Tek, "Li Dor Behsa Patronajê Mem û Zîna Ehmedê Xanî", *Mukaddime*, Hejmar: 3, r. 40.

³⁰⁸ Halil İnalçık, *Şair ve Patron*, Doğu ve Batı Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara 2010, r. 13.

³⁰⁹ Adak- Acar-Baluken, g.n., r. 119.

xwedî şairê patronajê ye. Ew şair jî Melayê Cizîrî ye.³¹⁰ Qasî ku em dizanin xeynî van herdu mîrektiyan, mîrektiyên ku bi awayekî eşkere maktî ji şairên patronajê re kiribin tinene. Mîrektiyên bi awayekî girtî û endîrekt vê rewşê nîşan didin hene. Yanî bi çêkirina warên ilm û edebiyatê, bi xwedî derketina dezgehên xwendinê û bi hîmayeya alim û edîban, awayekî vê pergalê nîşan dane. wek mînak, mîrektiya Hekariyê, mîrektiya Bidlîsê, mîrektiya Bazîdê, mîrektiya Miksê û hwd. Lêbelê qasî ku tê zanîn, têkiliyeke du alî ya eşkere ku şair jî di berhema xwe de wek methiye bersiv dabe vê hîmayekariya mîr û hukumdar, tenê li van her du mîrektiyan, li Hîzan û Cizîrê tete xuyan. Gava em nimûneya weqîfsaziya mîrê Hîzanê ya ji bo qebra Feqî jî bidin ber çav, bi qenaeta me Hîzan di hêla nîşandana nimûneyên patronajê de dikeve pêşiya Cizîrê jî.

Mîrektiya Hîzanê ji hêla kojim(cem'a) zanyar û edîban de jî rewşeke rewnaq nîşan dide. Lewra Hîzan di vê hêlê de, hem ji bo zanyarê mîrê û hem jî ji bo edebiyatnasên Kurd, bûye navendeke cazîb. Vê rewşê, edîbên wek Feqiyê Teyran û zanyarê mîrê yên wek Şêx Sibxetullahê Arwasî kaşî Hîzanê kiriye. Hîzan di vê hêlê de bi mîrektiyên Cizîr, Amadiye, Bidlîs û hwd. re bi pêşbaziyeke serkeftî de ye.

Berhemên edebî yên li vê mîrektiyê hatine dayîn nîspeten cihêreng in û bi hêla qaliteya edebî ve serkeftî ne. Mijarên wek eşq, eqîde, rewşa civakê, camêrî, wefa, fedakarî, mirin, welatparêzî, nubuwwet, fiqre û hwd. di mesnewî, dîwan, mersiye û nesîhetnameyên ku li vê mîrektiyê hatine nivîsîn de hene. Qasî ku em dizanin mersiyeya Axaokê Bêdarî ya ku li ser her du kurên xwe nivîsiye, di edebiyata Kurdî de mersiyeya pêşîn e ku li ser zarokan hatiye nivîsîn. Her wisa di mijara hîcva civakî de jî nimûyên pêşîn li Hîzanê derketine holê.

Taybetiyeke edebiyata Kurdî ya Hîzanê jî zelalbûn û rewanbêjiya Kurdî ya Hîzanê ye xasma ya edebiyatnasên Hîzanî. Lewra gava em li zimanê berhemên edebiyatnasên Hîzanî dinihêrin, em dibînin ku zimanê van berhemên, li gor zimanên edebiyatnasên Kurdî yên mîrektiyên din, zimanekî xwerûtir, rewantir, zelaltir û fehmatir e. Em vê rewşê di Kurdiya edebiyatnasên Hîzanî yan jî yên bi Hîzanê re peywendîdar yên wek Selîmiyê Hîzanî, Axaokê Bêdarî, Mela Xelîl, Feqiyê Teyran û

³¹⁰ Ergun, r. 149.

hwd. de dibînin. Digel qaliteya naverokê, zelalbûna zimanê van berheman û her wisa zelalbûna zimanê ehlê Hîzanê, bala yên ku li ser vê herêmê dixebite, dikşîne. Mesela vê yekê bala nivîskar û lêkolîner Müfid Yüksel jî kişandiyê. Yüksel di xebata xwe ya li ser medreseyên Norşînê de dibêje ku Kurdiya mala Seyda Şêx Ebdurrehmanê Taxî ku avakar û dersadarên medreseyên Norşînê ne û Kurdiya ku di medreseyên wan de tê axaftin, Kurdiya herî xweş e di hemû Kurdistanê de. Lewra Kurdiya wan pir zelal û herikbar e. Heta Kurdiya xanimên ehlê mala Seyda û Hezret, yanî yên mala Şêx Ebdurrehmanê Taxî û Şêx Ziyaeddîn, wisa xweş e ku qisedanê wan ê rojane jî wek helbest rewan û melodîk e, safî û sêhil e. Tirkitiya Stenbolê çawa xweş û standard e di nav Tirkan de, ev Kurdiya Norşînê jî ku wek Norşîna Mala Seyda yan jî Norşîna Mala Hezret jî tê zanîn, di nav Kurdan de, di wê astê de ye.³¹¹

Bi qenaeta me ev taybetiyên ku Yüksel ji bo Kurdiya Mala Seyda û medreseyên Norşînê dibêje, rasterast taybetiyên Kurdiya Hîzanê ne, taybetiyên Kurdiya zanyar û edîbên Hîzanê ne. Lewra Şêx Ebdurrehmanê Taxî ji Hîzanê ye. Di salên piştî nîveka duduyan a sedsala XIX. de ji Hîzanê hatiye li Norşînê bi cih bûye û medrese ava kirine.³¹² Bi qenaeta me sebebekî zelalbûn û standartbûna Kurdiya alim, edîb û ehlê Hîzanê ev e ku Hîzan ji hêla coxrafayê ve di navika coxrafyaya Kurdan de ye. Di sedema mîrekiyan de jî hemû dorhêla wê bi mîrekiyên Kurdan ve rapêçayî bû. Me di mijara coxrafyaya Hîzanê de qala vê yekê kiribû.³¹³

Ev rewş jî bûye sedem ku têkiliya Hîzanê bi her hêlê re çêbibe. Ev têkilî jî bûye faktorê pêkhatina zimanekî standard û hevpar ku ji bo ehlê her herêmê nas û fehma ye. Sedemekî din jî dibe ku ev be, çawa ku me li jor jî gotibû, rewşa herêma mîrekiya Hîzanê ji hêla cem'a /kojima zanyar û edebiyatnasan ve, baş e. Heta ji vê hêlê ve bi mîrekiyên Kurd ên wek Cizîr, Bidlîs, Bazîd û hwd. re di pêşbaziyeke serkeftî de ye.³¹⁴ Bi saya cazîbeya ilmî û edebî ya herêma Hîzanê, alim û edîbên Kurd yên ji cihên din hatine Hîzanê û yên ji vir perwerde bûne, çûne li herêmên din ders dane û însan îrşad kirine. Di navbera Kurdiya Hîzanê û Kurdiya herêmên Kurd

³¹¹ Müfid Yüksel, *Kürdistan'da Değişim Süreci*, Sor Yayıncılık, İstanbul 1995, r. 56.

³¹²³¹² Ömer Pakış, "Seyyid Sibğatullah El -Arwasî ve Şeyh Abdurrahman Et- ağı", *I. Uluslararası Düinden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, Beyan Yayınları, Ankara 2008, r. 587.

³¹³ Binêr: r. 32.

³¹⁴ Binêr: r. 88.

ên din de hevrençî, hevdengî û hevahengiyek pêkhatiye. Wuhareng herêma mîrektiya Hîzanê bûye gihanekekê ji bo Kurdî.

Zanyarî û edebiyata li mîrektiya Hîzanê wek ya wan hemû mîrektiyên Kurdan ên din, piştî hilweşîna mîrektiyên bêxwedî ma, qels bû û zeîf ket. Êdî edîb û behremên edebî kêr bûn. Belê piştî serdema mîrektiya Hîzanê alimên dînê yên wek Mela Osmanê Xorosî, Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî yê Kurdî, Mela Selîmê Hîzanî, yan jî edebiyatnasên Kurdînivîs ên wek Mela Îmadedîn Reşpojan³¹⁵ û Ebdulahê Qursincî ku dîwan, nivîs û helbestên wan ên bi Kurdî hene, derketine.³¹⁶ Lêbelê qasî ku tê xuyanê yekî mîna Bedîuzzeman îstisnayek e û her wisa dereceya edebiyata van edebiyatnasên Kurdînivîs ên vê dawiyê ku me navên wan rêz kir jî nagihêjine asta edebiyatnasên Hîzanî yên serdema mîrektiyê. Heçî serdema komarê ye, hema êdî bigre ew kevneşopiya ilmî û edebî ya dewlemend a Hîzanê qet nema.

Bi qenaeta me bi lêkolîn û xebatên li ser tarîxa îlm û edebiyata Hîzanê ya bincilkirî û veşartî, dê ev dewlemendî bi derdorên akademîk, li ehlê Hîzanê, bi rayagiştî ya welatê me û cihanê bête danasîn. Her wisa jî dê ev dîroka dewlemend û bêxwedî, wek hêvî û hawarekê nîfşên me yên nû û xasma Hîzanî yên niha, bîne xîretê û bibe wesîleya xwebaweriya wan. Zanyar û edîbên di asta serdema mîrektiyê de û heta yên jî wan pêştir bide derxistin. Wek van her du gotinên pêşiyên ku dibêjin “zêr bi zengariyê yan jî bi ketina nav heriyê qîmeta xwe wînda nake”, “her tişt dizivire ser eslê xwe”, dê bibe amûreke pêkhatina hafîzeyêke civakî û hişmendiyeke dîrokî.

³¹⁵ Zeynelâbidîn Âmidî, *Medhiyye û Mersiyye Der Heqê Seydâyê Bedî'uzzemân*, Diyarbakır Sözü Yay., Diyarbakır 2004., r. 109-111.

³¹⁶ Adak Abdurrahman, “Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmî: Nîmûneya Herêma Bedlîsê”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 1/1, Havîn 2016, r. 33-56.

ENCAM

Di vê xebatê de armanca me ew bû ku em rewş û rastiya çand û edebiyata Kurdî ya serdema mîrekiya Hîzanê derxînin holê û paşxaneya wê ya dîrokî bidine nasîn. Her wisa me xwest ku rola îstiqrara sîyasî, rêvebirî, avadanî, aborî, bazirganî, xwedîderketin û hîmayeya desthilatdaran a peydabûna van nirx û cewheran de destnîşan bikin. Hêmanên diyarker ên di çêbûna ekola çandê û edebiyata nivîskî de ya li vê mîrekiyê rave bikin. Me di vê çarçoveyê de di dawiya xebata xwe de ev encamên li jêr bi dest xistin:

1. Ekolên çandî û edebiyata nivîskî ji serdemên dêrîn bigre heta niha li ser bingeh û binaxeya îstiqrar û ewlehiyê, refaha civakî û ya herî girîng jî hîmayeya rêvebiran derketiye holê û pêşketine.
2. Gava em li gor vê ceribîna dîrokî li Hîzanê dinêrin, tê xuyan ku herêma mîrekiya Hîzanê her çiqas ji dem û dewranên qedîm ve di navbera hêzên hukumran ên îstîlaker de tengijî be jî, vê erdnîgariyê bi awayekî gelemperî karibiyê otorîteya xwe ya herêmî berdewam bike û îstiqrareke nîspeten dirêj a bi qasî 650 sal bidest bixe.
3. Di binasaziya vê rewşê de qasî avantajê erdnîgariya vê herêmê, têkilî û dîplomasiya mîr û rêvebirên vê mîrekiyê jî xwedî bandor e. Lewra ev herêm xwedî erdnîgariyeke bi dar û daristan û bi ber û behrem e. Gelek çiyayên wê yên berz û asê û geliyên wê yên kûr ên nayên zevtê, hene. Her wisa jî mîr û hukumdarên vê hukümetê bi meşandina rêya lihevkerin û camêriyê ya bi mîrekiyên cînar û dewletên hêzdar re, navdar in. Mîrê Hîzanê Mîr Dawud di sala 1514an de digel bîst û pênc mîrên mîrekiyên Kurd li Amasyayê peyman îttifaqa Kurd û Osmanî destnîşan kiriye. Bi vî hawî ew îstiqrara sîyasî di vê serdemê de jî berdewam kiriye.
4. Mîrekiya Hîzanê û xasma serbajarê wê Hîzan her çiqas xwedî gelek nimûneyên bajarên antîk e jî ên wek sûr, kela û h.w.d. lê taybendmendiya çanda serdema navîn a Îslamî bêhtir lê hene. Ev çand jî

bi gelemperî bi rêya saziyên sereke yên serdema Îslamê yên wek medrese hatiye holê û teşe girtiye û seranserê mîrekiyê belav bûye. Wihareng Hîzanê wek bajarekî serdema Îslamê herî kêr xwedî li heşt medreseyan mezin dikir û di hinekê van medreseyan de, ne kêmtirê heft sed telebeyî perwerde didît. Aniha piraniya van medreseyan li navenda bajarê HîzanaBerê di rewşeke xerabe de ne. Lêbelê ev dezgehên xwendin û perwerhiyê, bûn çavkaniya çandê nivîskî, gihîştina alim û edîbên Hîzanê yên navdar.

5. Rêvebirên mîrekiya Hîzanê hem dam û dezgehên perwerdehiyê ava kirin û der û doreke xwendinê saz kirin; hem jî xwedî li alim û edebiyatnasan derketin û ew teşwîq kirin. Wihareng sîstema hîmayeya mîr û hukumdarên a edîb û zanyaran a di serdema navîn de ku sedemekî girîng û diyarde ye ji bo çêbûn û pêşketina zanist û edebiyatê, li bajarê Hîzanê jî pêk hat. Bi vî hawî li Hîzanê ekoleke çandê ya nivîskî çêbû û ev herêm gerî navendeke ilm û îrfanê. Her wisa jî edebiyateke herêmî ya bi Kurdî ya Kurmancî derkete holê. Li hêlekî alim û zanyarên wek Şêx Hesenê Hîzanî, Şeyxul Îslam Mewlana Ebdulxaliq, Mewlana Xizir Bîbî, Şêx Sibxetullah Arwasî, Şêx Ebdurrehmanê Taxî û Bedîuzzeman Seîdê Kurdî yê Nûrsî gihîştin, li hêla din jî edebiyatnas û helbestvanên wek Selîmiyê Hîzanî, Mela Xelîlê Sêrtî, Axaokê Bêdarî, Mela Emerê Gulpîkî rabûn û bi berhemên xwe yên bi Kurdî Hîzan gerandin navendeke edebiyata Kurdî ya klasîk.
6. Mîrekiya Hîzanê hem ji hêla çanda dînê de û hem jî ji hêla edebiyata Kurdî de gelek alim û edebiyatnas cezb kir û anîn Hîzanê. Her wisa jî gelek zanyar û helbestvanên Hîzanî ekola çandî û edebîya Hîzanê ya Kurdî, birin û li derveyî Hîzanê jî belav kirin.
7. Di edebiyata Kurdî ya li mîrekiya Hîzanê de nimûneyên sîstema patronajê jî derketiye holê. Wek mînak edebiyatnasê navdar Selîmiyê Hîzanî mesnewiya xwe ya *Yûsuf û Zuleyxa* pêşkêşî mîrê Hîzanê kiriye. Lê li gor gelek lêkolînerên edebiyat û dîroka edebiyatê navê vî mîrê Hîzanê ku Selîmiyê Hîzanî berhema xwe pêşkêş kiriyê û di beşa medhiyeya xwe

de pesnê wî daye, nayê zanînê. Hinek lêkolîner jî bi awayekî bê belge û bi texmînî dibêjin ku ew mîr Mîr Şeref e. Lêbelê di vê xebata me de derket holê ku bi ihtimaleke mezin ew mîrê ku Selîmiyê Hîzanî mesnewiya xwe pêşkêşî wî kiriye, Mîr Suleyman e. Lewra li gor nivîsteka li ser kêlikê merzelê Mîr Ebdî ku kurê Mîr Suleyman e, yê li qebristana medreseya Taxê, Mîr Ebdî 1825an de wefat kiriye. Ji vir derdikeve holê ku bavê wî Mîr Suleyman jî di salên 1750 û 1770yê wan de mîrtî kiriye. Selîmiyê Hîzanî jî çawa ji berhema wî derdikeve holê ku mesnewiya xwe di sala 1759an de nivîsiye. Lewma bi qenaeta me ew mîrê ku Hîzanî berhema xwe pêşkêş kiriye, Mîr Suleyman e.

8. Di serê sedsala 19an de dewleta Osmanî sîyaseta xwe ya ademê merkeziyet guherand û ew peymana îttifaqê ya bi mîrên Kurdan re kiribû, xerab kir. Sîyaseta hukmê merkezî meşand û piştî gelek şer û qîtalên dûr û dirêj di nîveka sedsala 19an de mîrekiyên Kurd ji holê rabûn. Wihareng dawî li Mîrekiya Hîzanê jî hat. Bi dawî lê hatina mîrekiyan ve, ew çand û edebiyata ku li mîrekiyan geş bibû, derbeke mezin xwar û temirî. Lewra ew dezgehên xwendin û perwerdehiyê û ew zanyar û helbestvan bêfinansor û bêhîmaye man. Wihareng ew asta çandî û edebî ya li Hîzanê dakete jêr. Êdî zana û helbestvan tenê bi xebatên xweyên şexsî ve dikaribûn bimeşin. Vê yekê jî têra berdwamiya vê ekola çandî û toreya edebiyata Kurdî nekir.

ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman: *Destpêka Edebiyata Kurdiya Klasîk, Weşanên Nûbihar*, Stenbol 2013

Adak, Abdurrahman Hayrullah Acar, Yusuf Baluken: “Gora Feqiyê Teyran /Faqah Tayran’s Tomb”, *Kovara Nûbihar Akademî, I/I*, s. 2014, r. 109-118.

Adak, Abdurrahman: “Mela Xelîlê Sêrtî Helbestvanê Bi Mexlesa “Şewqî” û Helbestên Wî Yên Kurdî (Kurmançî)”, *Kovara Muqedîmeyê ya Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê*, j. 1, 2010, r. 156.

Adak Abdurrahman, “Kurtenêrînek li ser tarîxa perwerdeya bi Kurdî di medreseyên Kurdan de” *Kovara Deng*, Hejmar: 25/99, Ist. 2015, r. 53-60.

Adak Abdurrahman, “Helbestvanên Klasîk ji Perspektîfa Herêmî: Nimûneya Herêma Bedlîsê”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C: 1/1, Havîn 2016, r. 33-56.

Akalın, L. Sami *Edebiyat Terimleri Sözlüğü*, Varlık Yayınları, İstanbul 1984

Akyüz, Yahya: *Türk Eğitim Tarihi*, Weşanên Ankara Üniversitesi Eğitim Fakültesi, Ankara 1989

Alkış Abdurrahman: *Melayê Cızîrî'nin Divanında Tasavvufî Mazmunlar*, Weşanên Nubihar, Stenbol 2014

Amidî Zeynelâbidîn, *Medhiyye û Mersiyye Derheqê Seydâyê Bediüzzemân*, Diyarbakır Söz Yay., Diyarbakır 2004

Atabağsoy Naim, “Klasik Dönem Osmanlı Şiirinde Patronaj ve Şairin Üretim Süreci İlişkinine Bir Bakış”, *Monograf Edebiyat Eleştiri Dergisi*, 2014, Hejmar: 1, r. 84.

Aydeniz Veysel, *Akkoyunlu-Kürt İlişkileri*, Kent Yayınları, İstanbul 2013

Azîzan, Herekol: “Klasîkên Me an Şahir û Edîbên Me ên Kevin” *Hawar*, II, Stokholm 1998, r. 813.

Avyarov, *Osmanlı -Rûs ve İran Savaşlarında Kürtler*, Weşanên Sîpan, Ankara 1997

Badıllı, Abdülkadir: *Bediüzzaman Said-i Nursî Mufasssal Tarihçe-i Hayatı*, Timaş Yayınları, İstanbul 1990

Baluken, Yusuf: *Mervaniler Devrinde Dini Gruplar Arasındaki Münasebetler*, Yüksek Lisans Tezi, t.ç., Van, 2010

Barnas, Rojen: *Bi Kurmançiya Gewr*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014

Bedlîsî, Şerefhanê: *Şerefname*, Wergêr: Ziya Avcı, Avesta, Çapa Duyem, Stenbol, 2007

Bitlisi, Şerefhan: *Kürt Tarihi*, Cild: 1, Çapa 2., Wergêrê Ji Farisî: Abdullah Yeğın, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014.

Bitlisi, Şerefhan: *Osmanlı İnan Tarihi*, Cild: 2, Çapa 2., Wergêrê Ji Farisî: Osman Aslanoglu, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.

Bitlisi, Şerefhan: *Kürd Tarihi*, Wergêrê: M. Emin Bozarıslan, Deng Yayınları, Stenbol 1998

Bitlis Vilayetine Mahsus Salnamedir, İkinci Defa, Sene-i Hicriye-i Kameriyye: 1316, Bitlis Vilayet Matbaası, 1892, r. 174.

Bozarıslan, M. Emin: *Mem û Zin Ehmedê Xanî*, Weşanên Deng, Stenbol 2005

Bruinessen, Martin Van: “Endonezya’da Kürt Uleması ve Endonezyalı Öğrenciler”, (Wergera Ji İngilizî: Osman Tunç) *Bilgi ve Hikmet* (Dergi/Kovar), Payız 1995, Hejmar: 12, r. 158.

Cizîrî, Melayê: *Dîwan*, (Wergera Ji Kurdî: Osman Tunç), Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012

Cûdî, Raşad: “Bediüzzaman’ın Yegeninden Kürtlere Asırlık Mesaj: Xîret Bikin, Meyûs Nebin /Gayretli Olun Ümitsiz Olmayın”, *Govarî Kurdistan*, Estenbol, 1919-1920 (Amadekar: Ferhad Pîrbal) www.ilkehaber.com, (Dîroka xwegihînê: 10. 02. 2016)

Çakar, Mehmet Sait Fehim İşık Sami Tan, Esra Sadikoğlu, Ronayi Önen, Mehmet Mehmetoğlu, *Ortaöretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders Kitabı*, Tarih Vakfı 2005

Çelebî, Evliya: *Seyahatname*, Amadekar: Robert Dankoff, Seyit Ali Kahraman, Yücel Dalı, Yapı Kredi Yayınları, 1998.

Evliya Çelebi, *Evliya Çelebi Seyahatnamesi*, Wergêr: Zuhuri Danışman, C. 6, Zuhuri Danışman Yayınevi, İstanbul 1997

Çelebi, Evliya: *Seyahatname*, Yeni Şafak Gazetesi, İstanbul 2006.

Çiçek, M. Halil: *Serencama Medreseyên Rojhilatê / Şark Medreselerinin Serencamı*, Weşanên Beyan, Stenbol 2009

Çiçek, M. Halil: *Yakın Dönemde Cizre Yöresi Medreseleri*, Hz. Nuh’tan günümüze Cizre Sempozyomu, Stenbol 1999, r. 126.

Çiçek, Hasan: "Hizan'ın Kültürel Zenginliğinin Arka Planı", *1. Uluslar arası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, Beyan Yayınları, İstanbul 2008.

Demir, Ahmet: "Tatvan'ın Bağlı Bulunduğu Bitlis ve Çevresinde Eyyubi Hakimiyeti", *1. Uluslar arası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu Bildirileri*, Beyan Yayınları, İstanbul 2008, r. 126.

Demir, Abdullah: "16. Yüzyılda Sâfevî ve Osmanlı Hâkimiyetinde Arşiv Belgeleri Işığında Bitlis Beyleri", *1. Uluslararası Düünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, Beyan Yayınları, Ankara, 2008

Dirêşî, Seîd *Dîwana Feqiyê Teyran*, Weşanên Lîs, Ankara 2011

Dîneverî, Ebû Henîfe: *Dîroka Îslamê / Îslam Tarihi*, (Pêşgotina Wergêr) Weşanxaneyê Hivda, Stenbol 2007

Doğan, Mehmet D: *Büyük Türkçe Sözlük*, Pınar Yayınları, İstanbul 2008

Doğan Aksan, *Her Yönüyle Dil*, Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara 2009

Doskî, Tehsîn İbrahîm: "Mîrên Kurd yên Şair û Rolê Wan Di Pêşvebirina Edebiyata Kurdî de", *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013.

Doskî, Tehsîn İbrahîm *Li dor Edebê kurmancî Li sedsala Nozdê û Bîstê Zayînî*, Weşanên Kurê Zanyarî, Kurdistan, Hewlêr 2004

Doskî, Tehsîn İbrahîm - Hemdî Abdulmecîd Selefî: *Mu'cemu'ş-Şueari'l-kurd*, Weşanên Spirêz, Duhok 2008

Doskî, Alî Nebî: *Mela Xelîl Es- sîrtî*, Weşanên Spirêz, Duhok, 2007

Driver, G. R. *The Name Kurdan Dits Philological Connexions*, JRAS, 1923, r. 400-401

Eagleton, Terry: *Edebiyat Kuramı*, Wergêr: Tuncay Birkan, Çapa Sêyem, Ayrıntı Yayınları, İstanbul, 2011

El Meranî, Muhammed Ronî: "Bilinen En Eskî Küret Alfabeti", *Kürt Tarihi Dergisi*, Hejmar:5

Nevzat Eminoğlu, "Çand û Edebiyata Kurdî Di Serdema Mîrektiya Hekariyê de", *Uluslararası Tarihte Hakkari Sempozyumu*, 2. Cilt, Hakkari Üniversitesi Yayınları, Ankara 2016, r. 345.

Eminoğlu, Nevzat: "Medreseyên Kurdan Ji Destpêkê Heta Îro", *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 3. Cilt, 2. Sayı, Aralık 2015, r. 210.

Eminoğlu, Nevzat: “Pirsgirêkên Zimanî Di Nûçegîhaniya Kurdî de”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, Sal: 1, Cild: 1, Hejmar: 1, r.166.

Eminoğlu, Nevzat: “Çand û Edebiyat Kurdî Di Serdema Mîrektiya Hekariyê de”, *Uluslararası Tarihte Hakkari Sempozyumu*, (Gotara Neçapbûyî), Hekkarî 14. 11. 2014

Epözdemir, Şakir: *Medreseyên Kurdistanê*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015

Epözdemir, Şakir: *Mihemed Axayê Kelhokî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013

Epözdemir, Şakir: *1514 Amasya Antlaşması Osmanlı - Kürt İttifakı ve Mevlana İdris-i Bitlisi*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2005

Farqînî, Zana: *Ferheng Sözlük*, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol 2011

Farûqî, Ehmed Bîn Yûsuf Bîn Elî İbnî Erzaq *Tarîxû Meyafarqîn*, (Wergera ji Erebi: Yusuf Baluken) Weşanên Nûbiharê, Stenbol 214

Geverî, Ayhan: *Yûsuf û Zuleyxa Selîmiyê Hîzanî*, (Edîsyon-Kîtîk û Amadekar), Weşanxaneyê Nûbihar, Stenbol 2013

Gözütok, Şakir: *Medreselerin Ortaya Çıkışı ve İlk Medreseler*, Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler, Cild: 1, Zanîngeha Mûş Alparslanê, Mûş 2013, r. 200

Gözetin, İbrahim: *Mele Xelîlê Sêrtî û Berhema Wî ya Nehcul Enam*, Teza Mastirê ya Neçapkirî ya Enstîtuya Zanistên Civakî ya Zanîngeha Mûş Alparslan, Muş,

Gürhan, Veysel: “İdris-i Bitlisi ve Bölgenin Osmanlılar Tarafından Fethi”, *I. Uluslararası Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, Beyan Yayınları, Ankara, 2008., r. 285, 297

Hakan,Sinan: *Müküs Kürt Mirleri Tarihi ve Han Mahmud*, Weşanên Pêrî, Stenbol 2002, r. 8

Hakkı İbrahim *İbrahim Hakkı Tarihi*, Cild: 7, İstanbul 1990

Hassanpour, Amir: *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil*, Avesta Yayınları, İstanbul, 1997

Hirîfî M. Reşîdê, “Axaukê Bêdar”, Kovara Nûbihar, Hejmar: 110, r. 25

Hizan Milli EğitimMüdürlüğü, hizan.meb.gov.tr/tarihce.htm, (dîroka xwegihînê: 20.05.2015)

- Hizan Kaymakamlığı, Kîtabeya li ser Turbeya Şêx Muhammed ya Li Hizana Nava Sûrê (10.03. 2016)
Hizan Kaymakamlığı, <http://www.hizan.gov.tr/detay/hizan-tarihi>, (dîroka xwegihînê: 24.07.2016)
- İbnü'l Erzak, *Meyafarkin ve Amid Tarihi*, (Mervani Kürtleri Tarihi), Wergêr: M. Emin Bozarlan, İstanbul 1990
- John Lyons, Sprache, *Übersetz von Christoph Gutknecht*: Münche: Beck 1983
- Kurdo, Qanatê: *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Lîs, İstanbul, 2010
- Lazarev, M. S.: “19. Yüzyılda Kürdistan” *Kürdistan Tarihi*, Çapa Sêyem, Avesta, İstanbul, 2010
- Izady, Mehrdad R.: *Kürtler*, Wergêr: Cemal Atila, Doz Yayınları, İstanbul, 2004
- İbnul Ezrak: *Mervani Kürtleri*, Wergêr: M. Emin Bozarlan, Koral Yayınları, İstanbul, 1990
- İbnî Esîr, *El Kamîl Fît Tarîx*, (wergêr: Abdülkerim Özaydın), İstanbul 1987, C. VIII
- İnalçık, Halil: *Şair ve Patron*, Doğu Batı Yayınları, Çapa Sêyem, Ankara, 2010
- İslam Ansiklopedisi*, Türkiye Diyanet Vakfı, İstanbul, 1993
- İbnu Hewqel: *Kîtabu Sûretîl Erd*, Daru Mektebetî'l Heyat, Beyrût, 1992
- Kırkan, Ahmet: “Mela Xelîlê Sêrtî”, *Kovara Nûpelda*, Hejmar: 19, 2015, r. 46.
- Kreyenbroek, Philip - Christine Allison: *Kürt Kimliği ve Kültürü*, Avesta Yayınları, İstanbul 2003
- Kurdo, J. : *Kürt Kültürünün Kaynakları ve Uygarlıklar Beşiği Kürdistan*, Weşanên Özgür Gelecek, Ankara 1992
- Korkmaz, Zeynep: “Dil Kültür İlişkisi”, *Türk Dili Üzerine Araştırmalar*, c. 1, Ankara: TDK, 667-678.
- Kürt Dilini Tanıyalım* Kürt Enstitüsü, www.kurtenstitusu.com , r. 7., (dîroka xwegihînê: 06.02. 2014)
- Ksenophon, *Onbinlerin Dönüşü*, Sosyal Yayınları, İstanbul 1985
- Yücel, Muhammed “Antik Çağın İki Kudretli İmparatorluğu Arasında Sıkışmış Bir Ülke”, *Kürt Tarihi Dergisi*, Hejmar:16, r. 20
- Lazarev M. S., Ş. X. Mihoyan, *Kürdistan Tarihi*, Avesta Yayınları, İstanbul 2010

- Lewis, Bernard: *The Arabs in History*, Oxford Universty Press, Oxford 1993
- Makdisi, George: *The Rise Colleges Intitutions of Learning in Islam and The West*, EdinburghUniversity Press, Edinburgh1981
- Makdisi, George: *İslam'ın Klasik Çağında ve Hristiyan Batı'da Beşeri İlimler*, Wergêr: Hasan Tuncay Başoğlu, Çapa Yekem, Klasik Yayınları, İstanbul, 2009
- Mardin, Şerif: *Bediüzzaman Said Nursi Olayı, Modern Türkiye'de Din ve Toplumsal Değişim*, İletişim Yayınları, İstanbul 1995
- Maruf, Naci: *Medarisu Qable Nizamiye*, Metbeet ul- Mecme il-İlmî el İraqî, Bexdad 1393/1973 (Neqil Ji Halil Çiçek)
- Mayevsriy V. T. *19. Yüzyılda Kürdistan'ın Sosyo-Kültürel Yapısı ve Kürt –Ermeni İlişkileri*, Weşanên Sipan, Ankara 1997
- Mecmua-yi Tevarih-i Osmani*, Maddeya “Hizan”, <http://ercaninal2.blogspot.com.tr> , (dîroka xwegihînê: 27.07.2016)
- Minorsky, *Kürtler*, Koral Yayınları, İstanbul 1992
- Mizûrî Evdirrehman. (1994). “Hozanvanê Kurd Selîmê Hîzanî û Berhemê Wî Yûsûf û Zuleyxa”, *Karwan*. Hejmar: 93/45
- Narozî, M. Emîn: *Dîwana Melayê Cizîrî*, Weşanên Roja nû, Stockholm, 1987
- Nîkitin, Bazîl: *Kürtler Sosyolojik ve Tarihi İnceleme*, Deng Yayınları, İstanbul 1994
- Nursi, Bediüzzaman Said: *İçtimai Dersler, Divan-i Harb-i Örfî*, Hatime, Weşanên Zehra, Stenbol 2005
- Nursi, Bediüzzaman Said: *Asar-i Bedîye*, Envar Neşriyat, İstanbul 2009
- Nursî, Bedîuzeman Saîd *Mektubat*, Weşanên Zehra, Stenbol 2013
- Ocak Nezir: *Edebiyata Kurdî*, Weşanên Sîtav, Van 2015
- Mehmet Öncü, *Çîrokên Efsaneyî Yên Kurdan*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2014
- Öncü, Mustafa: *Basîretu'l-Kulûb fî Kelâmi 'Allâmi'l-Ğuyûb Adlı Eserinin Arap Dili Açısından İncelenmesi (teza doktorayê)*
- Özer, Ahmet: *Beş Büyük Tarihi Kavşakta Kürtler ve Türkler*, Hemen Kitap, Çapa Duyem, İstanbul, 2010

Özođlu, Hakan: *Osmanlı Devleti ve Kürt Milliyetçiliđi*, Çeviren: Nilay Özek Gündođan- Azat Zana Gündođan, Kitap Yayınevi, 2. Baskı, İstanbul 2009

Pakiş, Ömer: “Seyyid Sibğatullah El -Arwasî ve Şeyh Abdurrahman Et- ağî”, *I. Uluslararası Dünden Bugüne Tatvan ve Çevresi Sempozyumu*, Beyan Yayınları, Ankara 2008, r.588.

Resul, İzeddin Mustafa: *Ehmedê Xanî ve Mem û Zîn*, Wergêr: Kadri Yıldırım, Avesta Yayınları, İstanbul, 2007

Sadînî, M. Xalid: *Feqiyê Teyran*, Nûbihar, Çapa Duyem, İstanbul, 2003

Sadînî, M. Xalid: *Feqiyê Teyran Jiyan, Berhem û Helbestên Wî*, Nûbihar, Çapa Çarem, İstanbul, 2010

Sadînî, M. Xalid: *Mela Huseynê Bateyî, Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, Weşanên Nûbihar, Stenbol2010

Sadînî, M. Xalid: “Feqiyê Teyran’ın Mezar Taşı Bulundu”, <http://www.ilkehaber.com/haber/27816>; (dîroka xwegihînê:)

Sağnıç, Feqî Huseyn: *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Yekemîn, İstanbul, 2002

Salname-i Vilayet-i Bitlis, Bitlis Vilayet Matbaası, Birinci Defa, 1310, sal: 1892, r. 190

Secadî, Eladîn: *Mêjûy Edebî Kurdî*, Çapxaney Mearîf, Bexda, 1952

Seîd, Mela: “Ey Gelî Kurdan!”, *Kürt Teavûn ve Terakki Gazetesi*, Hejmar: 1, Sal: 1908, r. 1

Selefî-Doskî, Hemdi Ebdulmecîd- Tehsîn İbrahîm: *Mu’cemu’ş-Şu’erai’l-Kurd*, Spîrêz, Duhok 2008

Sırma, İhsan Süreyya: *Müslümanlarda Eğitim Tarihi Süreci İçerisinde Medreseler, Medrese Geleneđi ve Modernleşme Sürecinde Medreseler*, Cild: 1, Zanîngeha Mûş Alparslanê, Mûş 2013, r. 56

Sîwerekî, Muhammed Elî: *Mu’cemu’l E’lami’l Kurd*, Weşanên Bengê Jin, Suleymaniye 2006

Soylu, Kerem: *Dereleme Araştorma Deşifrasyon, Mesail-i Mühimme-i Kürdistan (Kürdistan’ın Önemli Meseleri)*, Pêvek (Osmanlıca Orijinal Belgeler) Belge No: 1236/18, Weşanên Enstîtuya Amedê, Diyarbakır 2010

Sönmez Nesim, “Berawirdkirina Feqiyê Teyran û Melayê Bateyî”, *Uluslararası Tarihte Hakkari Sempozyumu*, Hakkari 2014

- Sprache John Lyons, , *Übersetz von Christoph Gutknecht*: Münche: Beck 1983
- Şemrexî, Huseyin: *Nehc-ul Enam*, Wêşanên Nûbihar, çapa yekem, Stenbol 2012
- Tanpınar, Ahmet Hamdi: *XIX. Asır Türk Edebiyatı Tarihi*, Yapı Kredi Yayınları, Çapa Heştem, İstanbul, 2010
- Tek, Ayhan: “Li Dor Behsa Patronajê Mem û Zîna Ehmedê Xanî”, *Mukaddime*: Hehmar 3, r. 41-60.
- Telli, Mela Ebdullah: *Nêrînek Li Ser Medresên Kurdan*, Hejmara Taybet a Li Ser *Medreseyên Kurdan*, Kovara Nûbihar, Hejmar: 63/64, r. 5.
- Tellî, Mela Ebdullah: “Kund jî Birayê Bazê ye”, *Nûbihar*, Hejmar: 65, sal: 1998, r. 30
- Tetik Ali: *Kürt Coğrafyasında Tasavvuf ve Tarikatlar*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015
- Teyran, Feqiyê: *Ey Avê Av*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Yekemîn, İstanbul, b.d.
- Cemal Ülke, “Osmanlı Arşiv Belgelerinde Kürdistan Eyaleti ve Kürdistan Eyaletinin Kuruluşu”, *Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013
- Varlî, Ebdullah Memê Mehmed (Hoko) Xanî: *Dîroka Dugelên Kurdan*, Hoşka Weşan û Lêkolîna Sîpan, İstanbul, 1997
- Varlî, Ebdullah M.: *Dîwan û Gobîdeyê Ahmedê Xanî Yêd Mayîn*, Çapxaneyê Erkam, Stenbol, 2004
- Varlî, Ebdullah M.: *Dîwan û Jînewarî ya Ahmedê Xanî*, Çapxaneyê Erkam, Stenbol, 2004 181
- Varlî, Ebdullah: *Tevahiya Jînewariya Ehmedê Xanî*, Sempozyuma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, Diyarbekir, 2008
- Veysel Aydeniz, *Akkoyunlu-Kürt İlişkileri*, Kent Yayınları, İstanbul 2013
- Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, Nûbihar, Şiroveker: Perwîz Cîhanî, Çapa Yekem, İstanbul, 2010
- Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, Werger û Şîkariya Çemkî: Kadri Yıldırım, Avesta Yayınları, İstanbul, 2010

Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, Weşanên Deng, Wergêrê Tîpên Latîni û Kurdiya Xwerû: M. Emîn Bozarslan, Çapa Duyem, İstanbul, 2005

Xanî, Ehmedê: *Mem û Zîn*, Şîrove û Kurdiya îro: Jan Dost, Avesta, Stenbol, 2010

Ethem Xemgîn, *Kürdistan Tarihi Cild III.*, Weşanên Doz, İstanbul 1997

Xeznedar, Maruf: *Mêjûy Edebî Kurdî*, Dezgay Çap û Bellawkirawey Aras, Çapî Duwem, Hewlêr, 2010

Yeğen, Mesut: *Devlet Söyleminde Kürt Sorunu*, İletişim Yayınları, Stenbol 1999

Yıldırım, Kadri: “Kürtlerin İslam Öncesi Alfabe Serüveni”, *Kürt Tarihi Dergisi*, Hejmar: 5

Yıldırım, Kadri: *Ehmedê Xanî'nin Fikir Dünyası*, Ağrı Kültür Yardımlaşma Derneği, Berdan Matbaası, Ağrı, 2011

Yılmaz Emine, *Türk Dili Yazılı ve Sözlü Anlatım*, Nobel Yayın Dağıtım, Ankara 2009

Yinanç Mükrimin Halil, Maddeya “Bitlis”, *İslam Ansiklopedisi*, C. II, r. 662.

Yûsif, Ebdurreqîb: *Dîwana Kurmancî*, Latînzekirin: Ziya Avcı, Dîwan, Stenbol, 2012

Yüksel, Müfit: “Kürt Medreselerini Din Eğitimi Merkezli Olarak İslah ve Geliştirme imkanı ve Bunun Toplumsal Barışa Katkısı”, *Medrese Geleneği ve Modernleşme Sürecinde Medreseler*, Cild: 2, Zanîngeha Mûş Alparslanê, Mûş 2013, r. 195.

Yüksel, Müfit: *Kürdistan'da Değişim Süreci*, Weşanên Sor, Stenbol 1993

Yüksel, Müfid: “Feka Teyran'ın Mezar Şahidesi”, <http://mufidyuksel.com/category/tarihe-notlarim>; M. Xalid Sadinî, “Feqiyê Teyran'ın Mezar Taşı Bulundu”, <http://www.ilkehaber.com/haber/27816>; (dîroka xwegihînê)

Zekî Beg, Mehmed Emîn: *Dîroka Kurd û Kurdistan*, Wergêr: Ziya Avcı, Avesta, Çapa Yekem, Stenbol, 2002

Zinar, Zeynelabidîn: *Pêvajoya Medresa Kurdî*, Semînera Li Komeleya Nûbiharê ya Diyarbekir ê 30/03/ 2013. (Gotara Çapnebûyî)

Zinar, Zeynelabidîn: *Medresa Kurdî-Xwendina Medresê*, Weşanên Pencînar, Stocholm 1993



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

HİZAN BEYLİĞİNE GENEL BİR BAKIŞ: İLİM VE EDEBİYAT

Nevzat EMİNOĞLU

10711013

Danışman

Doç. Dr. Abdurrahman ADAK

Mardin- 2016